

KURDÊN
QEFQASYAYÊ:
Perspektîfên
Neteweyî

Tiblîsî – 2024

KURDÊN QEFQASYAYÊ: Perspêktîfên Neteweyî

Amadekar: Hejarê Şamil

Materyalên Konferansa
Kurdên Qefqasyayê: Perspektîfên Neteweyî

Tiblîsî – 2024

KONFERANS 2024

Kurdên Qefqasyayê: Perspektîfên Neteweyî

15-16 Tebax 2024 - Tîbîlîsî - GURCISTAN



KURDÊN QEFQASYAYÊ: Perspektîfên Neteweyî
Amadekar: Hejarê Şamil
Lijneya edîtorî: Zaza Kalaşov, Şêxmûs Sefer (redaksiyon)

Kurdên Qefqasyayê: Perspektîfên Neteweyî

Konferansa zanistî, civakî û pratîkî

15-16 Tebaxê 2024.

Tiblîsî, Gurcistan.

Hotel IOTA - 10 Lermontovi Street, Tiblîsî, Georgia

Organîzator:

Komeleya Kurdên Gurcistanê «Ronahî» (Gurcistan)

Enstîtuya Kurdî ya Qefqasyayê (Gurcistan)

Encûmena Hemahengî (Ewropa)

Fonda Pêşvebirina Çanda Kurdî (Qazaxistan)

Federasyona Komeleyên Kurd a Navneteweyî (FKKN)

NAVEROK

PÊŞGOTIN	9
VEKIRIN	11
Zaza Kalaşov	
Organîzatorê konferansê	
EM KURDÊN QEFQASYAYÊ KURDISTANÎ NE	13
Hejarê Şamil	
Organîzatorê konferansê	
EM DI XIZMETA YEKÎTÎ Û HEVGIRTINA KURDAN DE NE	17
Îbrahîmê Filît Mamedov	
Organîzatorê konferansê	
ROLA KURDÊN QEFQASYAYÊ STRATEJÎK E.....	19
Faîsa Younes	
Organîzatorê konferansê, Serokê Konfederasyona Encûmena Hemahengî	
ÇI EM ÊZÎDÎ BIN, ÇI JÎ MISILMAN, EM YEK MILET IN.....	21
Îsko Dasenî	
Parlamenter	
KURDISTANA SOR WEK TECRUBEYK DI DÎROKA KURDAN DE.....	23
Îsmail Beşikci	
Sosyolog	
KURDÊN GURCISTANÊ DI XAÇERÊYA ZEMAN Û BÛYERÊN	
DÎROKÎ DE.....	30
Bêlla Stûrkî	
Rojnamevan	
KURDÊN ERMENISTANÊ: BERÊ Û NIHA	40
Tîtalê Kerem	
Rojnamevan	
REWŞA KURDÊN AZERBAYCANÊ.....	45
Zabîr Mammadov	
Serokê Navenda Çanda Kurd "Ronahî" ya Komara Azerbaycanê	

REWŞA KURDÊN QAZAXISTANÊ: DUH, ÎROJ Û SIBE	48
Rafik Mîrzoyêv	
Serokê Weqfa Meclîsa Gel a Qazaxistanê	
BERNAMEYÊN HÎNKIRINA ZIMANÊ KURDÎ Û PERWERDEHÎ LI QEFQASYAYÊ	52
Resul Geyik	
Akademîsyen	
BERBANGA KURDÊN QAZAXISTANÊ	65
Murad Şamilov	
Cigirê Serokê Yekîtiya Kurdên Qazaxistanê «Berbang»	
MÎRATEYA DÎROK Û ZARGOTINA KURDÊN QEFQASYAYA BAŞÛR	67
Nihat Gultekin	
Lêkolînêr, nivîskar	
ZIMANÊ KURDÎ WEKÎ ÇARESERYEKÊ JI BO PIRSGIRÊKA NETEWEYÎ	76
Faraidoon Saman / Fereydun Saman	
Sernivîserê Kovara Zimannasî (Ziman û Zar)	
NETEWEPERWERÎ LI KURDISTANÊ: ÇAVDÊRIYEKE DÎROKÎ Û CIVAKÎ-SIYASÎ	81
Îbrahîm Gurbuz	
Nivîskar, Serokê Weqfa Îsmail Beşikçi	
Aytan Kotîkyan	
Navenda Kurdîstanê bo Çand û	
Hunerê (Hewlêr)	
XIRISTIYANÎ Û TOLERANSA DÎNÎ DI CIVAKA KURDAN DE	92
Rêzo Faroyan	
Rêberê civata kurdên xirîstîyan-protestan li Gurcistanê	
ROL Û REWŞA JINA KURDAN LI QEFQASYAYÊ	96
Xaylaza Reşîd	
Helbestvan	
SAZIYÊN SIYASÎ, CIVAKÎ Û ÇANDÎ YÊN KURDAN DIVÊ BERAMBERÎ KURDÊN QEFQASYAYÊ ÇAWA TEVBIGERIN?	99
Salih Kevirbirî	
Nivîskar, rojnamevan	
KURDÊN HERÎ ROJHILATÎ YÊN CÎHANÊ. ANTROPOLOJÎ, DÎROK Û ÇANDA KURDÊN XORASANÊ	104

Javad Rezaei
 Mamoste li zanîngeha Meşhedê
 Hossein Naseri (Hîwa Massih)
 Pisporê siyasetê

ÇEND KÊŞEYÊN LI PÊŞIYA NETEWA KURD LI KURDISTANÊ Û DERVEYÎ WELÊT Û RÊYÊN ÇARESERIYÊ	115
Hewkar Îzzet Mika Serokê Federasyona Rojnameger û Nivîskarên Serbixwe (Ronus)	
KURDÊN QEFQASYAYÊ BAŞÛR WEK BEŞEK NETEWEYA KURD. NASNAME Û DANASÎN	119
Hejarê Şamil Nivîskar, lêkolîner	
SALAR SERHED XELÎFE YUNIS	124
Endamê Serkirdayetî û Berpîrsê Peywendiyên Kurdistanî yê YNK`ê	
MAHAMMA KHALIL QASIM	127
Parlamentê berê ya Iraqê	
DEKLERASYONA KONFERANSÊ	129
КУРДЫ — ДРЕВНИЕ НАСЕЛЬНИКИ ЮЖНОГО ЗАКАВКАЗЬЯ	131
Лятиф Маммад Бруки историк, редактор интернет-портала kurdist.ru	
РОССИЙСКАЯ ИМПЕРИЯ, ОТТОМАНСКАЯ ПОРТА И ИСТОРИЧЕСКИЙ КУРДИСТАН В XX - НАЧАЛЕ XX ВВ.	155
<i>Мехмет Эмин Икбаль Дюрре</i> к.и.н., доцент кафедры зарубежного регионоведения МГЛУ	
«БАТУМСКИЕ КУРДЫ» В ГРУЗИИ	169
Гульнара Мамедова Председатель Культурного комитета Ассоциации курдов Казахстана «Барбанг»	
ИТОГОВАЯ ДЕКЛАРАЦИЯ КОНФЕРЕНЦИИ	172

PÊŞGOTIN

Di 15-16ê Tebaxa 2024ê de, li paytexta Gurcistanê, li bajarê Tîblîsê, bi pêşengiya saziyên civakî û zanyarên kurd, bi navê **"Kurdên Qefqasyayê: Perspektîfên Neteweyî"** Konferansa navnetewî hat li dar xistin.

Organîzatorên Konferansê Komeleya Kurdên Gurcistanê «Ronahî», Encûmena Hemahengî, Enstîtuya Kurdî ya Qefqasyayê, Fonda Pêşvebirina Çanda Kurdî û Federasyona Komeleyên Kurd a Navneteweyî bûn.

Dawiya konferansê de encamname weha dest pê dike:

«Nasnameya çandî ya kurdên li derveyî Kurdistanê dijîn di bin xetereya windabûnê de ye.

Em bang li hemû rêxistinên kurd ên cîhanê dikin ku demildest li welatên xwe xebatê bernamayan ji bo rizgarkirina nasnameya kurdî çêbikin û di vî warî de bi rayedarên pêwendîdar re dest bi hevkarîyê bikin».

Di konferansê de ji 16 welatan zanyar, pîspor û kesayetiyên navdar beşdar bûn û pîrsgirêkên kurdên Qefqasyayê bi berfirehî hatin nîqaşkirin.

Di konferansê de 26 rapor hatin pêşkêşkirin, hemû jî li ser pîrsgirêkên neteweyî, civakî-çandî, hiqûqî bûn. Gotarên din jî ji bo kurdên Qefqasyaya Başûr hatin terxankirin.

Bi giştî mijarên wekî pîrsgirêkên asîmîlasyonê, rêyên pêşdebirin û parastina zimanê dayîkê, pêdiviya geşkirina xweşbinî û toleransê di nav civaka kurdî ya pîr dînî de û her wiha pêşxistina têkiliyên di navbera kurdên ku li welatên cuda cuda de dijîn hatin nîqaşkirin.

Di konferansê de bal hat kişandin li ser dîrok û rewşa îroyîn ya kurdên Qefqasyaya Başûr û her wiha kurdên li komarên din yê Sovyeta berê dijîn.

Ji bo çareserkirina pîrsgirêkên di warên çand, huner, perwerde, ragihandin, arşîvgerî û mafên neteweyî de pêşniyar û perspektîfên taybet hatin pêşkêşkirin.

Li ser girîngiya pêşxistin û xurtkirina têkiliyên dostane yê di navbera kurdan û gelên cîran de bi berfirehî hat axaftin.

Di konferansê de li ser girîngiya pêşxistina têkiliyên çandî, perwerdeyî û aborî yê di navbera dewletên ku kurd lê dijîn û welatê wan ê dîrokî Kurdistanê bi baldarî hat rawestandî.

Her wiha biryar hat dayîn ku raporên konferansê bibe pirtûk û bi vê armancê komîsyoneke ji 5 kesên pêk tê hate avakirin.

Di konferansê de şîret li saziyên sivîl yên kurd hate kirin ku li cihên rûniştina xwe yên daîmî sepana pratîkî ya pêşniyarên konferansê bibînin.

Weke nîşana spasî û pesindayîne, ji aliyê amadekar û beşdarên konferansê biryar hate dayîn ku spasnameyeke taybet ji rêvebiriya Gurcistanê re bê şandin, ji bo ku derfeta lidarxistina konferanseke wisa mezin a navneteweyî ya kurdan hat dayîn.

VEKIRIN



Zaza Kalaşov - Organîzatorê konferansê¹

Mêvanên birêz û qedirbilind!

Hûn bi xêr hatin konferansa me ya navneteweyî ya bi sernava "Kurdên Qefqasyayê: Prespektîfên Neteweyî".

Qefqasya, mozaîka çandan a bêhempa û dêrîn e, û di dirêjahiya dîrokê de bûye herêmek ku komên etnîkî yên cihê bi hev re jiyane. Di nav vê pirrengiyê de, gelê Kurd bi dîroka xwe ya kevnar cihekî taybet digire.

Di vê konferansê de wê nîqaşên me bi berfirehî li ser van mijaran bin;

Perspektîfa dîrokî: Avabûna dewletên kurdî li Qefqasyayê di Serdema Navîn de û rola wan di jiyana siyasî û çandî ya herêma de.

Mîrasa çandî: Têkilî û bandora hevbeş a ziman, wêje, huner û kevneşopiyên kurdî bi gelên din ên Qefqasyayê re.

Rastiya hemdem: wêneya demografîk a civakên kurd li welatên cûda yên herêma Qefqasyayê, rewşa wan a civakî-aborî, pirsgirêk û derfetên ji bo parastina nasnameya wan.

Perspektîfên pêşerojê: Têgihîştina rola mîrata kurdî di pêşvebirina aşî, diyalog û hevkarîya herêmî li Qefqasyayê.

¹ Zaza Kalaşov (14.08.1973, Tîblîsî, Gurcistan). Çalakvanê civakî. Ji malbata êzidiyan Şêxê Şêxûbekir e. Komeleya Kurdên Gurcistanê «Ronahî» di 06.11.2022an de bi destpêşxerî û serokatîya wî li bajarê Tîblîsê hate damezrandin.

Rojeva me gelek dîsîplînan vedihewîne; dîrok, etnolojî, zanista siyasî, civaknasî û çandînasî. Di nav me de hem zanyarên navdar hene ku xebata wan di vî warî de rê li ber me vekiriye, hem jî lêkolînerên ciwan hene ku raman û nêzîkatiyên nû pêş me dikin.

Piştî guhdarîkirina axaftvanên sereke, ez hêvî dikim ku hemû beşdarên konferansê derfet bibînin ku beşdarî nîqaşên panelê bibin û diyalogekekî vekirî bikin.

Ez hêvî dikim ku ev konferans ne tenê bibe platformek ji bo parvekirina zanîna akademîk, lê di heman demê de bibe pirek di navbera çandan de, têgihîştinek çêtir û rêzgirtina hevbeş li herêma me pêş bixe.

Spas ji bo hebûna we. Ez ji we re nîqaşek berhemdar û balkêş dixwazim!

Konferans bi awayekî fermî tê vekirin!

Spas dikim.

EM KURDÊN QEFQASYAYÊ KURDISTANÎ NE



Hejarê Şamil

Organîzatorê konferansê²

Bi ya min ev konferans ji konferanseke asayî wêdetir e; ji bo me cejn e, şahiyeke mezin e. Gelek mirovên çê û jîr, hişmend û neteweperwer, zanyar û akademîsyen ji bo armanceke hevpar li vir kom bûne.

Ez hêvî dikim ku ev konferans dê bibe gaveke hizrî û rewşenbîrî ber bi çareserkirina pirsgirêkên kurdên Qefqasyayê û di konferansê de dîtin û perspektîfên objektîf li ser pirsgirêkên giştî yên welatê Kurdistanê derkevin holê.

Yekem konferansa mezin û berfireh a kurdên Qefqasyayê tam 90 sal berê, di sala 1934an de, ji aliyê hikûmeta Sovyetê ve hatibû lidarxistin. Di rojeva Yekemîn Konferansa Kurdolojiyê ya Yekîtiya Sovyetê de, ku di 9ê Tîrmeha 1934an de li Êrîvanê hat lidarxistin, ev mijar hebûn:

1. *Şoreşa Cotmehê û pêkhatina neteweyî-çandî di nav karkerên kurd de*
2. *Xebatên beşa kurdî ya Enstîtuya Dîrok û Çandê*

² Hejarê Şamil (16.07.1966, bajarê Kalbajar, Azerbaycan). Nivîskar, lêkolîner, rojnamevan. Damezrîner û berpirsê Enstîtuya Kurdî ya Qefqasyayê (Gurcistan), weşanxaneya «Zengezûr» (Qirgizistan) û malpera enstituyakurdi.com. Nivîskarê nêzî 20 pirtûkan e.

3. *Formasyona civakî-aborî di nav kurdan de heta Şoreşa Cotmehê û bandora wê di zimanê kurdî de*

4. *Pirsgirêkên çandî yên zimanê kurdî*

5. *Li ser qanûna rastnivîsîna yekane (hevpar) a kurdî*

6. *Bingehên rêzimana kurdî*

7. *Prensîbên damezrandina termînolojiya kurdî*

Di salên borî de, gelek konferansên zanistî û civakî li komarên cûrbecûr ên Yekîtiya Sovyetê pêk hatin. Di van 90 salan de, li Yekîtiya Sovyetê ya berê gelek berhemên girîng di warên çand, huner, wêje, ziman û bi giştî kurdolojiyê de hatin afirandin. Ev karên pîroz bi tîpên zêrîn di dîroka kurd û Kurdistanê de hatine nivîsandin. Lêbelê, ji hilweşîna Yekîtiya Sovyetê vir ve, ev cara yekem e ku konferansek zanistî û pratîkî ya bi vî rengî û berfireh li Qefqasyayê tê lidarxistin. Hêvîdar im ku konferansa me jî wekî konferansa 1934an berhemdar be.

Çima me navê vê konferansê kir «Kurdên Qefqasyayê: Prespektîfên Neteweyî» Ji ber ku em, Kurdên Qefqasyayê, beşek ji neteweya kurd in. Ne tenê ji bo gelê xwe yê li Qefqasyayê dijî, lê di heman demê de ji bo tevahiya neteweya kurd jî berpirsiyariya me heye. Em hemû pirsgirêkên netewî yên gelê xwe weke pirsgirêkên xwe dihesibînin.

Em kurd her tim gelên cîranên herêmê wek dost dîtine û dibînin. Rewşenbîr û zanyarên gelê me di pêşxistina çand, huner, wêje, zanist û aboriya welatên cîran de beşdariyên girîng kirine û dikin. Di seranserê dîrokê de, li van welatan gelek neheqî li gelê me hatiye kirin, lê dîsa jî kurdan her tim rihê dostaniyê û cîrantiyê parastiye! Ev helwesta kurdan pir caran xelet tê nixrandin û wekî qelsiyek tê dîtin. Li hemberî polîtîkayên asîmîlasyon û înkare yên li Azerbaycanê û hewldanên parçekirina gelê kurd li Ermenistanê, divê civaka Kurdistanê, hemû gelê kurd bertekeke tund nîşan bide.

Em kurdên Qefqasyayê li ku derê bijîn û hemwelatîyê kîjan welatî bin jî, beşek ji neteweya kurd a mezin û berdewamkerên çanda kurdî ya kevnar û perçeyek hafiza kurdî ne. Me tu carî ev rûmet winda nekir. Kurdbûn, kurdistanîbûn ji bo me rûmeta herî mezin e.

Em her tim rêzê li qanûnên hemû dewletên ku em lê dijîn digirin, çî Gurcistan be, Azerbaycan be, Ermenistan be, an Qazaxistan be... Lê berî

her tiştî em kurd in, kurdistanî ne. Hemû derd û kul, êş û azarên li her goşeyekî Kurdistanê eş û azarên me ne, em dizanin û piştrast in ku hemû kurdistanî jî êş û azarên me dikîşînin.

Em yek netewe ne û pirsgirêkên me yek in. Em neçar mane ku di nav sînorên dewletên cuda de û di bin pergalên siyasî yên ne mîna hev de bijîn û ji ber vê çendê dibe ku helwestên me yên siyasî ji hev cuda bin lê, li Mehabad, Qamişlo, Batman, an Silêmaniyê pirsgirêkên me yên çandî, hunerî, zanistî û zimanî ji hevûdu ne pir cuda ne.

Bo mînak, alfabeyeke me ya hevpar tune ye, û zimanê me yê standard hîn bi tevahî bicîh nebûye. Ev pirsgirêk ji bo me hemûyan pirsgirêkek neteweyî ya hevpar e. Ne tenê ji bo xelkên Tîblîsê, ji bo xelkên Amedê, Dêrikê, Sine û Hewlêrê jî pirsgirêk e.

Bi baweriya min ev konferans wê hem ji bo kurdên Qefqasyayê û hem jî ji bo hemû kurdan hin perspektîfên neteweyî derxe holê.

Em ji têgeha perspektîfa netewî çî fam dikin û divê em çî fam bikin? Di tevahiya konferansê de em ê li ser aliyên hestiyarî, siyasî, pratîk, felsefî, zanistî û hwd. yên vê têgehê biaxivin. Gava herî girîng ew e ku meriv ji hêla giyanî û manewî ve amade be ku nîqaşek wisa li ser bingehek saxlem û bi hişek vekirî bimeşîne. Bawer dikim ku pêkateyên konferansê di vî warî de bi tevahî amade ne.

Di vê salona konferansê de mêvanên ji derve ji beşdarên herêmî zêdetir in; mêvanên me ji 16 welatan hatine, û 26 gotar dê werin pêşkêş kirin. Li vir, di şexsê we, beşdarên me yên hêja de, ezmûn û hizrên mezin li hev civiyane; tevahiya gelê kurd tên temsîlkirin. Ev jî fersendek dide ku bi zanîn û aqilmendiya hevpar wê li ser perspektîfên neteweyî kûrtir lêkolîn bikin.

Çar meh in em amadekariya vê konferansê dikin. Em rastî gelek astengî û diwariyan hatin. Lêbelê, bi hevalên xwe yên organîzator re, me bi serkeftî van diwariyan derbas kir û bi îradeyek xurt ew li dû xwe hiştin.

Siyaset û karên civaka sîvîl du stûnên civakê ne. Divê her du hêl hevdû temam bikin û piştgiriya bidin hev. Lêbelê, li gorî ezmûna me, partiyên siyasî her gav astengiyan li pêşiya tevgerên sîvîl diafirînin. Heta niha wisa lê hatiye. Lêbelê, pêwîste civaka sîvîl û siyaset piştgiriya bidin hev. Divê di navbera wan de hevsengî, balans û her wiha konsensûs û yekrêzî hebe. Lê

mixabin, baweriya bi pêwîstiya hevsengiyek wisa hîn di nav kurdan de nehatiye rûniştin. Em hevdû wek reqîb dibînin. Hêzên siyasî her tim dixwazin tevgerên sivîl di bin kontrola xwe de bihêlin. Li hember vê yekê hin rêxistinên sivîl naxwazin di bin kontrolê de bin û di navbera xwe û partiyên siyasî de bend û sînoren tund çêdikin û bi mesafe nêzîkê siyasî dibin. Divê wisa nebe. Ji ber ku hedef yek e, potansiyela ku em li ser dixebitin jî heman tişt e.

Me hewl da ku ev konferans ji bandor û siya partiyên siyasî dûr bimîne. Ez dikarim bi zelaî û eşkere bêjim ku em di vî warî de bi ser ketin.

Xalek heye ku ez dixwazim balê bikişînim ser û girîng dibînim. Nêzîkî 70 mêvan ji welatên nêzîk û dûr beşdarî konferansa me dibin. Hemû lêçûnên xwe, ji rêwîti bigire heya otêlê, bi xwe didin. Divê mirov bifikire ku çima ev mirovên hêja nêzîkatiyek wiha nîşan didin? Ji ber ku ew kurdên Qefqasyayê wekî beşek ji neteweya xwe, neteweya kurd dibînin, dixwazin tevkarîyê li wan bikin, di pêvajoya netewsaziyê de rolekê bilîzin, bîr û ramanên xwe bi hev re parve bikin û fikreke hevpar derxînin holê.

Di dawîya konferansê de, ez ê li ser pirsgrêkên **nasname û pênaseya kurdên Qefqasyayê** gotarekê pêşkêş bikim.

Ez ê niha axaftina xwe bi peyama xêrhatinê biqedînim. Di du rojên konferansê de em ê bêtir derfet bibînin ku bi hev re biaxivin. Em çiqas hevdû baş nas bikin, em ê ewqasî ji hev hez bikin. Ger em hevdû nas nekin, em nikarin ji hev hez bikin.

Hûn giş bi xêr hatin! Bi rêzdarî silavan li we hemûyan dikim! Serkeftin ji me hemûyan...

EM DI XIZMETA YEKÎTÎ Û HEVGIRTINA KURDAN DE NE



İbrahim Filiz Mamedov
Organîzatorê konferansê ³

Mêvanên me yên ezîz û delal!

Bi rastî jî îro kêfxweşiyek pir mezin e ji bo me hemûyan. Hûn ser serê me, ser çavên me hatin!

Îro, rojêke dîrokî ye; di bin banê meydana kurdên Qefqasyayê de, ji çar aliyên Kurdistanê û cîhanê çiqas kurdên me civiyane! Hemû mêvanên me yên ezîz, zanyar in, bi navûdeng in û di qada netewî de rola berbiçav dilîzin. Ev jî garantiya serkeftina konferansa me ye.

Em dixwazin ev konferans peyamên yekîtiyê, hevgeriya û hevrêziyê bide. Di vê çarçoveyê de, em bawer dikin ku ew ê ji bo hemû kurdên li çaraliyê cîhanê û her çar perçeyên Kurdistanê bibe mînak.

Pirsgirêkên ku em wekî kurdên Qefqasyayê pê re rû bi rû dimînin pîralî ne û beşek ji pirsgirêkên me yên neteweyî ne û ne mimkûn e ku li ser bingeheke herêmî çareseriyê tam bê dîtin. Di vî warî de em hewl didin bi perspektîfeke netewî li hemû mijarên xwe binêrin û navê konferansa me jî vê nêzîkatiyê nîşan dide.

³ İbrahim Filiz Mamêdov (09.05.1977, bajarê Almatî, Qazaxistan). Çalakvanê civakî. Berpîrsê Weqfa Pêşvebirina Çanda Kurdî, Cîgirê Federasyona Komeleyên Kurd a Navneteweyî (FKKN), Cîgirê Yekîtiya Kurdên Qazaxistanê.

Her wiha em spasiya xwe ji nûnerên rêxistinên sîvîl re dîkin ku di destpêka konferansê de piştgirî dan, dema ku hîn ne diyar bû ka ev xebat dê çawa bidome û gelo dê pêş bikeve an na?

Bi rastî, Komeleya Kurdên Gurcistanê «Ronahî» di nava sê salan da gelek xebat kiriye û bi saya xebata wan a dilsoz û piştgiriya hikûmeta Gurcistanê, îro derfeta me heye ku em vê konferansê li vir li dar bixin. Em spasiya kek Zaza Kalaşov û endamên Komeleya «Ronahî» dîkin.

Dîsa spasiya xwe em tinîn ji xwîşka Faîsa Younes, seroka Encûmena Hemahengî Ewropayê! Bi fikra min, avakirina rêxistinên weha di nav civaka sîvîl de û xebata ku ji bo netewbûna me tê kirin, dê ji bo gelek hêz û partîyên me wekî mînak û dersek be, û dê piştrast bike ku ew xwe wînda nekin.

Ji bo van gav û çalakiyan, em dixwazin spasiya xwe ji aveker û Serokê Enstîtuya Kurdî ya Qefqasyayê Hejarê Şamil re, ku li milê min ê rastê rûniştîye, diyar bikin. Ew xebatên zehf mezin, karên pir kur û cidî dike, ked û fedakariya wî pir zêde ye.

Careke din, silav û rêzên min ji bo hemû beşdarên konferansê, her yek ji we ser serê me û ser çavên me hatiye. Mêvanên ji Kurdistanê, endamên parlamentoyê û endamên partiyên bihêz, girîng û bibandor li vir in. Hûn bi xêr hatin, em xizmeta we û qedrê we digrin.

Spas ji Xwedê ra ku em hemû îro wekî xwişk û bira li vir kom bûne. Bila di jiyanê da serkeftinên we herheyê be. Hûn her bijîn û her hebin!

ROLA KURDÊN QEFQASYAYÊ STRATEJÎK E



Faïsa Younes

Organîzatora konferansê,

Serokê Konfederasyona Encûmena Hemahengî

Beşdar û mêvanên Konferansa Kurdên Qefqasyayê, em bi navê Desteya Amadekar bi xêrhatina we dikin.

Konferansa me dixwaze çi bike? Armancên me çi ne?

Di rastî de pirsra kurd li Qefqasyayê ne pirsra kurdên diyasporayê ye. Pirsra ax û millet e. Pirsra miletek e ku xwedî milk û erd e. Miletek ku di Qefqasya de rolên stratejîk lîstin e. Herî kêma di serdema Împaratoriye Eşkanî û Sasanî de kurd li Qefqasyayê hikumdarî kirine.

Her weha di serdema Ebasiyan de kurd li vir herî kêma 3 dewletên herêmî damezrandine: Dewletên Şeddadî, Deysemî û Salarî.

Di sedsala bihûrî de hewldanek bi qest hebû ku etnografiya kurdên Qefqasyayê bête guhertin. Piştî hilweşîna Kurdistana Sor, hemleyek berfireh ji bo sirgunkirina bi deh hezaran kurd ji Ermenistanê, Naxçivanê û Azerbaycanê dest pê kir.

Pêwîste ev konferans dem heder nede. Divê ev konferans hemî hêzên akademîk, entelektuelî, kultûrî, edebî, hûnerî û aborî ya kurdan hişiyar bike. Berpirsiyariya neteweyî û dîrokî li pêş wan raxe daku kurd bikaribin ji nû ve hêza xwe ava bikin.

Pêwîst e ev konferans bibe tradîsyon û kevneşopiya salane û pêşde here û bigihêje astekê ku bibe brend û markayeke neteweyî.

Em wek Encûmena Hemahengî (EH) piştgirî li vê konferansê dikin. Di rastî de fikra amadekirina konferanseke weha ji Encûmena Hemahengî derketiye ku em tevî hevalbendên xwe ji Enstîtuya Kurdên Qefqasyayê û Komeleya «Ronahî» û dezgehên din, vê konferansê bidomînin, berfireh bikin û pêşve bibin.

Encûmena Hemahengî dezgeheka çetir (sîwan) a Kurdistanî, serbixwe û sîvîl e ku dixwaze ji bo kurdên diyasporayê çetirek giştî, bilind, qanûnî û neteweyî ava bike. EH di wê baweriyê da ye ku ji bo kurdên Qefqasyayê, Asya Navîn û Rûsyayê konfederasyonek sîvîl û serbixwe pêwîst e. Nabe ev konfederasyon bibe paşkoya partiyên siyasî, divê bê teref be û serbixwe bimîne.

EH wê bi hemû çavkaniyên xweyê beşerî û malî li pişt xwîşk û birayên xwe yên li Qefqasyayê bin.

Serkeftî û mayînde be Konferansa me!

ÇI EM ÊZÎDÎ BIN, ÇI JÎ MISILMAN, EM YEK MILET IN



Îsko Dasenî Parlamenter⁴

Ez îro zehf şa me ku lî Gurcistanê ev konferans derbas dibe.

Di despêka vê konferansê da, em karesata Şengalê ya ku 10 sal berê hatibû serê miletê me bi bîr tînin. Ji me tu kesî hêvî nedikir ku di destpêka sedsala 21an da karesatek wisa dîsa bi serê miletê me da were.

Niha gelek kes dibêjin ku ew karesat tenê li ser êzidiyan kirin. Ez di dilê xwe da wisa hesab dikim û bawer dikim ku dijminên me ev karesat li ser tevahiya miletê me anîne. Wan xwest ku miletê me perçe perçe bin.

Sed heyf ku problema dîn hîn jî di nav miletê me da heye. Ez dixwazim ji we gişka ra bêjim, em borcdar in ku, kar bikin bona wê yekê belkî ew problem ji nav miletê me derê. Çimkî em yek milet in. Em bi yek zimanî diaxivin, erf û edetên me yek in. Reqasê me, qewl û beytên me gişk li ser zimanê kurmançî têne gotinê. Loma jî em gişk miletek in û em borcdar in piştî miletê xwe bin, û yekîtiya xwe di nav da biparêzin. Eger yekitî hebe, em ê bi hev re bigihîjine dereceyeke baş.

⁴ Dasinî Îsko (30.03.1958, Tibilîşî, Gurcistan). Parêzer, dewletmedar û siyasetmedarekî Gurcistanî ye. Endamê Parlamentoya Gurcistanê ya kombûnên VI, VII û VIII (ji sala 2016an vir ve). Ew pêşkêşvanê Bernameya Kurdî li radyoya Gurcistanê (1979-1983) û listikvanê Şanoya Kurdî bûye (1979-1983).

Sed heyf, hin kurdên misilman dibêjin, «êzidî ne kurd in», û hin êzidî jî hene ku dibêjin, «em ne kurd in». Ew tişt divê di nav milletê me de bê hildanê. Ji bona vê yekê çi em dikarin, gereke bikin.

Ez bi xwe hatime dînê li bajarê Tîblîsê. Dê û bavê min di biçûkahîya da ji me ra gotine ku em kurd in. Me her tim xwe wek kurd hesab kiriye. Me pêş xwe tu car pirsek wisa ne daniye ku *ka em êzidî ne an kurd in?*

Helbet dînê me dînê êzidiyatiyê ye. Kal û bavên me, hêj 100 sal berê ji Kurdistanê bona pîrsa dînê xwe derketin û hatin Qefqasyayê. Lê em gişk her tim digot in ku milletê me kurd e, dînê me êzidîtî ye. Em wisa mezin bûn. Em gerek vî tiştî tu car ji bîr mekin û li ser vê yekê biaxivin.

Dîsa carekê din xêrhatina we dikim. Hûn gişk bi xêr hatine. Ez şa me we dibînim. Razîbûna xwe didim amadekaran ku konferanseke weha berfireh li dar xistine.

Pêşdaçûyîneke baş ji bo we gişka ra dixwazim.

KURDISTANA SOR WEK TECRUBEYEK DI DÎROKA KURDAN DE⁵



İsmail Beşikçi
Sosyolog⁶

Ji bo ku em bikaribin pîrsgirêka Kurdistanê bipirsin, divê pêşî hin tesbîtan bikin. Bi rastî jî belgeyên gelek berfireh li ser kurd, Kurdistan û zimanê kurdî hene. Lê belê ji ber ku kurd ne xwedî dewlet in, ev belge birêkûpêk nehatin komkirin û nirxandin. Di vê çarçoveyê de bi rehetî mirov dikare bibêje ku arşîva kurdî tune ye. Ev bêdewletbûna diyarkirî du encamên girîng bi xwe re tîne.

Encama yekemîn a bêdewletbûnê ev e; dabeşbûn, perçebûn û parvekirina kurd û Kurdistanê û bêdewletbûn du pêvajoyên hevaheng in. Her yek ji dewletên ku kurd û Kurdistanê perçe kirin û parve kirin, di bin zilm û zorê de li ser kurdan polîtîkayên asîmîlasyonê meşandin. Qedexkirina ramanî bûne pratîkên domdar. Ev polîtîka bi terora dewletê re, li ser kurd, Kurdistanê û zimanê kurdî lêkolînên saxlem asteng kirin.

⁵ Wergera ji tirkî: Elîf Gün.

⁶ İsmail Beşikçi (1939). Civaknas, filozof, şoreşger û nivîskarekî tirk. Endamê Rûmetê yê PENê ye. Ji ber nivîsên xwe yên parastina mafên gelê kurd 17 sal li Tirkîyeyê di girtîgehê de ma. Ew nivîskarê bi dehan pirtûkan û bi hezaran gotaran e.

Dabeşbûn, parçebûn û parvekirin pêvajoyên herî girîng ên pirsgrêka kurd û Kurdistanê diyar dîkin. Pêvajoya ku îro diyarker jî ev e.

Encama duyemîn a girîng a bêdewletbûnê jî talankirina belgeyên li ser kurd, Kurdistan û zimanê kurdî bû. Wekî mînak helbestvanên kurd ên wekî Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran an nayên dîtin an jî berhemên van helbestvanan li ser helbestvanên wekî Fuzûlî û Bakî tên tomarkirin. Berhemên kurdî bi zimanên farisî, erebî û tirkî hatine tomarkirin. Li Kurdistanê destnivîsên kurdî tên berhevkirin û bi şandina pirtûkxaneyê parêzgeha Konyayê nayên dîtin.

Perçebûn û parvekirin pêvajoyek e ku her tim xwe hildiberîne û zêde dike. Kurdistan di nîveka sedsala 17an de bi peymanê Qesra Şîrîn a sala 1639an di navbera Împaratoriya Osmanî û Împaratoriya Îranê de hat parvekirin.

Parçeyên bakurê Kurdistanê Îranê di çaryeka pêşîn a sedsala 19an de bi peymanên Gulîstan û 1828an ên Turkmençayê yê sala 1813an ketine bin destê Rûsyayê.

Ev herêmên di serdema navîn de ji aliyê dewletên Rewadî (955-1071) û Şeddadî (951-1174) ve hatin serdestkirin. Di vê beşê de Kurdistanê Sor di navbera salên 1923-1929an de cih digire.

Kurdistanê Osmanî bi Peymana Lozanê ya 24ê Tîrmeha 1923an di navbera Tîrkiye, Brîtanîyaya Mezin (paşê Iraq) û Fransa (paşê Sûriye) de hat parvekirin.

Dabeşkirinê erdnîgarî û perçeyên siyasî li pey hev hatin. Bi rastî, ew du pêvajoyên ne ku bi hev û du re paralel dimeşin. Eşîr û malbatên paşerojê bi sînorên ku li dijî îradeya kurdan hatine xêzkirin, hatine dabeşkirin. Wekî mînak li Başûrê Kurdistanê du partiyên siyasî, Partiya Demokrata Kurdistanê û Yekîtiya Niştimaniya Kurdistanê, ku li ser prensîbên kurdistanî jî li hev nakin, di toreke wisa ya peywendîyan de derketine holê.

Di sala 1923an de avabûna Kurdistanê Sor a li Yekîtiya Sovyetê û rakirina wê di sala 1929an de jî di nav vê tora têkiliyan de bi pêş ket. Ev têkilî di gotara «Kurdistanê Sor di Pevçûnên Ermenistan-Azerbaycanê de» bi berfirehî hatine lêkolînkirin. Min pêwîstî dît ku vê gotara ku yekem car di 9ê Çileya pêşîn a (December) 2009an de hatiye weşandin, wekî beşek ji gotara Kurdistanê Sor li vir zêde bikim.

Di Pevçûna Ermenistan û Azerbaycanê de Kurdistan Sor

Di dîrokê de gelek bûyer qewimîne. Ev bûyer tenê dema ku ji aliyê lêkolîneran ve werin vekolîn û şîrovekirin û nirxandin, dibin bûyerên dîrokî. Di dîrokê de gelek bûyer hene ku nehatine nirxandin û lêkolîn. Dibe ku sedemên cuda cuda hebin ku van bûyeran çareser nekin. Wekî mînak îdeolojiya fermî ya ku li ser pergala siyasî û rejîma siyasî serdest e, dibe ku li ser hin mijaran lêkolîn û axaftinê qedexe bike.

Prensîbên bingeşîn ên ku têkiliyên navneteweyî bi rê ve dibin, hîn jî ne nirxên wekî edalet, azadî, wekhevî, aştî û mafên mirovan in, lê belê hêzên hov in. Yên ku desthilatdariya xwe ya hovane digirin, dikarin berjewendiyên xwe yê neteweyî biparêzin û têkiliyên navneteweyî sererast bikin.

Di dawiya salên 1980yî de, piştî hilweşîna Yekîtiya Sovyetê û 15 komarên hevalbend yê ku Yekîtiya ava kirin, ji Yekîtiyê derketin û dewletên xwe yê serbixwe damezrandin, di navbera Azerbaycan û Ermenistanê de şerekî mezin dest pê kir. Ev şer li ser mafên serweriya li ser Qerebaxê bû. Di dawiya şerê sala 1992an de ermeniyan hin axên ku azerî lê serdest in dagir kirin. Li ser Qerebaxê jî serwerî ava kirin. Beşek ji wan axên ku di dawiya şerê sala 1992an de ji aliyê ermeniyan ve hatin dagirkirin, axa Kurdistan Sor bû.

Kurdistan Sor di sala 1923an de wekî herêmeke otonom a girêdayî Azerbaycanê ji aliyê Yekîtiya Sovyetê ve, li gorî mafê neteweyan ku pêşeroja xwe diyar bikin, hate damezrandin. Di navbera salên 1923-1929an de jiyaye.

Di şerê sala 1992an de, axa ku Ermenistanê dagir kiribû, ev herêma di navbera Ermenistan û Qerebaxê de bû. Bajarên sereke yê vê herêma Laçîn, Kalbajar, Qubadli, Zengîlan û Cebraîl bûn. Bi vî şiklî beşeke Zengezûrê berê jî ketibû nava Kurdistan Sor.

Îro di navbera Ermenistan û Azerbaycanê de pevçûnek dijwar heye. Şerê li ser xaka Qerebax û Kurdistan Sor berdewam dike. Federasyona Rûsya, Tîrkiye, DYA û Yekîtiya Ewropayê ji bo çareserkirina vê nakokiyê hewldaneke tund didin. Di 02.11.2008an de serokên Ermenistan û Azerbaycanê li Moskovayê bi navbeynkariya serokê Federasyona Rûsya Dmitriy Medvedyev civiyan. Deklerasyonek bi navê Danezana Moskowê

hat ragihandin. Di vê deklerasyonê de behsa kurdan nayê kirin, navê kurdan qet derbas nabe.

Di 2ê Kanûna Pêşîn a 2009an de, Rêxistina Ewlehî û Hevkariya Ewropayê (OSCE) Wezîrên Derve yên Ermenistan û Azerbaycanê li Atînayê li hev kom kir. Di derbarê nakokiya di navbera her du alîyan de danûstandin hatin kirin. Bi Wezîrên Karên Derve yên welatên hevserokên Koma Mînskê; Federasyona Rûsyayê, Fransa, DYA, Ermenistan û Azerbaycanê re hevdiînek pêk anî. Ji bo meseleya Qerebaxê û mijara vekişîna Ermenistanê ji axa ku di sala 1992an de dagir kiribû, çareserî tê xwestin. Di vir de qet behsa nav, maf û hiqûqa kurdan nayê kirin, ev rastiyeke ku divê li ser bê rawestîn. Dewletên ku li paytexta Belarûsê Mînskê li hev kom dibin û li çareserîya pirsgerêka Azerbaycan-Ermenistanê digerin, bi navê welatên Koma Mînskê tên gotin.

Dê bikêrhatî be ku em piçekî behsa pirsgerêka Kurdistanê Sor bikin. **Hejarê Şamil** bi dîrokzan, rojnamevan **Letîf Memmed Brûkî** re hevpeyvînek pêk anî. Hejarê Şamil dide zanîn ku Letîf Memmed Brûkî endamê Federasyona Rojnamegerên Rûsyayê û navdewletî û sernivîserê malpera www.kurdist.ru ye. Ev hevpeyvîn di 13.12.2008an de di malpera www.kurdistan-post.org de bi sernavê «Fikra Kurdistanê Qefqasyayê» hat weşandin. Ew hîn jî li ser malperê dimîne. Di vê hevpeyvînê de jêrîvîsek jî heye: «Fikra Kurdistanê Qefqasyayê dikare kurdan bike yek.» Di vê hevpeyvînê de derbarê Kurdistanê Sor de agahiyên gelek hêja hene.

Di sala 1923an de Herêma Xweser a Kurdistanê Sor çawa hat avakirin û di sala 1929an de çima hat hilweşandin, di vê hevpeyvînê de bi berfirehî tê vegotin. Rakirina vê herêma otonom bi rasthatina xwestekên ermenî, azerî û Stalîn û Mustafa Kemal, yên ku berjewendiyên xwe diparêzin, pêk hat. Piştî kurdên li Herêma Xweser a Kurdistanê Sor dijîn, di salên 1930an de û di dema Şerê Cîhanê yê Duyemîn de sirgûnî Asya Navîn hatin kirin. Ger îro kurd li Qirgîzistan, Qazaxistan û Ozbekistanê dijîn, ji ber sirgûnan e.

Di salên 1950, 1960, 1970 û 1980an de kurd ji bo weşanên kurdî yên Radyoya Êrîvanê her tim spasdarê ermenî û Ermenistanê ne. Lê divê were zanîn ku Ermenistanê tu carî otonomiya kurdan û Kurdistanê Sor nexwest.

Kurd ji dema Medya, ji demên kevnar ve li vê herêmê ne. Ev der jî herêmeke Împeratoriya Med e. Hebûna kurdan li vê herêmê him beriya tirkên û him jî beriya ermenîyan e. Di sedsalên 11-12an de li herêmê

hikûmetên kurdan yê wekî Rewadî û Şeddadî hebûn. Hat zanîn ku Selahaddin Eyyubî ji vê herêmê bû. Di salên 1930î de sirgûnkirina kurdan ji vê herêmê ber bi komarên tirkên hevalbend yê Asyaya Navîn derbeke mezin li kurdan xist. Yê ku man, di şerê Ermenistan û Azerbaycanê de di sala 1992an de ji xaka Kurdistana Sor hatin derxistin. Piştî vê dagirkeriyê ermeniyên navên cihan bi temamî kirin navên ermenî. Navên kurdî qedexa kirine.

Di dawiya salên 1980an de, di serdema Perestroyka (ji nû ve avakirin) û Glasnost (vebûn, zelalî) de, mirovên ku ji hêla Stalîn ve sirgûnî Asya Navîn hatin kirin, dest bi vegera welatên xwe kirin. Kurdên ku sirgûnî komarên cuda yê Asyaya Navîn bûne jî bi nûnerên xwe re çûn Moskovayê. Wan ji serok Gorbaçov xwestin ku vegera wan bo welatê xwe, Kurdistana Sor misoger bike. Gorbaçov bi vê pêşniyarê germ bû. Lê beşeke girîng a welatê kurdan di bin dagirkeriya Azerbaycanê de bû. Ne tenê Azerbaycan, Ermenistan jî li dijî veğerandina kurdan û xwedîkirina herêmeke otonom a kurdan bû. Dema ku Gorbaçov ji desthilatdariyê derket, di derbarê daxwazên kurdan de tu pêşketin çênebû.

Îro Laçîn, Kalbajar, Qubadli, Zengilan, Cebraîl û beşeke Zengezûrê ku di navbera Ermenistan û Qerebaxê de ye, di dîrokê de wekî axên ku kurd lê dijiyan tên naskirin. Di sala 1923an de li ser van axan Rêveberiya Xweser a Kurdistana Sor hate avakirin. Ev rêveberiya xweser tenê di navbera salên 1923 û 1929an de dikare bijî. Paşê kurd ji Qefqasyayê Başûr sirgûnî Komarên Asyaya Navîn bûn. Yê ku mabûn, di şerê Ermenistan-Azerbaycanê yê salên 1992-1994an de ji welatê xwe hatin derxistin. Ev kurd li gelek herêmên Azerbaycanê di sirgûnê de dijîn. Piraniya «kaçgunan» (penaber) ku azeriyên gelek caran behsa wan dikin ev kurd in. Helbet mîrên azeriyên dema behsa «kaçgunan» dikin, pir baldar in ku navê kurda neyê gotin.

Ev pêvajoyeke balkêş e ku Ermenistan û Azerbaycan li ser axa kurdan şer dikin, dibêjin «herêma ermenî», «herêma azerî», bêyî ku qala kurdan jî bikin.

Divê bê gotin ku serokên Ermenistan û Azerbaycanê li Moskovayê bi navbeynkariya serokê Federasyona Rûsyayê civiyên û di deklarasyonê de navê kurdan nehate gotin û qet behsa maf û hiqûqa kurdan nehat kirin.

Dewletên Koma Mînskê yê Rêxistina Ewlekarî û Hevkariya Ewropayê (OSCE) dema behsa wan axan dîkin ku ji aliyê ermenîyan ve hatine dagirkirin, pêwîstiya vekîşîna xwe diyar dîkin. Lê belê nakîşîne ser wê yekê ku ev ax bi rastî jî axên ku kurd lê dijîn bûn û di navbera salên 1923-1929an de wekî Rêveberiya Xweser a Kurdistanê Sor dihatin binavkirin. Di daxuyaniyên di van hevdîtinan de behsa kurdan nehate kirin. Ev jî bi zelalî nîşan dide ku têgihîştina ku têkiliyên navneteweyî bi rê ve dike hîn jî hêzek hov e, ne nîrxên wekî azadî, wekhevî û dadmendiyê.

Rexne ji Kurdan re

Ji kurdan hinek wekî PKKê dibêjin «dewlet amûra zulmê ye, loma em dewletê naxwazin». Dewlet amûra mêtîngîrîyê ye, lê beriya her tiştî amûra çewisandina gelên bêdewlet e. Amûrên mêtîngîrîyê yê îdeolojîk û zorê yê dewletê li dijî gelên bêdewlet bi awayekî sîstematîk tên bikaranîn. Gotina «Dewlet zulmê li tirkên jî dike» tê wateya ku dewlet ji zilma ku li ser kurdan tê kirin, beraet bike. Çorum, Yozgat, Çankiri, Kastamonu û hwd. binêrin. Ka em bifikirin, gelo ew cih bi qanûna leşkerî tene rêvebirin? Li Anatoliya Navîn û Rojavayê Anadoluyê qet cîna yê «kiryar nediyar» hene? Gelo li wir jî mirov tên revandin û piştî çend rojan termê wan li vir û wir tene dîtin? Yan li wir jî diqewime ku tu xeber ji kesên revandî tune ye? Li Anatoliya Navîn an jî li Rojavayê Anatoliyayê dibe ku gund an daristan bê şewitandin? Mînak dema ku li Antalya, Bodrum, Çanakkale daristan dişewitin, tê gotin «Dilê me dişewite, rehên me dişewitin». Lê gelo ew kesên ku van tiştan dibêjin dema ku daristanên Kurdistanê dişewitînin, heman bertek nîşan didin? Bi wî awayî dewlet hewl dide ku zilm û zordariya xwe ya li ser kurdan bi gotinê «Dewlet zilmê li tirkên jî dike» veşêre.

Li Anatoliya Navîn û Rojavayê Anadoluyê JÎTEM heye? Malbatên li vir jî ji mal û warên xwe tên koçberkirin? Ma ev hemû tenê ji bo kurdan derbas nabe?

Yek ji sedemên sereke yê nakokiyên Ermenistan û Azerbaycanê jî îddîayên li ser Herêma Xweser a Kurdistanê Sor e. Her du dewlet jî ji bo xwedîderketina li axên kurdan tê dikoşin. Çima kurd li der û dora xwe tune ne? Eger otonomiyeke xurt a kurdan hebûya, gelo Stalîn dikaribû kurdan dersînor bike? Heger kurdan li bajarên wekî Laçîn, Kalbajar, Zengilan,

Qubadli, Cebraîl û bi giştî Zengezûrê jiyana xwe bidomanda, gelo Ermenistan û Azerbaycanê dikaribûn li ser axa kurdan pevçûneke wiha bikirana? Ji bo rê li ber van neheqiyên wiha bên girtin, ma pêwîstiya kurdan bi avahiyeke siyasî ya bi vî rengî nîne?

Jibîrkirineke mezin a kurdan heye. Nimûneyên vê yekê yên balkêş jî belkî Kurdistana Sor a salên 1923-1929an e.

Di vir de mijarek din jî divê bête gotin. Dema ku Yekîtiya Sovyetê di derbarê pirsgerêka kurd de tê rexne kirin, ev rexne wekî dijminatîya komunîzmê tê dîtin. Ev dîtin xelet e, nîrxandineke şaş e. Nîrxandina rast bi bilindkirina pirsên jêrîn mimkun e. Yekîtiya Sovyetê çima li dijî gelê kurd ê bindest bi hikûmetên otorîter, totalîter û faşîst re hevkarî kir? Çima berjewendiyên hikûmetên otorîter, totalîter û faşîst parast, ne ku gelê kurd ê bindest?

KURDÊN GURCISTANÊ DI XAÇERÊYA ZEMAN Û BÛYERÊN DÎROKÎ DE



Bêlla Stûrkî Rojnamevan⁷

Ji bo civaka kurdên Gurcistanê, roja îro rojeke dîrokiye, ji ber ku yekem car konferanseke bi wî rengî li ser mijara kurdên Qefqasyayê li Gurcistanê tê lidarxistin.

Ez ê hewil bidim bi rêkûpêk derbarê kurdên Gurcistanê, li ser dîrok, rewş, jiyan, kar û barên wan ji roja niştecihbûne li Trans-Qefqasyayê heya îro bînim ziman.

Dîroka niştecibûna kurdan li Gurcistanê. Kurdên Qefqasyayê kî ne û ji ku hatine?

Di gelek çavkaniyên dîrokî de behsa kurdan, serokên eşîrên kurdan yen vê herêmê tên kirin. Tê zanin ku di salên 951-1176an bajarên Gence û Divîn ku navendên giring yên Qefqasyayê bûn, di bin hikumdariya malbeta Şeddadiyen kurd da bûn. Di heman demê de li Azerbaycanê di salên 950-1070 malbeta Revadiyan xwedan desthilat bû û ji dema xelîfeyên Ebasiyan ye pêşin, hukumdariya Tewrêzê dikir.

⁷ **Bêlla Stûrkî** (10.05.1963, Tîblîsî). Edîtora bernameya kurdî di Komîteya Dewletê ya Televîzyon û Radyoya Gurcistane de, endama rêveberiya Komeleya Kurdên Gurcistanê.

Divê bê gotin ku di wextê zemanê feodalî serdest bû li Gurcistanê kurdan postên bilind kiribûn bin destê xwe. Di sedsalên 12-13an de du birayên kurd Îvanê û Zakariya Mixargrdzêlî, ji binemala Çepildirêj, hin axa ermeniyên di bin sîwana Gurcistanê de birêve dibirin. Cara pêşî ji sedsala 16an ve, piştî zeftkirina û dabeşbûna Kurdistanê, beşek ji eşîrên Êzidî dest bi koçkirina ber bi Qeqqasyaya Başûr kirin.

Yekîtiyên eşîrên kurdan li xaka Qeqqasyaya Başûr, bi taybetî li Gurcistan û Ermenistanê piştî şerên rûs û farisan ên 1804-1813 û 1826-1828, Şerê Qirimê 1853-1856, û şerê rûs û tirkên 1877-1878an bicih dibin. Gava ku di şerê rûs û tirkên ên salên 1877 û 1878an de rûs biser dikevin, qezaya Qersê dikin bin hikumdariya xwe. Êzidiyên êla Sîpkî di dema zordestiya Împaratoriya Osmaniyan de ji ber sedemên dînî dest bi koçberiyê dikin û di bin hikumdariya rûsan de ji xwe re gundan ava dikin.

Ev hal dikişîne heta şerê cihanê ya yekemîn. Di dema hilweşîna Împaratoriyan Osmanî û Rûsyayê de hêzên rûsan dikişin û ji herêma Serhedê diçin. Herema Serhedê di navberan tirkên û ermeniyên de dibe meydana şer. Kurdên Êzidî yên êla Wanê bi serokatiya Cangîr axa tîgî digihîjin êlên Êzidiyên Rûsyayê û tevî hêzên ermeniyên li dijî zulma dewleta tirk derdikevin. Di şerê tirkên û ermeniyên de çekdarên Êzidî roleke mezin dilîzin. Du wan pevçûnan de ziyaneke mezin digihîje Êzidiyên Serhedê; tîgî kuştin, ji ber xelayê û nexweşiyên di rewê de qir dibin.

Kurdên Gurcistanê

Kêm kes zanin, ku di karê pêşxistina çand û edebiyeta kurdî da keda kurdên Gurcistanê jî pir e.

Ji % 90ê kurdên ku li Gurcistanê dijîn kurdên Êzidî ne. Divê bê zanîn ku di van salên dawî de hejmareke ji kurdên Gurcistanê bûne Mesîhî. Heta salên 1980î li Gurcistanê nêzî 35 hezar kurd diman. Piraniya wan, ku ev hejmar nêzî 30 hezarî bû li paytexta Gurcistanê dijiyan. Lê îro mixabin hejmara kurdên Êzidiyên Gurcistanê kem bûye. Li gor serjimêriya sala 2012an ya Gurcistanê hejmara kurdan 12 hezar e. Ew reqem çiqas rast hatiye destnîşankirin em nizanin.

Wek min berê jî got di dawiya sala 1918an de, parek koçberên kurd ji Bakurê Kurdistanê hatin li Tiblîsê bicih bûn. Ew ji ber baweriyên xwe yên dînî ligel ermenî, yewnanî û asûriyan dihatin zerandin, jî cih û warên xwe

dihatin dîrxistin. Ji Wanê û Qersê sirgûnê Ermenistane bûn, parek ji wan hatin Gurcistanê. Li destpêkê beşeke biçûk li herema Kaxetiyê, li nêzîkî Telaviyê yê Gurcistanê bicih bûn. Hinek çûn Tiyanetî, Alvanîyê. Êzidiyên Tiyanetî û Alvanî bi piranî asîmîle bûne. Kurdên êzidî li Tîblîsê berek bi berek kom bûn û ji xwe re tax çêkirin. Minak; Taxa Reşyan, Taxa Belan, Taxa Kaşaxan û hwd.

Dema niha, hejmareke kêr ji êzidiyan li Rustavî, Batumî û Telaviyê dijîn. Kurdên êzidî yê Qeqqasyaya Başûr hemû li ser du beşên mezin parve dibin; êzidiyên Zuqurî, yanî êzidiyên ji qeza Wanê û êzidiyên Axbaranê, yanî êzidiyên ji qeza Qerse derketî.

Wê demê penaberên kurdên êzidî yê ku koçî Gurcistanê kiribûn, hejar û perîşan bûn, zimanê gurciyan nedizanîn, li jêrzmînan bi cîh û war dibûn, 8-10 nefer di odeyekê de diman, karê herî dijwar dikirin, kolanan gêzî dikirin û wek barhilgêr dixebitîn. Divê bê zanîn ku bav û kalên me, piştî ku ji warên xwe yê li Împaratoriya Osmanî koç kirin, dixwastin li wir bi awayekî demkî bimînin û paşê, gava ku her tişt aram dibe, dîsa vegehin welatê xwe. 10-15 salên ewil bawerî û hêvî hebû lê, sal bi sal hêviya vegera li cih û warên xwe winda kirin. Lê qedera wan ew bû ku her û her li van deran bimînin.

Sirgûnkirina kurdan ji Qeqqasyayê

Bêguman divê bê zanîn ku ligel kurdên êzidî gelek kurdên misilman jî ji Împaratoriya Osmanî koçî Qeqqasyayê kirine. Di mehên Mijdar-Kanûna sala 1944an de, rayedarên hikûmeta Sovyetê kurdên misilman (di nav de hejmarek kurdên êzidî jî hebûn) sirgûnê Qazaxistanê û Asyaya Navîn kirin. Li gorî Wezareta Karê Hundirîn di payîza sala 1944an de, ji başûrê Gurcistanê nêzîkî 9,8 hezar kurd hatin derxistin bo Qazaxistanê û Asyaya Navîn. Ji wan nêzîkî 5 hezaran kurdên Batumê bûn. Dibe ku hejmara rastî ya kesên ku hatine sirgûnkirin pir zêdetir bin, ji ber ku wê demê mirovên bê pasaport pir bûn. Ew li trênen ku ji bo veguheştina heywanan dihatin bikaranîn hatin siwarkirin û şandin sirgûnê. Di rê de çendîn kurd ji ber birçîbûn, sermê û nexweşiyê mirin. Hat zanîn ku gelek malbat winda bûne û xizmên wan hîn jî şopa wan nedîtine. Ev rastiyeke dijwar e ji rûpelên dîroka kurdên Gurcistanê. Yê ku nû koçî Gurcistanê bibûn û carek din beşek ji wan hatin sirgûn kirin. Ew e qedera miletê me, rast hatiye gotin: «Miletêkî bê dewlet, mîna sêwiyên berdîwar e».

Divê bê gotin ku gelê kurd di dema dewleta Sovyetê de sal bi sal bû civakeke pêşdaçûyî, xwende û pê re jî civakê reng û rûyê xwe wenda nekir. Erf-edet, çand û taybetmendiyên xwe parast. Bi texmîna min di dema Sovyetê de kurdên êzidî salên zêrîn bihurandin. Him di meseleyên gulvedana çand û kultura civakî de û him jî di xweparastin, xwenaskirin, pêşdaçûyînê de. Li gorî nûnerên diyasporayê bi xwe, ronesansa çandî ya rastî ji bo kurdên êzidî yên Gurcistanê di salên 1960-1980î qewimiye.

Dema ku behsa kurdên Sovyeta berê tê kirin pirtir kurdên Ermenistanê tê bîra kurdên cihanê. Ji ber ku radyoya kurdî ya di cihanê da bi navûdeng, rojnameya kurdî ya here jiyandirêj «Riya teze» û piraniya ronakbîrên kurd yên Sovyeta berê li Ermenistanê bûn. Di hêla pêşdabirina çand, wêje, dîrok, zimanê kurdî da Ermenistan bû navenda hemû pêşketinan û ne tenê bona kurdên Sovyeta berê ji bo kurdên hemû cihanê jî.

Civaka kurdên Gurcistanê jî gelek kesayatiyên navdar da cîhanê. Di karên pêşxistina çand û edebiyeta kurdî da keda wan jî pirr zêde ye.

Di dema Yekîtiya Sovyetê û piştî navên dezgeh û rêxistinên kurdî li Gurcistanê

Yekem car di dîroka kurdên Gurcistanê de, di sala 1978an li Tîblîsê, di Komîteya Dewletê ya Televîzyon û Radyoya Gurcistanê de bi serokatiya Keremê Anqosî bernameyeke heftane ya 15 deqeyan bi kurdî dest bi weşana xwe kir. Ev beşa kurdî 40 sal zêdetir e ku bi kurdî dengê xwe digîhîne kurdên Gurcistanê û yên li cîhanê. Piştê hilweşandina Yekîtiya Sovyetê sazî û xebatên kurdan neman û li Gurcistanê tekane xebatê kurdî mabû ku ev jî beşa kurdî ya vê radyoyê ye. Keremê Anqosî di radyoya kurdî de li Tîblîsiyê ji sala 1978an heta koça xwe berdewam kir.

Sala 1979an bi serokatiya Mirazê Ūzo û Şalîkoyê Bêkes Şanoya Kurdî ya Gelerî vebû. Di sala 1981ê de li Gurcistanê 3 roj li peyhev Rojên Çanda Kurdî hatin lidarxistin. Di sala 1991ê de, bi alîkariya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, şanoya netewî ya kurdî bi tûrneya serdana Fransayê kir. Her wiha saziyên hunerî û Komeleyên Nivîskaran, komên muzîk û dîlanê çebûn. Du dibistanên navîn de dersên zimanê kurdî demeke dirêj hebûn.

Di salên 1960î de, Keremê Anqosî yekemîn rêxistina kurdî li Gurcistanê «Encumena Xebata bi Ciwanên Kurd re» li rex Komîteya Bajêr a Komsomol ya Tîblîsê de saz kir, ku ew bixwe heta sala 1975an rêberiya vê

komeleyê dikir. Paşê Şamil Nadirov û Yûra Nebiyev rêvebiriya Encumena Civanan kirin.

Piştî di sala 1988ê de, «Komeleya Kurdên Gurcistanê Ronahî» hat damezrandin. Serokê wê komeleyê Yûra Nabiyêv bû. Paşê navê wê rêxistinê bû «Komeleya Bajarvaniya Kurdên Gurcistanê», û di sala 1998an de wek «Yekîtiya Êzidiyên Gurcistanê» hate binavkirin. Ev rêxistin bi serokatiya Rostem Ataşov bi saya piştgiriya aborî ya Balyozxaneyê Almanyayê li Gurcistanê xurt bû. Her wiha li Gurcistanê Yekîtiya Mamosteyên Kurd, Yekîtiya Nivîskarên Kurd, Yekîtiya Wênesazên Kurd hatibûn damezrandin.

Ji sala 1992an heya sala 2000ê Navenda Çanda Kurdî bi serokatiya Zaza Kalaşov karê xwe dimeşand. Di sala 1999an de yekem rojnameya bi kurdî «Gelawêj» li Tîblîsê bi serkariya Kerem Anqosî dest bi weşana xwe kir.

Jiyana çandî ya kurdên Gurcistanê di salên 1990ê de têk çû. Şanoya kurdî di sala 1992an de ji ber pîrsgirêkên aborî hate girtin. Navendên din ên çandê yên kurdî ji hev belav bûn, Yekîtiya Mamosteyên Kurd, Yekîtiya Nivîskarên Kurd, Yekîtiya Wênesazên Kurd hatin girtin. Lê dîsa jî di demên weha de rojname û pirtûkên kurdî dihatin çapkirin.

Navên nûnerên civaka kurd li Gurcistanê ku kedeke mezin di dîroka pêşketina gel de dane.

Li dema Sovyeta berê de û piştî re jî gelek profesor, akademîsyen, hunermend, lîstikvan, hiqûqnas, mamoste, werzişvan û bijîşk ji nav nûnerên diyasporaya kurdên Êzidî derketin. Nûnerên kurdên Gurcistanê di nava desteyên rêveberiya dewletê de cîh girtin û ew bûn endamên hikûmet û parlamentoyê. Zarokên kurd di çend dibistanan de dest bi perwerdeya zimanê zikmakî kirin.

Ez dixwazim navên çendik nûnerên civaka me yên heja, ku kedeke giranbûya ji bo pêşketina civaka me dane bînim ziman.

Karsaz û xêrxwaz birêz Sulîko Sîmayêv. Ew î bi xercê xwe avahiya Navenda Çanda Kurdî û Parestgeha Ezî li bajarê Tîblîsê ava kir. Hêjayî gotinê ye ku ji dema Yekîtiya Sovyetê de heya roja îro parlamenterê me hebûne. Eva êdî 2 caran li pey hev hemwalatîyê me ye hêja Îsko Dasînî parlamenterê Gurcistanê ye.

Akademîsyen, profesorê kurd yê mezin Îvan Farîzov, xwedî Ferhenga Rûsî-Kurdî ye ku di sala 1957an de li Moskovayê hatiye weşandin. Serokê

beşa «tekiliyên aborî yên navneteweyî» li Enstituya Lêkolînên Asya û Afrikayê ya Zaningeha Dewletê ya Moskovayê bûye. Zanyara navdar profêsor Zara Elî Yusupova gelek salan serokatî li koma kurdzaniyê ya Enstîtuya Rohhilatzaniyê ya Akadêmiya Rûsyayê ya Zanyarî, beşa Sankt-Pêtêrbûrgê dikir û karê Qanatê Kurdo yê mezin bi serketî berdewam dikir. Aborînas Kerem Amoyêv, ernograf Lamara Paşayêva, hiqûqnas Samvêl Koçoyî û dîrokzan Nodarê Masekî gelek pirtûk û gotarên zanistî li ser kurdan weşansine. Ev hemû zanyarên navdar li Gurcistanê ji dayik bûne.

Herwiha, kesên hêja ku ez ê navên wan li jêr rêz bikim, ji bo me çavkaniyên serbilindiyê ne: profesor, biolog Lyûsya Aloêva, profesor, norolog Manana Aloyêva, profesor, travmatolog Yûra Kaloyî, helbestvan û nivîskarên me yen bi navûdeng Şikoyê Hesên, Baxçoyê Îsko, Ezîzê Îsko, Taharê Biro, Cerdoyê Esed, Morovê Qubê, Koloş Şeroyêv, û yên din li Tîblîsî dijîtin. Nivîskar Yûrayê Dasinî, bijîşk û nivîskar Ezîzê Gerdenzerî jî ti bîsvan bûn.

Gelek xortên me di nav polîsan de bi serkeftî xizmetê dikin, hinek ji wan xwedî erk in.

Kamil Yusif Bedîrxan, kurê Mîr Bedîrxan ku gelek salan li vir maye, kedeke mezin kiriye ji bo pêşketina çanda kurdên Gurcistanê û li Tîblîsîyê, di nav mezelên êzidiyan da hatiye defin kirin. Par monûmenta (abîde) wi li nava goristana êzidiyan de bi alikariya ya profesor, birêz Ezîzê Zîyo û herwiha bi rêvebirî û komekdariya birêz Hejarê Şamil hate ava kirin.

Dengbêj Şeroyê Biro, sazband Razmîke Şîko, Şeroyê Pîr, dengbej Xemoyê Hesên, sazband Casime Cerdo, Milazime Îsko li Gurcistanê dijîtin, xwedî şûreta dengbejiya bêhempa bûn. Wan bi deng û awazên xwe dîroka hunerê ya kurdan dewlemend kir.

Keremê Gerdenzerî hîmdarê stranên popa kurdî, di 1974an de koma kurdî ya muzîka modêrn bi navê *Koma Wetan* çêkir. Kariyera wî li vê komarê dest pê kiriye.

Bi dehan wênesazên kurd li Gurcistanê ji dayik bûne û hemû jî endamên Yekîtiya Wênesazên Gurcistanê ne: Anton Mîrzoşoyêv, Besa Peyale, Têmûr Raşoyêv, Lyovayê Cindî, Andoyê Çîldergûşî, Mîranê Okê, Temur Kulîanî, Kulîxane Cewo, Lamara Mîrangî, Manana Mendikî ku li gelek welatên cîhanê berhemen wan di pêşangehan de tên pêşandan.

Nazî Şîray hunurmenda sîrka Moskovayê li vir ji diya xwe bûye. Her wiha hevbajariyên me Sertîv Mûradov, Ezîz Askeryan jî îro artistê Rûsyayê yê gelêrî ne.

Karmende civakî, serokê «Gruzinform»ê, rojnamavan Kerêîm Rasoyêv, çalakvana jêhatî Jênîya Zurbaêva û rojnamevan Aza Evdalî kedeke mezin dane seva hişyarbûna gelê kurd li Gurcistanê. Salên dirêj xwîşk û bira Natêla û Vladîmîr Ecemov reqsyanên balêtê yên tiyatroya Lênîngradê bûne. Stranbêja operayê Svetlana Kasyan û futbolîstê navdar Guram Ajoev li Yekîtiya Sovyetê ya berê kesayetiyan navdar in. Ew hemî kurdên Gurcistanê ne.

Amirhêz Otari Nadîriyan 30 sal karmendekî serkeftî yê Wezareta Karên Hundir û Dezgeha Ewlekariya Dewletê ya Gurcistanê bû, Rêzo Nadoyi dadwar e, Vladîmîr Rizgoev 20 salan li bajarokekê Tîblîsî de dadger bû.

Lê hilweşîna Yekîtiya Sovyetê bi awayekî berbiçav rewşa netewên kêmjimar guhêrt. Ji destpêka salên 1990î û vir ve rewşa civakî, çandî û hiqûqî ya êzidiyan gelekî nebaş bûye. Ev zedetirî 30 sal in hejmareke mezin ji kurdên Ermenistan û Gurcistanê ber bi Rûsya û Ewropayê koç dikin, ev jî pêvajoya asîmîlekirina wan zêdetir dike.

Ez ê bi kurtayî behsa rewşa niha ya civaka me jî bikim. Komeleya Kurdên Gurcistanê «Ronahî» meha cotmeha sala 2021an bi serokatiya Zaza Kalaşov u bi pişgiriya çend rewşenbîrên kurd yên Gurcistanê hate damezrandin. Komeleya Kurdên Gurcistanê di nava demekî kurt de bi dehan kes dora xwe kom kir û bi awayeke çalak karê xwe dimeşîne. Armanç û mebestên rêxistinê ew e ku tevkariyê li yekbûna civaka kurd ava bike, xebatê bike ji bo parastina mafên kurdên Gurcistanê. Herwiha pêşxistina çand, parastina ziman û kevneşopiyên kurdî di nav armancên wê de ye. Her wiha beriya 3 salan bi serokatiya Natî Tîtalî Platforma Civakî û Çandî ya Kurd-Gurcî jî hatiye damezrandin.

Derbarê belgeyan li ser kurdên Qeqqasya Başûr di Arşîva Dîrokî ya Neteweyî ya Gurcistanê de

Divê bê gotin, gelek belgeyan li ser Kurdên Qeqqasya Başûr di arşîva dîrokî ya neteweyî ya Gurcistanê de têne parastin. Li vir gelek materyalên balkêş û girîng li ser bicihkirina penaberên kurd li Gurcistanê û Ermenistanê, agahiyên li ser kurdên Azerbaycanê, gelek belgeyan fermî

der barê Komara Kurdistanê, li ser çand û perwerdeyê di nav kurdan de, li ser qada civakî, li ser pêkhatiyên eşîrên kurdî, nifûsa Qefqasyaya Başûr, li ser dînê êzidiyan, awayê jiyana wan, dabînkirina erdan ji bo kurdan, nifûsa gundan, li ser tevlibûna kurdan di jiyana civakî û siyasî ya welêt de hene. Her wiha agahiyên li ser organîzekirina karûbarên dibistanê di nav kurdan de, bi taybetî çêkirina klûbên netewî, navendên çandî û perwerdeyî, kurdiya Trans-Qefqasyayê, dibistana teknîkî, li ser çapkirina pirtûkên dersê yên dibistanê bi zimanê kurdî, li ser perwerdekirina mamosteyên zimanê kurdî, li ser klûbên şanoyê bi zimanê zikmakî di arşivên Gurcistanê de hene. Wan agahiyên di pirtûka Keremê Ankosî bi navê «Belgeyên li ser kurdên Qefqasyaya Başûr ku di arşîva neteweyî ya Gurcistanê de hatine tomarkirin» de hatiye bicihkirin.

Derbarê rewşa zimanê kurdî li Gurcistanê

Ji salên 2000î ve hejmarek e mezin ji ciwanên me di hemû zaningehên Gurcistanê de perwerde dibin. Lê mixabin, zarok û ciwanên kurdên li Gurcistanê êdî bi piranî bi kurdî nizanin û neaxivin. Ne tiştê veşartinêye milletê me ku li xerîbiyê de dijî, berbi gelek pirsgrêkan ve rûbirû ye. Pîrsa herî sereke helandina millet e. Di wê dewrê de xeyset, rabûn-rûniştandina millet zû tê guhartinê, tîrsa herî mezin windakirina zimên e. Mixabin gelek kesên kurd zimanê xwe nizanin û zarokên wan jî ji zanebûna zimên mehrûm in. Pîrsgirêka windakirina zimên ji bo gelê me pir girîng e. Dibistanên me tune ne ku zarok bikaribin zimanê xwe hîn bibin, loma jî giranî dikeve li ser stuyê malbatan. Lê heke ne em bi xwe bin, tu kes nikare aliyê me bike. Li vir zimanê kurdî berbi windabûnê ve diçe. Eyan e, mirina zimên mirina gel e. Îro erkeki mezin li ser stuyê dê û bavan, kalik û pîrikan heye. Îro evana zarokxane û dibistanên zarokên xwe ne, dibê li nav malê bi zimanê xwe biaxivin. 120-130 salên dirêj em ji welatê xwe derketine, neheliyane, nemaşyane, qeç yan xirav me xwe parastiye. Werin em dîsa kevneşopiya han bidomînin, hinekî hin kûrtir bifikirin, bila fikira bidestxistina nanê rojê dewlemendiya nebinayî û mezin me de nekoje, me bê ruh ê bê îmdad nehêle. Divê em hemû xwedî li zimanê xwe derkevin, jiber ziman hebûna miletan e, ziman rûmeta gelan e, ziman ruhê mirovan e. Divê bi zûtirîn dem re û dirbê çareserikirina vê pîrsgirêka mezin were dîtin. Li Gurcistanê ji me re pirtûkên rêzimana kurdî, mamosteyên pisporekên zimanê kurdî lazim in.

Êzidî kurd in yan na?

Divê bê gotin li Gurcistanê di navbera kurdên êzidî û misilmanan de tu cudahî tune bû û di fikra tu kesî re ev tişt derbas nedibû. Bi hilweşîna welatê Sovyetê ev tifaq hilweşiya. Mixabin ji ber dek û dolabên dijmin, hêzên nîjadperestan pirsar «êzidî kurd in yan na?» derdiket li meydana, di navbera her du tayên kurdan de ev bêtifaqiya malwêran pêş da hat.. Cihê mixabinê ye ku ev siyaseta dijminan li Parlamana Iraqê ji ber dewam bû. Bi însiyatîfa çend parlementerên êzidî biryarnamayeke ku 170 parlamentêrên Iraqê îmze kirin ku divê êzidî mileteke cuda bê hesabandin. Ev pêşnûma ji bo nîqaşê pêşkeşî parlamentoyê kirin. Êzidî beşek biçuk ji 40-50 milyon gelê kurd in ku bi sedsalan ferman, zordarî û çewsandina dînê re rûbirû maye û li ber xwe dide ji bo ku dînê êzidiyatîyê biparêz in. Hejmara êzidiyan li cîhanê yek milyon tê hesab kirin. Ger em ji miletekî 50 milyonî veqetin, tiştêk bi wan nayê, lê em nikarin xwe wek miletekî cuda biparêzin. Bêguman, dijminên me çiqasî hewl bidin û bixwazin gelê me parçe bikin jî nagihêjin armanca xwe. Em yek millet in, zimanê me yek e, erf û edetê me, kilam û reqasên me yek in. Heta ku qewil û beyt û duayên êzidiyan bi zimanê kurdî ye, bi zaravayê kurmançî ye, bila dijminên gelê yekê ji bîr nekin. Di bawerîya min de ne Kurdistan bê êzidî dibe, ne jî êzidî bê Kurdistan dikarin bişînin. Ji ber ku ev dîn li ser vê axê xwedê naskirîye û ji bo vê axê jî 73 ferman li wan rakirine. Heta niha bo parastina nasname, çand û zimanê kurdî, êzidî mal û jiyana xwe dest dane.

Însiyatîfa vegerandina pašnavên kurdî

Îro em dixwazin ji bo destpêkirina pêvajoya vegerandina pašnavê kurdên Qefqasyayê pêşniyar bikin. Li diyasporayê, vegerandina pašnavên dîrokî ji bo kurdan parastina xwenasîna xwe wek faktoreke girîng dibînin. Afirandina pîrsgirêkan di vî warî de weke pêngaveke cihêkar a li hemberî wan tê dîtin. Di sala 2000an de çend sazîyên kurdî yên Gurcistanê, ji sazîyên pêwendîdar re têkilî danî û daxwaz kir ku pêvajoya vegerandina pašnavên resen yên kurdan ku di encama pêvajoya dirêj a koçberiyê ya di destpêka sedsala 20an de winda bûne, bê destpêkirin. Lê belê, bêtî tu şîrove li ser vê mijarê bê kirin ev daxwaz hate red kirin. Piştî hukmê taybet ku di sala 2003an de ji hêla Wezareta Dadê ya Gurcistanê ve hatî pejirandin, vegerandina pašnavên dîrokî yên ne Gurcî tê şînardar kirin. Di meha mijdara sala 2021an de di Komîteya Parastina Mafên Mirovan û

Yekîtiya Sivîl ya parlamenoya Gurcistanê li gel Serokê Komîteya Parastina Mafên Mirovan û Entegrasyona Sivîl ji bo nîqaşkirina mijarên têkildarî guhertina paşnavan ji bo kesên ji eslê xwe cuda civînek hate lidarxistin. Di civînê de di gel karbidest, endamên parlamane û nûnerên saziyên sîvîl û nûnerên Ajansa Pêşxistina Xizmetên Dewletê, parlamentar Îsko Dasinî, ez, Zaza Kalaşov, Natî Tîtalî jî amade bûn. Komîte li ser guhertineke qanûnî dixebiti, ku bi rêya wê hemwelatîyên Gurcistanê yê bi eslê xwe etnîkî (kurd, azerî û hwd.) ku paşnavên wan di dirêjahiya dîrokî de hatine guhertin, dê karibin paşnavê ku li gorî rêgezên, li gorî kevneşopiyên xwe yê dîrokî û çandî hatine çêkirin, vegerînin. Ev pêşnûma ji bo nîqaşê ji parlamentoyê re hat şandin û ji ber sedemên nediyar piştî guhdarîkirina yekem, mixabin gotûbêjkirina vê pêşniyarqanûnê hat rawestandî. Di vê mijarê de pêwîste em karê xwe bihêztir bikin ji bo bidestxistina encamên erênî.

Rêzdarên hêja, di vê gotarê de min hevîl da bi kurtayî dîroka kurdên êzidî yê li Gurcistanê û pîrsgirêkên heyî ji we re şîrove bikim ku em bi hev re rêyên çareserkirina van pîrsgirêkan bibînin. Bav û kalên me dibêjin; *em ne ji malbatekê ne, lê em di halekê da nin*. Daxwazên me yê mezin hene û divê pêwendiyên me xurtir bin. Bi hevgirtin û piştgiriyeke xurt em ê encamên baş bi dest bixin. Jixwe me gelek dem wînda kiriye, gelek gelan dewletên xwe ava kirine û em hê li cihê xwe rawestiyane.

Spas dikim û mala we ava ji bo guhdarî kirina we! Hevidarim dê konferanse me serkeftî be.

KURDÊN ERMENISTANÊ: BERÊ Û NIHA



Titalê Kerem Rojnamevan⁸

Berî her tiştî ez li ser navê xebatkarên Bernemaya kurdî ya radyoya Êrîvanê û rojnameya «Riya Teze» we hemû beşdarên konferansê silav û pîroz dikim. Ez ê hinek malûmatan di derheqê dîroka kurdên Ermenistanê de raberî we bikim. Rast e ev dîrok, dîroka çand û hunerê ye, gelekî dewlemend e, le ez ê biceribînim bi kurtayî derheqa wê da ji we re raber bikim.

Rewşa kurdên Ermenistanê her dem ji rewşa kurdên komarên Yekîtiya Sovyetê yê din cuda bûye. Serokatiya komara Ermenistanê pir caran destê alîkariyê dirêjî civaka kurdan kiriye. Hema ji destpêka damezrandina komara Ermenistana Sovyetê serokatiya komarê biryar da ku li dibistanên gundên kurdan zimanê kurdî bê xwendin. Ji bo vî karî pêwîstî, pêdîviya alfabeyeke zimanê kurdan hebû. Sala 1921ê şuxulkarê ermenî Lazo (Hakob Xazaryan) ser bingeha tîpên ermenî alfabeya zimanê kurdî çêdike û havîna wê salê yekemîn pirtûka bi zimanê kurdî «Şems» çap dibe. Berê di sêwîxaneyan da (li nehiya Aştarakê ya Ermenistanê), dûra li gundên kurdan da zarok bi vê pirtûkê fêrî xwendin û nivîsandina zimanê kurdî dibin. Êdî di sala 1921ê de li 5 gundên kurdan dibistanên kurdî tên vekirin.

⁸ **Titalê Kerem (Çaloyan)** (Tebax 1965, Ermenistan). Ji sala 1989an li bernameya kurdî ya radyoya Êrîvanê dixebite. Niha berpîrsiyarê vê bernameyê û rojnameya «Riya Teze» ye.

Sala 1921ê Kongreya Êzidiyên derdora çiyayê Elegezê tê lidarxistin, dawiya wê salê jî Kongreya Ermenî û Êzidiyên Penaber tê lidar xistin. Êdî sala 1922an nûnerên kurdên êzidî li parlamêntoya komara Ermenistanê tên hilbijartin.

Ji bo başkirina rewşa kurdan ji aliyê serokatiya partî û hikûmeta Ermenistanê gelek biryar tên girtin. Kurdên êzidi yên penaber, ku li bakûrê Kurdistanê gund û şênîyên xwe hiştibûn û revîyabûn Ermenistanê neçar mabûn ku koçeriyê bikin. Piştî demeke nêdirêj hikûmetê ew di gundan da bi cih kirin û li hinek cihan jî ji wan re gundên nû ava kirin. Ji sala 1925a heta 1928an 20 gund dane kurdên penaber. Di nav wan salan de ji bo hînbûna xwendinê karekî berbiçav tê kirin.

Di sala 1922an de hejmara kurdan li Ermenistanê nêzîkî 8500 merivî bû û hema bêjê gişk kurdên êzidî bûn.

Piştî şoreşa Şêx Seîd beşeke kurdên misilman ku salên Cenga Cihaniyê ya Yekemîn ji Rûsyayê revîbûn û li devera Wanê bi cih bibûn (nêzîkî 4 hezar malbet, ku ji eşîrên Brûkî, Banokî, Misirkî û Celalî bûn) dîsa vegeyriyan û hejmaran kurdan li komara Ermenistanê ghişte 15500î.

Di sala 1925an de yekemîn kongreya kurdên bêpartî ji hikûmeta Ermenistanê dixwaze, wekî alfabeya kurdî li ser bingeha tîpên latînî bê damezrandin. Ew kar ji aliyê Îsahak Moragûlov û Erebe Şemo di sala 1928an da pêk hat û di sala 1930î de ew alfabe di dibistanên kurdî da dihat bikaranîn. Ji 31.03.1930î rojnameya «Rîya Teze» bi wê alfabeyê tê weşandin. Sala 1931ê kolêja Pişkavkazêye⁹ Perwerdeyê, ya kurdî tê vekirin, da ku ji bo dibistanên kurdî mamoste bèn amade kirin.

Di sala 1931/32an de li Ermenistanê 27 dibistanên kurdî hebûn, di sala 1937an de ev hejmara dibistanan digihêje 48an. Ji sala 1929an heta 1932an 21 pirtûkên dersan tên çap kirin.

Sala 1925an Ermenistan dibe mazûvanê kongreya kurdên Pişkavkazê.

Di wan salan de ji aliyê çandê ve gavên hêja hatin avêtin. Sala 1926an fîlmê bi navê «Zerê» tê kişandin, ku mijara wê jiyana kurdan bû û çend kurdan jî wek aktor di wî fîlmî de dilîstin. Ew fîlm bi bingeha xwe etnografî

⁹ Pişkavkaz, ku tê wateya "li pişt Qeqqasyayê", têgîna rûsî ye ji bo Başûrê Qeqqasyayê. Pişkavkaz, wergera peyva rûsî "Закавказья" ye. Li Yekîtiya Sovyetê ya berê, Başûrê Qeqqasyayê wekî "Pişkavkaz" dihat binavkirin - *amadekar*.

bû, jiyana kurdên wê deverê dianî ber çavan. Di heman salê de dîsa filmeke dokumenter bi navê “Kurd û Êzidî” tê kişandin.

Sala 1934an Konferansa Kurdên Yekîtiya Sovyetê li Êrîvanê tê lidarxistin. Kurd û kurdnasên ji her sê komarên Pişkavkazê û Tirkmenistanê, ji bajarên Moskovayê û Lênîngradê beşdarî wê konferansê dibûn. Konferans bi taybetî ser van mijaran rawestiya; standartkirina zimanê kurdî, guhêrînên civakî-aborî û bandora wan ser zimanê kurdî, rêforma alfabeya bi tîpên latînî, rêziman û termînolojiya kurdî. Konferansê bi vî awayî jî qedrekî hêja da pêşvebirina çanda kurdî, parastina kelepora netewî, bi taybetî jî folklor, sazbandî û tiştên bi dest tîr çêkirin.

Divê bê gotin ku ji bo parastin û bi pêşvebirina çanda kurdî hikûmetê alîkariyeke berbiçav dida. Di sala 1937an de şanoya kurdî ya dewletê ku şanoyeke profesyonel bû, tê damezrandin ku li her sê komarên Pişkavkazê derdiket pêş bînêran. Komên govend û stranên kurdî çawa li komarên Pişkavkazê konsêrt didan wisa jî li Moskovayê konsêrt didan.

Yekemîn nimûna wêjeyî bi zimanê kurdî di sala 1931ê de tê çap kirin. Lê di sala 1932an de yekemîn almanak (salname) ya nivîskarên kurd çap dibe. Gerekê bê gotin, wekî piraniya nivîskarên wê nivîşê ku li sêwîxanan mezin bibûn, li wir fêrî xwendin û nivîsarê bibûn.

Ji sala 1929a heta 1937a bêtirî 70 pirtûk bi zimanê kurdî çap dibin.

Li Ermenistanê jî, mîna li komarê Yekîtiya Sovyetê yê mayîn, salên zordestiya rêjîma Stalîn (1937-38) pêşveçûna ziman û çanda kurdî rawestiya. Dibistanên kurdî, koleja perwerdeyê, rojname ‘Rîya Teze’, beşa nivîskarên kurd li Yekîtiya Nivîskarên Ermenistanê, bernameyên radyoyê yên bi kurdî, hema bêje her tiştên li ser kurdî hate girtin ji bilî Şanoya Kurdî ya li Elegezê. Karên Şanoya Kurdî jî di sala 1947an da bidawî bû. Gelek ronakbîr û navdarên kurd hatin girtin û neffîkirin; Erebe Şemo, Heciyê Cindî, Cerdoyê Gêncî, Ahmedê Mîrazî, Cangîr axa, Şamil Têmurow...

Piştî mirina Stalîn, bi taybetî ji sala 1955an û şûnde di jiyana kurdên li Ermenistanê dijîn guhastinên mezin bûn. Wê salê Sekreterê Yekemîn yê Partiya Komunîste Ermenistanê Sûrên Tovmasiyan, ku nû hatibû hilbijartin, komeke ronakbîr û siyasethêrên kurd divexwîne cem xwe û bi wan re ser pîrsa ji nûva geşkirina ziman û çanda kurdî gotûbêj dike. Piştî vê rasthatinê, rojnameya «Rîya Teze» û weşanên radyoyê yên kurdî ji nû ve dest bi weşanê dike.

Di weşana radyoyê de ji bo zêdebûna dem û bernameyan emekê Mele Mistefa Barzaniyê nemir heye. Sala 1958a, berî çûyîna Kurdistanê, dema ku ew ji Moskovayê tê Ermenistanê, ji xebatkarên radyoyê dipirse ku çi daxwazên wan hene ku ew bêje serokatiya Sovyetê. Dibêjine wî ku ew dixwazin ku dema programên radyoyê bê zêdekirinê. Û wisa jî dibe. Piştî çûyîna wî, dema xebirdanên radyoyê zêde bûn û berebereyî gihîşte seat û nîvekê.

Em bêjin wekî beşa kurdî ya Radyoya Êrîvanê û rojname «Riya Teze» îro 94 salî ne. Di roja îroyîn de êdî gelek radyo û televîzyonên kurdî hene, lê çawa nava cimetê da te gotinê «Radyoya Êrîvanê», bi tîpên zêrîn navê xwe di dîroka kurd û Kurdistanê de nivîsiye.

Wê salê beşa Nivîskarên Kurd li Yekîtiya Nivîskarên Ermenistanê dîsa dest bi karê xwe kir, jimara pirtûkên bi zimanê kurdî dihatin çap kirin zêde bûn. Rast e dibistanên kurdî êdî nehatin vekirin, lê di dibistanên gundên kurdan de heftê du seatan ziman û wêjeya kurdî dihat xwendin. Dîsa wê salê ji bo amadekirina mamostayên zimanê kurdî li kolêja perwerdeyê ya ermeniyîyan beşa kurdî hate vekirin. Sala 1959an li Enstîtuya Rojhilatnasiyê beşa kurdnasiyê hate vekirin, lê di sala 1970î de jî ji bo amadekirina pisporên kurdnas, li Zanîngeha Êrîvanê beşa kurdnasiyê dest bi xebatên xwe kir.

Salên 1970ê li gundê Elegezê, ku navenda 11 gundên kurdên êzidî ye, şanoya kurdî ji nû ve hate vekirin, lê vê carê êdî ne şanoya profesyonel bû. Lê dîsa jî wê şanoyê gelek piyesên nivîskarên kurd û yên ji zimanên mayîn werger kirin û li ser dikê raberî bînerên Ermenistanê û Gurcistanê kirin.

Di dawiya salên 1950î de hejmara xwendkarên kurd li zanîngeh û enstîtuyên Ermenistanê zêde bûn, ji nav kurdan gelek kesên navdar derketin, çendek ji wan li seranserî Ermenistanê û ji tixûbê wê der hatin naskirin.

Di sala 1959an de ji sênaryoya Erebe Şemo fîlmê dokumenter «Kurdên Ermenistana Sovyetê» tê kişandin. Di wî fîlmê de jiyana kurdên Ermenistanê ya rojane û destkeftinên wan ên dema sovyetê dianî ber çavan.

Ji destpêka salên 1930an heta dawiya salên 1980an li Ermenistanê gelek pirtûk bi zimanê kurdî hatine çapkirinê. Îro li pirtûkxana Komara Ermenistanê ya Netewî nêzikî 700 pirtûkên bi zimanê kurdî hene. Pirtûkên

bi zimanê kurdî wekî din li pirtûkxaneya Akadêmiya Zanyariyê ya Komara Ermenistanê û li pirtûkxaneyên gundên kurdan hene.

Piştî hilweşîna Yekîtiya Sovyetê pêşveçûna ziman û çanda kurdî li Ermenistanê bi temamî ranewestiya, lê pirsên aborî pêşda hatin. Bi hevkarîya tevî hikûmeta Herêma Kurdistanê rojnama «Rîya Teze» çap dibe, programên kurdî di radyoyê de rojê nîv saet in, lê berê rojê saet û nîv bûn. Ev hemû pirs bi aborîyê va girêdayî ne. Kadroyên Beşa Kurdnasiyê li Enstîtuya Rojhilatnasiyê nemane, şanoya kurdî nemaye, komên folklorê hindik in. Ezmûna kurdên Ermenistanê dema Sovyetê destanî, hê jî kêrî parastina ziman û çanda kurdî tê.

Îro jî karê parastina kulturî bi piştgiriya Şêwira Kurdên Ermenistanê, ya bi serokatiya birêz Kinyazê Hemîd berdewam e. Kinyazê Hemîd di nava parlamentoya Ermenistanê da parlamenterê me ye û dema ku pêwist dibe pirsên me li ber parlamentoyê bilind dike. Rast e kar pêşda diçe lê ne wekî berê ye. Kadroyên ciwan tune ne, çimkî ew pêşyên cûda hildibijêrin.

Dewleta Ermenistanê bi qanûnî mecal û derfetan dide ku wan kara bikin, lê ji aliyê aborî da gorî qewata xwe piştgiriya dide. Bo nimune, bi piştgiriya wezareta çandî û perwerdê di van salên dawî de 12 kitêbên dersên zimanê kurdî yên bo mekteba hatine çapkirinê. Bi piştgiriya dewletê usa jî pirtûkên nivîskarên kurd çap dibin, lê ne wekî berê.

Piştî hilweşîna Yekîtiya Sovyetê, bi deh hezaran meriv kurd, ermen û ji netewên din ji ber sedemên aborî bûne penaber. Îro civaka kurdan hêdî hêdî bi ser xwe da tê lê hê jî li pêşiya wan gelek astengî hene.

Di dawiyê de ez careke mayîn beşdarên konferansê pîroz dikim û spasiya xwe pêşkeşî we dikim ji bo vê organîzasyona baş. Ez yekitiyê û tifaqê bo temamiya gelê kurd dixwazim. Bila bijî kurd û Kurdistan!

REWŞA KURDÊN AZERBAYCANÊ



Zabîr Mammadov

Serokê Navenda Çanda Kurd "Ronahî" ya Komara Azerbaycanê¹⁰

Hebûna kurdan li ser axa Azerbaycanê ji demên kevnar de ye. Tê bawerkirin ku kurd ji dema Îskenderê Mezîn hem li Azerbaycana îroyîn û hem jî li bakurê Îranê dijiyan. Li gorî dîroknasan, hêj li Albanyaya Qefqasyayê çend eşîrên kurdan hebûne û kurd yek ji gelên otokton (xwecih) ên herêma Aran (li jorê çema Erezê) û Atropatena ne.

Îro kurd li vê herêmê piştî azerîyan wek neteweya herî mezin hebûna xwe didomînin. Lêbelê di nava kurdên Azerbaycanê de proseya asîmîlasyonê hema bêje gihiştîye qonaxa dawî. Lê asîmîlasyonê tenê bi serdema nûjen ve girêdayî nîne, ew pêvajoya beriya çend sed salan dest pê kiriye. Sedemên sereke yê vê yekê ew e ku kurd û azerî di warê dînî (her du jî şîe ne) û çandî de pir nêzî hev in û her weha kurdên li Azerbaycanê dijîn peywendiyê rasterast bi Kurdistanê re tune ye.

Ji aliyê din, kurd bi sedan salan di rêvebirina herêmên Qefqasyayê de roleke girîng lîstine. Îro jî di rêveberiya Azerbaycanê de karbidestên bi eslê

¹⁰ Zabîr Bagîr oğlu Mammadov (01.04.1970, gundê Qarakêş, Laçîn, Azerbaycan). Çalakvanê civakî. Ji 30ê Avrêl 2023'an Serokê Navenda Çanda Kurd "Ronahî".

xwe kurd xwedî giraniyeke taybet in. Ev yek jî bûye sedem ku kurd di nav azeriyan de hîn zêdetir entegre bibin. Entegrasyonê deriyên asîmîlasyonê jî vekirîye. Îro bi piranî kurdên ku piştî şerê Qerebaxê ji Ermenistanê hatine Azerbaycanê, kurdî zanin, lê kurdên Laçin, Kalbajar (Kelbecer), Qubadli û Zengilanê ji sedî 95 asîmîle bûne.

Şerê Qerebaxê ya di navbera Ermenistan û Azerbaycanê di salên 1990î de bû sedema koçberkirina hemû kurdên misilman ên ji Ermenistanê. Dema ku ermeniyan Kurdistana Sor dagir kirin (1992-1994), bi giştî 150 hezar kurd ji herêmê koçber bûn û îro hemû gund û bajarên wan wêran bûne.

Di sala 1992an de ermeniyan ji bo qanûnîkirina dagirkirina Laçînê, tevî çend kurdan (nêzîkî 60 kes) ku bi otobusê ji Êrîvanê anîbûn, li Laçînê «Komara Kurdî ya Laçînê» îlan kirin. Lê ev «komar» ji rojekê zêdetir nejiya. Sedema sereke ya vê yekê tunebûna piştgiriya kurdên Laçin û herêmen din ên kurdnîşîn bû. Kurd jî weke azeriyan di dema dagirkirina Laçînê de ji herêmê bi zorê hatin derxistin. Ev faktor ne tenê li Azerbaycanê, her weha di nav diyasporaya kurd a li derveyê welêt jî bi tundî hat protestokirin. Piştî dagirkirina Kalbajarê di meha Nîsana 1993 de Navenda Çanda Kurdî ya «Ronahî» ji navê kurdên Azerbaycanê bang li kurdên cîhanê kir ku vê dagirkeriyê mehkûm bikin. Lê ji ber ku kurdên diyasporayê yên li derveyê welat bi ermeniyan re di nava têkiliyên dostane de bûn, ev daxwaza me bi awayekî cidî nehat piştgirîkirin.

Di sala 1993an de navçeyên din yên ku kurd lê dijîn, Qubadli û Zengilan jî hatin dagirkirin. Heta niha jî piraniya kurd wek penaber li çendin navçeyên Azerbaycanê belave ne.

Rewşa kurdan roja îro

Li ser hejmara kurdên Azerbaycanê îro agahiyên rastîn tune ye. Li gorî serjimariya fermî ya Komara Azerbaycanê ya sala 2009an, li wî welatî 6.100 kurd dijîn. Lê, li gorî pîsporên bê alî, li Azerbaycanê bakur bi sed hezaran kurd hene. Hema bêje hemû kurd wek tirkên azerî ji mezheba îslamê ya şîe ne. Ew bi zaravayê kurmancî diaxivin.

Kurdên li Azerbaycanê dijîn bi fermî derfeta wan heye ku dersên bijarte bi zimanê xwe yê dayikê bigirin. Lê îro tenê li 2 gundan dersê zimanê kurdî tê dayîn. Ji ber ku kurd li seranserê Azerbaycanê belav in,

organîzekirina perwederya bi zimanê dayîkê pir zehmet e. Her wiha pêwîstiya me bi mamosteyên zimanê kurdî hene. Em li ser vê mijarê kar dikin û serlêdana me bo hikûmetê heye.

Li Azerbaycanê Navenda Çanda Kurd a «Ronahî» ji aliya dewletê ve bi fermî hatiye qeyd kirin û xebata xwe dimeşîne. Rojnameyek bi navê «Dîplomat» bi zimanê kurdî derdikevin. Heta çend sal berê, rojnameya «Dengê Kurd» jî dihat çapkirin, ku di sala 1992an de dest bi weşanê kiribû. Her weha heftê du caran bernameya bi zimanê kurdî li Radyoya dewletê tê pexşkirin. Çend komên muzîka kurdî jî çalak in.

Vegera kurdan bo warên xwe

Piştî ku Qerebax û Rojhilatê Zengezûrê ji dagirkeriyê hat rizgar kirin, bi projeya dewletê, vegerandina gelên van deveran dest pê kiriye. Li gor vê projeyê heta sala 2026an 140 hezar koçberên navxweyî dê vegerin Qerebax û Rojhilatê Zengezûrê. Ta niha şêniyên 3 wargehên ku di nav korîdora berê ya Laçînê de cih digirtin (Laçîn, Zabûx û Sûs) vegeriyana malên xwe.

Dixwazim li ser pirsekê jî bisekînim. Hema bêje, hemû rêxistinên kurdan li ser navê me biryaran didin. Ez dikarim bûyerên li derdora Kurdistanê Sor diqewimin wek mînak bidim. Wekî min di serî de jî got, di sala 1992an de Ermenistan li gor plana xwe li navçeya Laçînê komareke yekrojî îlan kiribû. Herî balkêş ew e ku kurdên Azerbaycanê piştî çend mehan ji vê bûyerê agahdar bûn. Ev bûyer ziyanê mezin gihand kurdên Azerbaycanê, ku îro jî bandora wê berdewam e.

Îro pirsgerêka kurdên Azerbaycanê, di serî de ew e ku vegerin ser erdê xwe. Wek min got, tevahî gund û bajarên wan wêran e û kevir li ser kevir nemaye. Vegera me, dibe ku çend salan jî dom bike. Jixwe pirsgerêka asîmîlasyonê ya herî sereke ye. Eger rêxistinên kurdan dixwazin alîkariyeke bidin kurdên Azerbaycanê, bila di warê amadekirina bernameya dersê zimanê kurdî de û di warê çandî de piştgiriya bidin me. Her weha daxwaza me ew e, ku rêxistinên kurdan bila bi nûnerên kurdên Azerbaycanê re di peywendiyê nêz de bin. Beriya ku li ser kurdên Azerbaycanê biryarekê bidin, bila pêşî bi me ra, ango bi kurdên Azerbaycanê re bişêwirin.

Rêz û silav ji bo hemû beşdarên Konferansê re...

REWŞA KURDÊN QAZAXISTANÊ: DUH, ÎROJ Û SIBE



Rafik Mîrzoyêv

Serokê Weqfa Meclîsa Gel a Qazaxistanê¹¹

Silav û rêz, gelî endamên konferansê! Berî ewilê li ser navê şanda kurdên Qazaxistanê, spasiya Serokatiya Komara Gurcistanê dikim ku ji bo kêmetewan ev maf daye.

Ez pir kêfxweş im ku îro li paytexta Gurcistanê bi amadekariya Komeleya Kurdên Gurcistanê Ronahî û Enstîtuya Kurdî ya Qefqasyayê ev civîna dîrokî hatiye saz kirin. Ez spasiya Zaza Kalaşov, Hejarê Şamil û yên mayîn dikim ku ked ji bo organîzasyonê dane.

Îro rojeke dîrokî ye; em hemû kurdên dinyayê, hemû nas, qewim, pismam li vir berhev bûne, konferansa xwe derbas dikin, derd û kulên xwe ji hev ra dibêjin, ji bo pirsgrêkên xwe li çareseriyê digerin.

Ez jî wek kurdêkî Qefqasyayê li Ermenistanê hatimê dinyayê, dibistan li Ermenistanê red kiriye, zaningeh li Azerbaycanê qedandiye. Salên 1987-1988 ji bo gelê me demên reş û ne bi xêr bûn. Ji ber Şerê Qerebaxê, em neçar man ku axa bav û kalên xwe biterikînin û piraniya ji gelê me koçî Qazaxistan, Qirgizistan û Rûsyayê kirin. Ev sirgûnkirina sêyemîn a kurdên ji

¹¹ Mîrzoyêv Rafîk Yakub oglu / Rafîkê Yaqûb (10.04.1970, navçeya Masîs, Ermenistan) Serokê Weqfa Meclîsa Gel a Qazaxistanê (ji sala 2024an vir ve), Serokê Lijneya Komeleya Berbang a Kurdên Qazaxistanê (ji sala 2023an vir ve)

Qeqqasyayê ber bi Qazaxistan û Asyaya Navîn bû. Êdî ji 80ê salî pirtir e ku kurd li Qazaxistanê dijîn. Cara ewil di dawîya sala 1937an da bi hezaran kurdên Azerbaycanê û Ermenistanê sirgûnî Qazaxistanê kiribûn. Cara duyem di sala 1944an da dîsa bi hezaran kurd ji Komara Gurcistanê hatibûn sirgûn kirin.

Gelê qazax em bi dilgermî qebûl kirin. Ciyê xwe dane me, av û nanê xwe tevî me parve kirin. Çawa kal û bavê me ji me ra digotin, qazaxan li wan rojên giran xwedî miletê me derketin. Em gelekî ji gele qazax razî ne û spasiya wan dikin. Bi saya siyaseta tehemûlkar a dewleta Qazaxistanê, me ziman, çand û hunera xwe parastîye.

Li Qazaxistanê çend komele, kovar, rojname, online televîzyonê me, komên reqşê (folklorê) hene. Zimanê kurdî li herêmên ku kurd lê dijîn dikare wekî dersek bijarte were hînkirin. Kurdên me, mîna neteweyên din, dikarin di meqamên dewletê de cih bigirin.

Îro ji Qazaxistanê gelek rewşenbîr û ronakbîrê kurd hene. Em dikarin bêjin ku roja îroyîn Qazaxistan bûye merkeza çand û hunera kurdên Qeqqasyayê.

Lê mixabin li Qazaxistanê hêdî hêdî asîmîlasyon pêş dikeve. Hejmara mamosteyên zimanê kurdî kêm in, têrê nake. Divê ev pirsgirêk zû were çareserkirin.

Bi saya rûsipî û mezinên me dîsa jî kevneşopiyên me nehatine jibîrkin. Di despêka salên 1920an da rewşenbîrên me yên Sovyeta berê mîrateyek mezin pey xwe hiştin. Divê keda wan, ev mîrata giranbiha neyê jibîrkin. Çirûska ku 100 sal berî van çaxan vêketiye, gerek tu cara neyê temirandin. Civîn û konferansên bi vî rengî divê li hemû dewletên Sovyetê yên berê werin lidarxistin. Pêşgirtina li hem ber asîmîlasyon û helandinê erkek neteweyî ye.

Em miletêkî kole û bindest in. Her roj xwîna miletê me dirije. Mixabin, gorên 3 bavên me li erdekî nîne. Bav û kal û pismamên min li Bakurê Kurdistanê, Rohilatê Kurdistanê, Ermenistanê, Rûsyayê û Qazaxistanê hatine binax kirin. Em pir hatine zêrandinê. Divê em ji vê rewşê encam derxînin. Bêtifaqiya me bûye bela, ketiye nava gelê me. Mirovên me hevdu qebûl nakin. Gelek ji wan dixwazin bibin serok û rêber. Gotineke beriya heye: «Ez axa, tu axa lê kî golika bibe ber baxa?» Lewma jî divê em hemû

mecalên ku welatên em lê dijîn dide me, bi kar bînin û bi hev ra xebatên baş bimeşînin.

Îro li Qazaxistanê nêzikî 130 mîlet di nav aştî û aramiyê da dijîn. Di hemû qanûnên Qazaxistanê da mafê kêmetewan hatiye kifşkirin. Di 1ê adara 1995an da bi biryara Serokê Qazaxistanê yê pêşin Nursultan Nazarbayêv ji bo parastina mafên hemû mîletan Meclîsa Gel a Qazaxistanê hatiye avakirin. Ez serbilind im ku wek ewladê gelê kurd Serokatiya Weqfa Meclîsa Gel a Qazaxistanê dikim.

Di adara 1993an li Qazaxistanê Komeleya Kurdên Qazaxistanê “Yekbûn”, paşê jî “Berbang” hatiye avakirin. Serokê yekem û niha yê komeleyê Ezîzê Zîyo ye. Beriya Ezîzê Zîyo jî Bedirê Mûsa, Nadirê Kerem û Kinyazê Îbrahîm serokatiya komeleyê kirin.

Wisa jî komên folklorê, rojname û malpera “Jiyana Kurd”, internet, televîzyona ya komelê xebata xwe berdewam dikin. Her wiha, li Qazaxistanê bi hazirkirina profesor Kinyazê Îbrahîm pirtûkên zimanê kurdî hatin çapkirin. Zarokên me bi rêya van pirtûkan zimanê xwe yê dayikê fêr dibin.

Di sala 1989an de li Qazaxistanê 25 hezar kurd dijiyan, lê îro 50 hezar kurd li Qazaxistanê hene. Ango nifûsa kurdan di 35 salên dawî de sedî sed zêde bûye. Mîletê me bi saya zanyar, xebatkarên dewletê, endamên parlemetoyê, werzîşvan û yên mayîn hate nas kirin. Mirovên wek Nadirê Kerem, Kinyazê Îbrahîm, Gulhiseyînê Hesên, Wekîlê Hiseyîn û gelekên din serê gelê kurd li Komara Qazaxistanê bilind kirin.

Her wiha ciwanên me di warê karsazî û pîşeyî de jî pêşketinên mezin bi dest dixin. Zanyarê me yê ciwan Murad Şamîlov wekî endamê Konseya Zanyarên Ciwan hatiye qebûlkirin, ku bi beşdariya Serokkomarê Qazaxistanê Qasim-Comert Toqayêv hatiye damezrandin. Ew ji bo me serbilindiyeke mezin e.

Bi rastî, hikûmeta Qazaxistanê guh dide daxwazên gelê me û hetanî roja îro jî gelê qazax me ji xwe cuda nake, me bi tenê nahêle, qedir û hurmetê nîşanî mîletê me dide. Dostaniya gelê kurd û qazax sal bi sal xurt dibe. Navdarên netewa qazax yên wekî Cambil Cabayêv, Dinmuhammed Qonayêv, Oljas Suleymanov û yên mayîn bi salan e ku bi gelê me re dostaniyê dikin.

Di dawiya axaftina xwe de, ez dixwazim çend pêşniyaran bikim.

Em kurdên Yekîtiya Sovyeta berê bi salan di bin şert û mercên herî dijwar de jî karîbûn zimanê xwe biparêz in. Lê mixabin, piştî hilweşîna Yekîtiya Sovyetê, xetera asîmîlasyonê di nav me kurdan de belav bûye. Îro ji bo pêşxistina zimanê xwe û parastina çanda xwe em dikarin çi bikin? Ji ber ku kurd li ser devereke fireh a Yekîtiya Sovyetê ya berê belav bûne, pêşxistina kursên serhêl di astên cûrbecûr de dikare pir sûdmend be¹². Ger bi awayekî sistematîk werin danîn, ev kursên online dikarin wekî dibistanekê jî xizmet bikin.

Çalakiyên teşwîqkirina zimanê kurdî girîng in. Ciwanên ku xwedî baştirîn dîksiyon (rastaxaftin) û nivîsandina kurdî ne, dikarin ji aliyê rêxistinên me ve werin xelatkirin.

Di her cejna Newrozê de, em dikarin bi awayekî sembolîk xelat bidin wan kesên ku di tevahiya salê de herî zêde pirtûkên kurdî xwendine.

Rêxistinên kurdî li Qazaxistanê dikarin van projeyan bi rê ve bibin.

Di dawiyê de, ez dixwazim pêşniyar bikim ku bila Konferansa Kurdên Qefqasyayê sala bê li Qazaxistanê were lidarxistin. Me hemû mecal û derfet hene ku em konferansê organîze bikin.

Spas ji bo guhdariya we.

¹² Zêdetirî 3 salan e ku di bin înnîsyatîfa Enstîtuya Kurdî ya Qefqasyayê de cûrbecûr qursên fêrbûna zimanê kurdî yên serhêl hene. Wekî ku di vê axaftinê de hatiye gotin, girîng e ku ev xebat berfirehtir û bêtir sistematîk bibe û hemû rêxistinên kurd ên li Yekîtiya Sovyetê ya berê beşdarî vê xebatê bibin. - *amadekar*.

BERNAMEYÊN HÎNKIRINA ZIMANÊ KURDÎ Û PERWERDEHÎ LI QEFQASYAYÊ



Resul Geyik
Akademîsyen¹³

Giringiya Qefqasyayê

Qefqasya bi xwe şahidê geşedan û pêşveçûna kurdan e. Bandora sîstema Sovyetê li ser hemû gelên Qefqasyayê bûye û gelek netewên Qefqasyayê ji aliyê gelek tiştan wekî xwarin, çand, ziman, alfabe, cûl û berg û têkiliyên netewî bi hev re ketine nav pêywendiyêke zindî. Weki di serdema Qefqasyayê de em dibinin, di nav kurdan de kar û barên wêjeyî û akademîk gelek pêş ketin. Wêje, helbest, şano, tez, rexnegirî, çapkirina xebatan, karen medyayê jî gelek pêş ketin.

Sala 1921ê de, perwerdehiya kurdî ji aliyê Ahmedê Mirazî û Lazo ve destpê kir. Qanatê Kurdo, Tital Mûradov, Semend Sîyabendov ew bi xwe jî hinek ji wan kesan in ku li wir perwerde dibin. (Reşîd, 2012: 203).

¹³ Resul Geyik (1976, li Amedê, Bakurê Kurdistanê). Akademîsyen û nivîskar. Di lîsansê de îngilîzî, di master û doktorayê de bi kurdî xwendiyê. Di masterê de "Hînkirina Zimên" di doktorayê de têkiliya kovara Hawarê û guherîna zimên xebitiye. Li Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê di Enstîtuya Zimanên Zindî de wekî hîndekar dixebite.

a) Xebat û Hewldanên li Qefqasyayê Divê Çawa bê Plansazîkirin?

Xebat û hewldanên perwerdehiyê li Qefqasyayê divê li gori cudahiya zimên û mîrasiya çandî bê organîzekirin. Ev xebat divê di nav xwe de parastin û vejîna zimanan, perwerdehiya pîrzîmanî û avakirina çavkaniyên hînkirina zimên ji bihewîne. Mirov dikarin xebatan bi her dû zimanan bi hev re yan ji hev cihê çap bike.

Mirov dikare xalên jêr bifikire û binirxîne:

1. Beşdarkirina civakê: Divê civakên herêmî di vê pêvajoyê de neyên îhmalkirin û pêvajoyê li gorî pêwîstiyên wan were çêkirin. Dema ev tevî vê pêvajoyê bibin, wê deme bi rehetî ew ê xwe îfade bikin û daxwazên wan dê di nav hevsengiyekê de be. Helbet di serî de hinek daxwaz û xwestek dikarin ne ji rêzê bin lê bi nîqaşan mirov dikare rêyeke hevpar bibîne. Di vejîna zimanan de, di pêvajoya nû de girîng e ku civakên herêmî neyên îhmalkirin û bername li gorî pêwîstiyên wan bêne çêkirin (McCarty, T. L., & Lee, T. S. (2014: 102).

2. Bernameyên Perwerdehiyê: Di vê pêvajoyê de bikaranîn û teşwîqkirina bernameyên perwerdehiyê ku ew ê bibin bingeha siberoja zimên û şekildayîna civakê gelek girîng e. Mirov dikare xebatên du zimanî çap bike. Li di perwerdehiya ewil (pêşdibistan û dibistana seretayî) de bikaranîna zimanê zarokan gelek kêrhatî ye. Fishman (2001: 12-37) bi taybetî di pirtûka xwe de li ser perwerdehiya pêşdibistanî disekine û dibêje derfetên zarokan ji bo geşedana şiyarên zimanî û çandî bandorê li ser siberoja civakê dike.

3. Entegrasyona civakî: Dema mirov kar û xebatên zimên bi çalakîyên çandî re bi kar bîne, ew ê pêwendîya zimên û çandê xurttir bibe û bi saya vê, dê zarok xwe bi ziman û çanda xwe re girê bidin. Û ew ê bi awayekî watedartir vê rewşê binirxînin. Dema ku karê zimên bi pratîkên çandî re hevaheng be, girêdana di navbera ziman û çandê de qewîtir dibe û îmkana famkirinê dide ku zarok qîmetê ziman û çanda xwe bizanibin û wan wekî parçeyên nasnameya xwe bibînin (Skutnabb-Kangas, T. 2000).

4. Piştgirîya dewletê/an: Her dewlet bi zagonên cûda welatên xwe birêve dibin. Hinek tişt wek takekesî ne û hinek tişt jî hevpar in. Bandora dewletan ji du alîya bandorker in; parastina zagonî û piştgiriya pereyan (fon). Dema zagon ji bo hebûn û parastinê derkeve, dê herkes bi awayekî xwezayî zimanê xwe bi kar bîne û pêş bixe. Xala duyem jî ji bo

perwerdekar, mamoste, fêrxaz û xwendekaran çavkanî û amûrên teknolojiyê lazim in. Dema dewlet ji bo rewşa aborî piştgiriya pereyan bike dê perwerdehi hêsantir bibe û endîşeyên aborî li ber xwendekaran nebe astengî. Dewlet dikarin li dibistanên fermî û zaningehan de perwerdehiya kurdî bide. Jo bo vê jî li her welatî xebatên cûda pêwîst in.

6. Bikaranîna teknoloji û medyayê: Di pêvajoya plansazîkirina perwerdehiyê de, bikaranîna teknoloji û medyayê jî rehetîyeke mezin dide mirovên eleqedar. Êdî gelek kes sepanên telefonên mobîl, kursên online, û çavkaniyên dijîtal bi kar tîne. "Çavkaniyên fêrbûna mobîl û sepanan (applîkasyon) pêvajoya fêrbûnê zêde dike, nemaze di perwerdehiya zimên de xwendekaran motive dike û piştgirî dide tevlebûna wan bi zimanê ku hîn dibin (Damyanov, I., & Tsankov, N. (2018: 133 - 140). Bikaranîna teknolojiyê gihîştina çavkaniyên zimên û perwerdehiyê hêsantir dike.

7. Lêkolîn û dokumentasyon: Dema hinek ziman di perwerdehiyê de neyê bikaranîn, di demen cûda de ew qels dibin û dawiyê jî wenda dibin. Ku wenda jî nebin têdikevin bin bandora zimanên din. Loma ji bo rewşên wiha divê lêkolîn bêne çêkirin û daneyên berdest bêne qeydkirin. Dema bi vî şeklî dane bêne berhevkirin, ev xebatên navbor, wê ronahî bide xebatên paşerojê jî.

b) Hînkirina çar şiyanan û pirsgirêka hînkirinê

Hînkirina çar şiyanan (*xwendin, nivîsîn, guhdarîkirin û axaftin*) ji bo kurdî mijareke girîng e û mina zimanên din di perwerdehiyê de li gorî krîterên hînkirina zimên bêne bikaranîn. Bikaranîna şiyanan perwerdehiyê hêsantir dike. Ji ber vê, mamoste bi vî şeklî ger şiyanan bi kar bîne wê gelek kêrhatî be. Her şiyaneke xwediyê roleke cûda ye û girîng e. Ev giş bi hev re astengîyan ji hîle radikin û pêvajoya hînbûna zimên lezgîntir dikin.

Di pêvajoya perwerdehiyê de, bikaranîna çar şiyanan herdem karê xwendekaran gelek hêsantir dike. Xwendekar û fêrxwaz bi awayên cûda hîn dibin ev jî bi xwe re mecburiyeta daxilkirina rê û rêbazên hînbûna mirovan bi xwe re tine. Hînbûna zimên an jî wergirtina zimên wekî zimanê ewil (yekê) û duyem tê binavkirin. Peyva zimanê ewil, bi gelemperî ji bona kesên ku zimanê dayika xwe hîn dibin tê bikaranîn. Zimanê dayikê, wekî li jor jî hat behskirin, bi hînbûna "*guhdarîkirin, axaftin, xwendin û nivîs'ê*" ye. Zimanê ewil piştî ji dayikbûnê dest pê dike, dibe ku mirov du sê zimanan bi hev re jî bibihîse û hîn bibe, wekî mînakên bajarê Mêrdînê ku li wir erebî,

kurdî, suryanî û tirkî tê axaftin (ku ew mînakek balkêş ya pîrzimaniyê ye) an jî li hinek navçe û bajarên din mirov dikare rastî du ziman an jî du zaraveyan bê bo mînak navçeya Licê û Sîweregê du zarava bi kar tînin. Ji ber ku însanên van bajaran van zimanan bi hev re dibihîsin û hîn dibin mirov dikare ji wan zimanan re bibêje kesên wekî axivêrên zimanê ewil. Ev jî tê wateya ku ew di jiyana xwe ya rojane de dikarin bi hev re biaxivin, heneka bikin, bikenin, agahiyan di nav xwe de parve bikin, şer bikin û hwd. bi kurtasî, mirov dikare îddîa bike ku ew di jiyana rojane de dikarin hemû kar û barê xwe pêk bînin. Hînbûn bi gelemperî ji derdorê ye. Mirov zimanan bi guhdarîkirin û axaftinê hîn dibin. Mirov dikare bigihîje encama ku *zimanê dayikê* tenê zimanek e, lê *zimanê ewil* dikare li gorî rewş û derfetan du yan jî sê ziman bin.

Çewtiyên zimên di her astên zimên de pêkan û normal in. Heta îmtîstasyona peyvên û axaftin dibe sedema bilêzkirina hînkirina zimên. Ev bikaranîn heya dibe elimandin (habit) didome. Bowen (1985) dibêje doktrîneke strukturalîstan (structuralist) girêdayî vê mijarê ev e: ziman komeka elimandinê ye. Heya ku ev jî bibe kom, gelek çaran divê hînbûn dubare bibe. Ev elimandin bi teqlîdê ye, zarok herdem mezinan teqlîd dikin. Teqlîda zarokan ya deng û motîfên ku ji dora xwe dibihîsin, dikin ku piştgiriyeke erênî ji bona domandina wan bibe, dubarekirina wan deng û motîfan heya bibe “elimandinek” di rastiya zimên de ev rewş berdeyam e. Stern (1983) jî bi awayekî neyînî (nerênî) vê mijarê şîrove dike û dibêje: “Dibistanên zanîngehên me yên pîşesaziyan di derheqê zimên de gelek tiştên hindik nîşanî me didin, û tiştên ku bi hindikayî jî didin bi gelemperî çewt in.

1. Xwendin: Xwendin di pêvajoya hînbûna zimên de wekî bingeha hînkirinê tê dîtin. Divê çalakîyên xwendinê bi tekstên hêsan dest pê bikin û ber bi yên kompleks û dijwar ve herin. Bi vî şeklî dê xwendekar bikaribin asta xwe bilindtir bikin. Mirov dikare bigije gelek materyalên nivîskî yên kurmancî ji mijarên cûr bi cûr lê ev material ne ji bo hînkirinê hatine hazirkirin loma ev bi xwe mesele ye. Loma dirêjbûna hevokan, peyvên hatine bikaranîn, tema û naveroka tekstan girîng e ku mirov bikaribe wan tekstan wekî materyalên dersê adapte bike û biemilîne. Xeleke girîng ji bo hîlbijartina dersan jî hîlbijartina tekstên ji mijarên cihê ne ku bi saya vê xwendekar bi taybetî jî zarok hejmara peyvên xwe zêde bikin. Armanca xwendinê famkirin e¹⁴.

¹⁴ <https://eprints.lancs.ac.uk/id/eprint/50134/1/ESRCcomprehensionbooklet.pdf>

2. Nivîsîn: Şiyana nivîsînê ji bo ragihandin, îfade û têrbûna zimên gelek girîng e. Herwiha, ji bo ku mirov bikaribe bi awayekî serkeftî binivîse pêwistiya hînkirina fermi û derfetên pratîka nivîsê lazim e. Ji bo çareserkirina nivîsa serkeftî fêrxwaz an jî xwendekar divê bi rêkûpêk binivîsin. Gelek cûreyên nivîsê hene û giş jî dikarin bêne bikaranîn. Sedema ku em hînkirina nivîsê di dersê de bi kar tînin piştgirî, pêşveçûna zimên, hînbûna agahiyên zimanê armanc û hînkirina nivîsînê ne (Geyik, 2020: 147)

3. Guhdarîkirin: Geşedana şiyana guhdarîkirinê girêdayî marûzmayîna axaftina kurdî ya birêkûpêk e. Mirov dikare diyalogan, vîdeoyan û çavkaniyên hînkirinê her daîm guhdarî bike. Lê materyalên heyî tevlihev in. Mirov dikare ji înternete gelek vîdeoyan guhdarî bike, guhdarîkirina domdar gelek bibandor e. Fêrxwaz dikarin xebatên wekî podkest, vîdeo û bernameyên zindî guhdar bikin. Richards (2008: 3) şiyana guhdarîkirinê di serî de wekî amûrek ji bo hêskirina têgihîştina axaftinê dibîne.

4. Axaftin: Axaftin belkî cureya herî çalak û bilez a bikaranîna ziman e, loma ji bo axaftinê pêbawerî û herikbarî hewce ye. Yek ji kêşeyên sereke yê hînbûna zimanê kurdî, ji ber bandora zimanên din yê serdest ne axaftina giştî ye, bi taybetî li hin herêman. Ji bo çareserkirina vê yekê, divê fêrxwaz bi axaftvanên xwemalî re pratîka axaftinê ya birêkûpêk bikin an jî di her qadên civakê de li her dere bi însanan re biaxivin. Bygate (2001:15) şiyana axaftinê ji bo geşedana ragihandinê li gorî fonksiyonên zimên û nêzikitiya navenda fêrxwazan dinirxîne.

Pirsgirêka bingeîn a fêrbûna çar şiyanan zimanê kurdî, kêmbûna çavkanî û derfetên pratîkê ye. Loma divê her çar şiyan di plansaziyek fêrbûna berfireh de bê teşwîqkirin û bikaranîn. Divê fêrxwaz xwe bigihînin materyalên fêrbûnê û hawîrdorên cihêreng ên ku têgihîştina xwendinê, şiyana guhdarîkirinê, pratîka nivîsandinê û herikbariya axaftinê xurt dike. Dema xwendekar her daîm van şiyanan bibînin û marûzî wan bimînin, ew ê van pirsgirêkan çareser bikin û asta bilind bi dest bixin.

c) Hînkirina peyv û rêzimanê

Hînkirina peyv û rêzimanê di nav konteksê de divê bi awayekî pêk bê ku hînkirina zimên bi bûyerên jiyanê û ragihandina watedar re bê pêwendîkirin. Dema ev hevok nê biwate bin, gelek tişt wenda dibin. Peyv û rêziman divê di bi hev re ne bi awayekî îzolekirî bêne fêrkirin. Ev tê wateya danasîna peyvên nû û qeîdeyên rêzimanî bi navgîniya tekst, diyalog û

senaryoyên perwerdehiyê yê ku xwendekar di jiyana rastîn de rastî wan tê. Mînak, hînkirina peyvsaziya danûstendinê, li balafirgehê yan jî li restorantê bi kar bîne. Adaptasyona konteksî bi kêşeyên aborî û binesaziyê re derdikevin ku ew jî bi gelemperî zirarê didin zimanên netewên kêmaran. Qest ew e ku li Qefqasyayê pêvajoya hînkirinê dikare rastî kêşeyên perwerdehiyê bimînin û adaptasyon ne baş be (Goyi, 2023: 17). Li welatên Rojavayê, bi salane perwerdehî bi awayekî sistematîk û metodolojîk pêk tê. Ji ber vê, di hînkirinê de rê û rêbazên gelek serkeftî bi dest xistine. Yek ji van jî hînkirina rêziman û peyvên di nav konteksê de ye. Di vê xebatê de tiştekî ku em dixwazin pêşkêş bikin, hînkirina peyv û rêzimanê ya di nav konteksê de ye ji ber ku hînkirin digihîje asteke bi kêr û biwate ye. Sedema biwatebûnê, xwendekar dibe xwediyê derfeteke dîtina bikaranîna peyv û rêzimanê di nav konteksên mîna diyalog an jî tekstên xwendinê. Asta motîvasyonê xwendekaran çêtir û zêdetir e. Bala xwendekaran bi awayekî hêsanî li ser dersan çiyê xwe digire. Hînkirin û hînbûna peyvên di nav konteksê de kûrfehmîkirinê zêdetir dike û mirov bi rehetî dikarin di navbera têgehan de pêwendiyê/an çêkin. Loma di rêbaz, stratejî û çalakîyên zimên de mamoste herdem dixwazin fêrxwaz bikaribin bi têkiliyên nû û bi awayekî wateya naveroka dersên xwe hîn bibin. Hînbûna peyvên di nav konteksê de, li gorî pêwîstiyên amadekirî wekî peyvên îzolekirî hêsanî e, çima ku konteksên biwate geşedana biwatebûnê xurttir dikin û dibin sebaba pêvajoya kognîtîfa¹⁵ kurtir ku ew jî bi awayekî xwezayî di hiş (bîr) de kapasîteya depokirina wan zêde dike.

1.Yekkirina Şiyanan: Divê hînkirina zimên çar şîyanên zimên (xwendin, nivîsandin, guhdarîkirin û axaftin) xebatên peyv û rêzimanê bihewîne. Mînak, xwendekar dikarin çîrokek (xwendin) ku tê de peyvên tematîk û rêzimanê hene bixwînin, çîrokê nîqaş bikin (axaftin) û dûr re kurteyek an bersîvek (nivîsandin) binivîsin. Haig (2004: 25) dibêje ku transîvîteya şîyanan di warê zimên de xwedî girîngiyeke mezin e lewma ew giş bi nêrîna holîstîk wêneyeke giştî ava dikin.

2.Pratîka Watedar: Divê derfeta pratîka peyv û rêzimanê ji bo fêrxwazan bi awayekî watedar pêk bê. Ji bo vê gelek çalakîyên zimên hene. Loma bikaranîna xebatên watedar alîkariya têgihiştina şîyanan dike. Pratîka watedar famkirin û şîyana bikaranîna zimên pêş dixe.

¹⁵ kognîtîv - hişî, îdrakî, aqilî - amadekar

d) Bikaranîna Hêmanên Çandî

Dema peyva “çandê” tê bihîstin, di hizira herkesî de pênasayek cuda û berfireh derdikeve holê ji ber ku çand di xwezayîbûna xwe de bi rastî xwediyê gelek pênasayên cuda ye. Çand weke peyvê gelek pênasayên cuda di nav xwe de dihevwîne. Wekî Kroeber û Kluckhohn diyar dikin nêzî 200 heb pênasayên çandê hene¹⁶. Gelek nivîskar û zanist li ser çandê xebitîne. Ji bilî kompleks û tevliheviya vê têgehê bi gelek zanistên din re jî heye. Ev qadên xebatê bi kurtasî ev in: ziman, dîn, diroka şaristaniyê, zanistên cûda, ragihandin û hwd. Ev jî xwe di çandên cihê de bi awayekî têne îfadekirin. Bo mînak dema kesek têgeha “çanda Rojava” yan jî “çanda Rojhilat” bi kar tine wê demê her têgeh di nav xwe de tiştên cihê temsîl dike. Bo mînak “çanda Rojava” pêşveçûna sanayî û perwerdehiyê û “çanda rojhilat” jî çanda jiyana kevneperest temsîl dike.

Dema xwendekar an jî fêrxwazek di nav xwesteka pêşvebirina asta zanebûna xwe de be pêwîst e hin tiştên wekî huner, dîrok, wêje û hwd. hîn bibe ji bo ku di armanca xwe de biçe serî. Kesên bi vî şeklî wekî yên zana, pîspor, rewşenbîr û wek şexsên xwediyê çandê têne binavkirin. Mirov bi saya vê girêdanê bi rehetî pêşveçûna zimên û çandê dibîne.

Ruth Benedict (1949) dibêje ku, rola çandê di girêdana mirovan de xuyaye û çand di nav gel de wekî hemû şeklê rê û tevgerên însanan ên ku tê pesendkirin xwe dide xuyakirin. Bi kurtasî mirov dibîne ku çand gelek têgehên cihê di nav xwe de dihevwîne û hêmanên çandî dibe mijara gelek dîsîplînên cihê.

Her netew di ziman û çandê de xwediyê taybetmendiyan takekes û cûda ne. Ev jî bandoreke taybet û şexsî dihêle ji ber ku mirov bi çandê re gelek taybetmendiyan hevpar dibînin di hebûna xwe de. Loma dema mamosta yan jî hindekar hêmanên çandî di perwerdehiyê de adapte bikin, dê xwendekar û fêrxwaz ji dersê gelek sûd werbigirin û bi kêfxweşî beşdarî pêvajoya dersan bibin. Ji ber vê jî ji bo xwendekaran hebûna çandê pêvajoya hînbûna zimên watedartir û têkildarti dike. Bi giştî Tavadze (2019: 170-173) fikirên xwe wiha xulase dike: Taybetmendiyan çandî wekî ziman û dîn di şekildayîna pratîkên perwerdehiyê de bi taybetî li diyaspora kurdên Qefqasyayê de roleke giranbiha dilîze.

¹⁶ <http://www2.warwick.ac.uk/fac/soc/al/globalpad/interculturalskills/>

1. Bikaranîna Naveroka Çandî

• **Bikaranîna Materyalên Otantîk:** Materyalên çandî yên otantîk ên wekî rojname, fîlm, muzîk, wêje û şovên TVyê yên ji çanda xwendekaran divê bê tercihkirin. Ev yek wan dide ber zimanê ku ew bi xwezayî tê bi kar tînin û ji wan re dibe alîkar ku ji jiyana xwe ya çandî û şexsî tiştên rast bibînin. Dema ku tiştên rast derkevin holê, pêvajoyên fêrbûnê watedartir dibin.

Nimûne: Fîlmeke populer ji çanda kurdî wekî *Mem û Zînê* bi kar bînin da ku mamoste bikaribe gelek biwêj, gotinên pêşyan û zargotinê hîn bike.

• **Hînkirina Kevneşop û Adetên Çandî:** Dersên li ser kevneşopî, cejn û adetên çandî têxin nav bernameya xwe û wan ji bo dersên peyv û rêzimanê bi kar bînin.

Mînak: Di derseke li ser peyvsaziya xwarinê de, li ser xwarinên kevneşopî yên ji çandê fêr bikin û ger derfet hebe, ji xwendekaran re bê ka ew çawa têne amadekirin nîşan bidin.

2. Xwendekarên xwe Tevlî Çalakiyên Çandî bikin

Rol-play û Sîmulasyon: Li ser bingeha rewşên çandî listikên rolan an jî sîmulasyonan organîze bikin wekî sîparîşdayîna xwarinê li xwaringehê, beşdarbûna festîvalekê yan axaftinek li bazarê, balafirgehê, dibistanê, nexweşxaneyê amade bikin. Çalakiyên wiha ne tenê ziman lê her weha tevgerên çandî yên guncav jî hîn dike. Projeyan destnîşan bikin ku xwendekar li ser mijarên çandî yên wekî cil û bergên kevneşopî, bûyerên dîrokî yan şexs û kesayetên navdar ên ji çanda wan ku li ser lêkolîn dikin û pêşkêş bikin.

Mînak: Şagirt di festîvaleke li ser kevneşopiyê hatibe li dar xistin pêşkêşiyekê bike, dîrok û girîngiya wê bi zimanê armanc vebêjin û peyvên tematîk bi kar bînin.

• **Nîqaşkirina Normên Çandî:** Mamoste dikarin xwendekarên xwe li ser normên civakî, edet û nîrxên di çanda navborî de perwerde bikin. Mamoste dikarin mijarên wekî zimanê laşî yan astên fermîbûna ragihandinê û mijarên ku minasîb dibînin têxin bernameyên xwe.

Nimûne: Di çand û pratîka kurdan de girîngiya fermîbûnê nîqaş bikin û di axaftinê de bikaranîna “tu” û “hûn” di kurmançî û zaraveyên din de çawa diguherin dikare bibe mînakeke balkêş. Di medreseyan kurdan de

tucar feqî yan xwendekaran nikarin ji melayê xwe de bi cînavka “tu”yê xîtap bikin. Dikare cînavka “hûn”ê yan jî peyvên wekî “cenabê” bi kar bîne. Herwiha li hinek deran tê dîtîn (herwiha min jî dîtiye) dema bi seyda yan bi mela re diaxivin wekî kesê sêyem ji seyda re “seydayê me çawa ye” pirsîne û dipirsin wekî ku ew kesê ku dipirsin ne li wir e û ji şexsekî din pirsra wî dikin.

Lêgerina Cudahiyên Çandî: Ji bo vekolîna ferq û cudahiyên di navbera çanda xwendekaran û çanda armanc de xebatên berawirdî bi kar bînin. Ev yek dikare hem di warê ziman û hem jî di warê çandî de têgihîştina wan kûrtir bike.

Nimûne: Jiyana û rewşa kurdên Gurcistanê dikare bi yê Qazaxistanê re bê berawirdkirin û tiştên wekî hev û yê ji hev cihê derkeve.

4. Bikaranina Wêje û Folklorê

Çîrokên gelêrî bixwînin: Mamoste dikarin wêje, çîrok û efsaneyên ji çanda xwe û yê din bi xwendekaran bidin nasîn. Di çîrokan de, bi gelemperî nixê çandî hene û ji bo fêrbûna zimên naveroka netewî peyda dikin.

Nimûne: Xwendekar dikarin çîrokeke gelêrî bixwînin û li ser ders û peyamên çîrokê nîqaş bikin, herwiha peyv û biwêjên têkildar dikare bê hînkirin.

Analîzkirina Stran û Helbestan: Mamoste dikarin ji bo hînkirina zimên stran, helbest û gotinên pêşîyan bi kar bînin. Xebatên navborî bi giştî naverokên çandî di hewîn û ji bo hînkirina hêmanên zimên jî dikare bibe terciheke xweş.

Nimûne: Pêkan e ku xwendekar hêmanên çandî wekî straneke gelêrî hes bikin û li ser mijar, gotin û girîngiya wê ya çandî nîqaş bikin.

Di hînkirina zimên de, hêmanên çandî, xwendekar ne tenê wî zimanî fêr dibin, lê di heman demê de nixê û têgihîştina kûr a wê çandê jî digirin. Ev rêbaza fêrbûna zimên balkêştir dike û ev ji xwendekaran re dibe alîkar ku di rewşên jiyana rastî de ziman bi bandortir bi kar bînin. Helbet emrê zarokan girîng e. Divê materyalên ku wê bê hîlbijartin li gorî famkirina zarokan be.

e) Asta Xwendekaran – Çêkirina Polen Homojen

Di pêvajoya hînkirina zimên de divê plansazî li gorî hinek krîteran be da ku perwerdehî bi ser bikeve. Xaleke girîng jî çêkirina polên homojen in. Dema pol ne bi vî şeklî be, wê deme, xwendekarên ku astên wan tevlihev in di perwerdehiyê de pîrsgirêk dijîn, xwendekarên pêşketî û yên destpêkê pîrsgirêkên cihê dijîn. Ji bo mamosteyan jî perwerdehî jî diwartir dibe. Di ser re, xwendekar di polen tevlihev de aciz dibin. Loma dema plansaziya perwerdehiyê bê kirin, divê asta xwendekaran teqez bê nîrxandin û ew li gorî asta xwe bêne belavkirin.

ê) Amadekirina materyalan ji bo xwendekarên Qefqasyayê

1. Hilbijartina Materyalên Minasib:

Divê materyalên bi zimanên herêmê yên wek kurdî, gurdî, ermenî û rûsî hebin. Divê ev materyal hewcedariyên zimên yên xwendekaran têr bikin û piştgirî bidin fêrbûna zimanên cûda. Li gorî Veselovskata (2020) hebûn û bikaranîna materyalên rast û minasib bi taybetî di çavkaniyên duzimanî de, gelek girîng e û derfetek dewlemend dide xwendekaran. Loma xwendekar ziman û paşxana çanda xwe bi hev girê didin.

Yekkirina Çar Şiyanên Sereke:

Divê materyalên perwerdehiyê çar şiyanên zimên bi hev re bi kar bîne: çar şiyan ev in: ***xwendin, nivîsandin, guhdarîkirin û axaftin***. Ev yek bikaranîna pratîkî ya zimên di nav çalakîyên perwerdehiyê de pêk tine û bi hev ve girê dide.

Têkiliya Çandî:

Mamoste dikarin materyalên derheqê hêmanên çandî yên ku adet, kevneşopî û nîrxên herêmî nîşan didin têxin nav bernameyên xwe. Ev rewşa fêrbûnê ji xwendekaran re têkildar û balkêştir bike. Herwiha naverok divê ji aliyê mamoste û hîndekaran bê dîtin û analîzkirin ku tu pîrsgirêk dernekeve. Dema xwendekar marûzî hêmanên çanda xwe dibin, zimanê malê di mifredatê de yekkirina wergirtina zimên dike (Terry û Irving, 2010).

2. Geşedana Zanîn û Konteksa Zimên:

Çarçoveyên Perwerdehî û Teorîk:

Divê çarçoveyên perwerdehî û teorîk ên ku bi zimên û paşxaneya çandî ya xwendekaran re li hev dikin bi kar bînin. Ev xal ji bo adaptasyona

ders û hêmanên çandî jêneger in. Loma çarçoveyên perwerdehî û teorîk di nav dem û pratîkê de, bo mînak mehê carekê, bêne nixandîn.

Fêrbûna Konteksî:

Materyal û rêbazên ku jiyan û tiştên herêmê nîşan didin bi kar bînin. Di nav çalakîyên fêrbûna zimên de mînakên bi vî awayî bala xwendekaran gelek dîkşînin. Mirov dikare çalakîyên gerê ku erdnîgariya herêmê, bûyerên heyî an pratîkên civakê vedihewîne biafirîne û bi kar bîne. Naverok li gorî emir, paşxana xwendekaran, zanebûn û pêwîstiyên wan bê amadekirin.

f) Plansazîkirina Xebat û Hewldanên li Qefqasyayê

Di plansaziya perwerdehiyê de, helbet xalên giştî û yên taybet hene divê ev neyên jibîrkin. Xalên giştî li her derê berdar in, lê yên taybet li gorî rewşên heyî adaptasyonê dixwazin. Li Qefqasyayê, divê di navbera saziyan de, ragihandineke gelek xurt hebe û jiyan bi hev re bimeşe. Sazî bi dibistanan re têkevin nav ragihandin û têkiliyê û hal û şertên xwe bi ser bixin. Bi saya xebatên bi vî rengî mirov dikare hevkarîyên fermi bi dest bixe. Ji bo pêvajoya perwerdehiya kurdî li Qefqasyayê, xaleke girîng û pêwîst *“Perwerdekirina Mamosteyan”* e. Herwiha pêvajoya perwerdehiyê jî divê plansaziya pêvajoya perwerdekirinê bi xwe re bîne. Mirov dikare akademîsyen, mamoste û kes an saziyên eleqedar jî têxe nav vê pêvajoyê. Ji ber ku li Qefqasyayê kurd li gelek welatên cihê dijîn, pêwîst e mirov paşxaneyê wan ji bîr neke û bikaribe rêyên afirîner bibîne.

Encam

Dema mirov ev faktorên jor ji bo Qefqasyayê binirxîne, xebat û hewldan divê bi awayekî hûrgilî û plankirî pêk were. Herwiha di nav welatên Qafaqasyayê de ziman û çanda kurdan ji bo nifşên nû jî divê bê parastin.

Encamên giştî wiha ne;

- Divê cûdahiya her welatê Qefqasyayê li gorî rewşa xwe bê nixandîn.
- Bernamêyên bêne bikaranîn bi gelek hûrgiliyan bê amadekirin.
- Ji sazî û dewletên Qefqasyayê piştgirî bê girtin.

- Ji bo berbelavkirina zimên, bandora teknoloji û mediyayê gelek e.
- Divê perwerdehiya zimên li gorî çar şîyanan be.
- Divê materyal li gorî krîterên perwerdehiyê be.
- Bi giştî hêmanên çandî were adaptekirin.
- Rê û rêbazên axaftinê hînbûnê hêsantir dike.
- Bi bicihanîna stratejiyên navborî, perwerdehiya peyv û rêzimanê di nav konteksê de, dikare rengê perwerdehiyê biguherîne.

Bi bicihanîn û bikaranîna stratejiyên jor û navborî, mamoste dikarin hînkirinek gelek serkeftî, efektîf, têkildar û encamgir bi dest bixin. Herwiha divê ev pêvajoyan li gorî krîterên xwendekarên her welatî û rewşa hikûmetên Qefqasyayê bê nîrxandin.

ÇAVKANÎ

- Benedict, R., (1949) *Patterns of Culture*. Boston: Weşanên Houghton Mifflin Company.
- Bowen, Cfr. D., (1985). *TESOL: Techniques and Procedures*, Massachusetts: Weşanxaneyê Newbury Houseê.
- Bygate M. Speaking. *The Cambridge Guide to Teaching English to Speakers of Other Languages* (Carter R, Nunan D, eds.). Beşa duyemîn, The Cambridge Guides. Cambridge University Press; 2001:14-20.
- Damyantov, I., & Tsankov, N. (2018). *Mobile apps in daily learning activities*. International Journal of Interactive Mobile Technologies (IJIM), 12(6). https://www.researchgate.net/profile/Ivo-Damyantov/publication/328590745_Mobile_Apps_in_Daily_Learning_Activities/links/5be06b67299bf1124fbdf58/Mobile-Apps-in-Daily-Learning-Activities.pdf
- Fishman, J. A. (2001). *Can Threatened Languages be Saved? Reversing Language Shift, Revisited: A 21st Century Perspective*. Multilingual Matters, 8(4), 12-37.
- Geyik, R. (2020) *Teoriya Hînkirina Kurdî-Kurmancî*, Weşanxaneyê Azadê, Mersin.
- Goyî, G. G. (2023) *The Role of The Environment and Heritage Language Instructions as an Input Factor in Literacy Development: The Case of Kurdish Bilingual Children in Finland*. Teza çapnebûyî.
- Haig, G. (2004) *Alignment in Kurdish: A Diachronic Perspective*, Teza çapnebûyî.

- Lado, R., (1964). *Language Teaching – A Scientific Approach*. New York: Weşanxaneyê McGraw-Hill.
- McCarty, T. L., & Lee, T. S. (2014). *Critical Culturally Sustaining/Revitalizing Pedagogy and Indigenous Education Sovereignty*. Harvard Educational Review, 84(1), 101-124.
- Reşîd, T. (2012) *Wêjeya Kurdî li Yekitiya Sovyetê*, (r. 202-212). Înatçî Bir Bahar Kürtçe ve Kürtçe Edebiyat Ed. Vecdi Erbay, Weşanên Ayrıntiyê, Stenbol
- Richards, Jack C. *Teaching speaking and listening: From theory to practice*
<https://www.professorjackrichards.com/articles/>
- Skutnabb-Kangas, T. (2000). *Linguistic Genocide in Education – Or Worldwide Diversity and Human Rights?* Weşanxaneyê Lawrence Erlbaum Associates.
- Stern, H.M., (1983) *Fundamental Concepts of Language Teaching*, Oxford: Weşanên Zanîngeha Oxfordê.
- Tavadze, G., (2019: 170-173) *Spreading of the Kurdish Language Dialects and Writing Systems Used in the Middle East*, Bulletin of The Georgian National Academy of Sciences vol:13 no:1
- Terry, N.P., & Irving, M.A. (2010) *Cultural and Linguistic Diversity: Issues in Education. Special Education for All Teachers*
- Veselovskaya, T.S. (2020) *Culture-Related Content in Russian Language Textbooks in the Field of Bilingual Education*, ARPHA Proceedings
<https://eprints.lancs.ac.uk/id/eprint/50134/1/ESRCcomprehensionbooklet.pdf>

BERBANGA KURDÊN QAZAXISTANÊ



Murad Şamilov

Cigirê Serokê Yekîtiya Kurdên Qazaxistanê «Berbang»

Gelî endamên konferanse, dost û hevalên hêja, xwişk û birayên ezîz!

Li ser navê Yekîtiya Kurdên Qazaxistanê «Berbang» û Serokê wê Ezîzê Zîyo Bedirxan ez hemû beşdarên vê konferansê bi dilgermî silav dikim.

Ez dixwazim spasiya xwe ji Komîteya Amadekar a konferansê û Komeleya Kurdên Gurcistanê "Ronahî" re ji bo organîzekirina konferansek ewqas asta bilind diyar bikim. Ez bi we pir şa me û serbilind im.

Beriya her tiştî divê bêjim ku konferansên wiha berfireh û navneteweyî ji bo kurdan mîna nan û avê lazim in. Cara yekê ye ku civîneke di vê derecê de li welatên Qefqasyayê tê lidarxistin.

Ez di wê baweriyê de me ku di nav hefteyekê de, bi sed hezaran kes li seranserê welêt û cîhanê dê ji konferansa me haydar bibin.

Wekî ku Rafîkê Yaqûb jî destnîşan kir, kurd di salên 1930an de sirgûnî Qazaxistanê bûne û îro ew yek ji mezintirîn civakên etnîkî û diyasporaya herî pêşeng li komarê ne.

Li Qazaxistanê, hevahengiya etnîkî, şert û mercên baş ji bo pêşxistina azadiya ziman û çandê, bûye sedem ku mirov xwe wekhev hîs bikin.

Kevneşopî û adetên kurdî bûne beşek ji çanda pirneteweyî ya Qazaxistanê. Îro, nîfşa pêncemîn a kurdan li Qazaxistanê mezin dibe.

Îro 11 şaxên Yekîtiya Kurdên Qazaxistanê hene. Li gor daneyên fermî, di komara me de nêzîkî 50 hezar kurd dijîn, lê li gorî daneyên ne fermî di vî welatî de ji 80 hezarî zêdetir kurd hene. Li Qazaxistanê mirovên me di her belgeyên de mîletê xwê dikare wek «kurd» binivîse.

Di nav sîstema Yekîtiya me de gelek komîteyên wekî qanûn, navbeynkarî, jin, çand, dîn, karsaz, perwerde û zanistê, her wiha weqfê û meclîsa rûspiyan û meclîsa dayikan hene. Zanist û çand di nav gel de pêş dikevin, bazirganî û çalakiyên civakî zêde dibin.

Kurd di pêşveçûna Qazaxistanê de beşdariyên girîng dikin. Niha li komarê 28 zanyar û akademisyenên me hene.

Her sal di pîrozbahîya Cejna Newrozê de bi hezaran kurd beşdar dibin. Komên muzîkên me li Qazaxistanê gelekî navdar in. Di zehf gundên ku kurd lê dijîn komên folklorê hatine avakirin. Endamên komeleyê me girîngiyeke mezin didin xebatên çapemeniyê jî. Sê weşanên me yên sereke hene: Rojnameya «Jiyana Kurd», Kovara «Nûbar» û online televîzyonê «Berbang TV».

Di her warî de derfeta kurdên Qazaxistanê heye ku potansiyela xwe pêş bixin.


Bê guman, her endamêkî civaka me ku ji bo parastina çand, dîrok, huner û zimanê me dixebite, ji bo gelê me çavkaniya serbilindiyê ye. Di vê çarçoveyê de, rola nivîskar, helbestvan û rojnamevanên me pir bilind e.

Di dawiyê de, li ser navê Yekîtiya Kurdên Qazaxistanê «Berbang»ê, ez dixwazim xelata herî bilind, madalyaya zêrîn, di hizûra we de pêşkeşî Hejarê Şamil Askerov bikim. Nivîskar û lêkolîner Hejarê Şamil yek ji amadekarên vê konferansê ye û bi salan e ku xizmetên giranbiha pêşkêşî doza kurdan dike û roleke girîng di hevgihandina kes û rêxistinên kurdên Qefqasyayê, Asya Navin, bi giştî Sovyeta berê û Kurdistanê de dilîze.

Her wiha em dixwazin madalyayên zêrîn bidin Bêlla Stûrkî, ku xwedî dengêkî zêrîn e û 40 sal in di bernameya kurdî ya radyoya Gurcistanê de dixebite û rojnamevan, nivîskar Miraz Cemal, ku emekdarê radyoya kurdî ya Êrîvanê û rojnameya «Riya Teze» ye.

Ji Konferansa Qefqasyayê re serkeftineke mezin dixwazim.

MÎRATEYA DÎROK Î ZARGOTINA KURDÊN QEFQASYAYA BAŞÛR



Nihat Gultekin

Lêkolînêr, nivîskar¹⁷

Ev dem û hemû demên we bixêr û xweşî be hevalên hêja! Hûn hemû bi xêr hatin xwişk û birayên ezîz! Ez gelek şad û bextewar im ku em îro li vir li cem hev in. Sipasî û silavên xwe yên dilîstanî ji bo amadekarên konferansê tînim ziman.

Dîrok bi xwe belgenome û dokuman e. Zargotina me jî îro ji me re bûye dîrok. Berî her tiştî dixwazim bibêjim ku dîrok û jiyana kurdên Qefqasyaya Başûr a civakî gelekî pirreng bûye. Ev rewş di nava zeman de bûye mijara kilam û zargotinên wan. Kilam û destanên herêma Qefqasyaya Başûr jî wek yên herema me Serhedê ne. Mijara wan bi piranî; bûyerên ji dîroka kurdan, serpêhatiyên mêrxasên gel, hêvî, derd û şahiyên civatê, taybetiyên netewî û nixrên kurdan e. Di nav dem û dewranan de ev yek hatine parastin û gihîştine nifşên nû.

Nivîskar û lêkolîner Mehmet Gültekin di nivîsa xwe da wiha behsa dîroka vê heremê dike: “Ev herêm di zeman û dîroka kurdî de wek erdê

¹⁷ Nihat Gultekin (1971, Gundê Girberan, Bazîd, Bakurê Kurdistanê). Li ser dirok, çend û hunera kurdî çedin pirtûkûn wî derketine. Endamê rêveberiya weqfa Îsmail Beşikçi ye.

dewleta Şeddadiyan, Arran, Deştê Êrîvanê, Laçin tê binavkirin. Piştî Ûrartûyan dewleta Medan li ser vê erdî jî hikmê xwe meşandiye. Dîrokzanê heyama kevnare Strabon, di nivîsên xwe de destnîşan dike ku niştecihên li bakur ên ku li derdorên çiyayên Araratê dijîn Kardû ne. Strabon salix dide ku wî piraniya agahiyên derbarê Medan de jî kilam û destanên epîk ên dengbêjên wê demê wergirtiye ku ev kevnêşopî di welatê Medan de gelek belavbûyî bûye, ji qesran heta gund û eşîrên koçer, hozanên gelekî bi navûdeng û xwedî repertûarên berfireh hebûn ku bûyerên dîrokî û evînî bi awayê destanên epîk distiran.”¹⁸

Li gel kurdên herêma Qefqasyaya Başûr wêjeya kurdî bi taybetî jî a zargotinê gelek dewlemend bû. Hunera dengbêjiyê bala gelek nivîskar û lêkolînerên rojavayî yên ku di heyamên berê de hatibûn vê herêmê kişandiye. Prof. Celîlê Celîl wisa behsa zargotina kurdan dike: «Kurdistan – welatê kurda welatekî çiyayî ye (...). Herêm-herêm li ser xaka Kurdistanê bigerî, dibînî çiya ber çiya vedibin, yek jî yê dinê bilindtir û bi taybetîtir e. Çiya bi geliyên kûr, çem û çemikên xurt ji hev birr dibin (...)

Merivên van ciya hînî xû-xeysetê vî erdî bûne. Sirûşt û meriv di navbera hezaran salan da bi hev hatine hûnandin. Ji ber vê jî ne kurd bê çiya dikarin bijîn û ne jî çiya bê kurd dikarin bijîn (...).

Kurdistan welatekî efsûnî ye. Li çar aliyê gund û zozanên kurdan bigerî, rastî efsûn û lêgênda¹⁹ dibî. Kurd bi efsûna dijîn, bi wan efsûn û lêgênda mezin dibin. Hemû bûyer, serboriyên kurda dibin lêgênd, stran, destan, dev bi dev digerin, bi per û bask dibin, difirin, dem û dewrana derbas dîkin.

Zargotina kurdan dengê jiyana sirûştê û meriyên wî erdî ne, ku bûne stran, bûne destan, roman, serboriyên pehlevan û cengeweran.”²⁰

Ji belavok û nivîsên ser zargotinên kurdî yên bi nîrx, ku di destpêka sedsala 19emîn de hatine weşandin, divê em ji wan çend lêkolînan, nivîskar û pirtûkên hêja destnîşan bikin. Mehmet Gültekin di heman nivîsa xwe da wiha bal dikişîne ser vê mijarê: “Hê di salên 1830an de F.Dubois De Montpèreuxê ku ji bo lêkolînan diçe Qefqasyaya Başûr, berhevdanekê

¹⁸ Kovara Nûbihar, Mehmet Gültekin. Hejmar 126, zivistan 2014

¹⁹ Lêgênda – efsane. Ji rûsî hatiye hildan - *amadekar*.

²⁰ Ordixanê Celîl, Celîlê Celîl, Zargotina Kurda 2, rûpel 9-10

li ser muzîk û kilamên gelên wê herême dike. Her wisa gelek ji wan kilamên ku nivîskar û lêkolînerên rojavayî wek Thêrêse Albertine L.Robinson (1840), Moritz Wagner (1844) û Bodensrredt (1844) di sedsala 19an de li van herêman berhev kirine û wergerandine ser zimanên Ewropî jî negihîştine dengbêjên nîfşên dema me. Dema Moritz Wagnerê alman di sala 1844an de li derdorên Araratê lêkolîn dike, wî bi alîkariya serokê dibistana herêma Êrîvanê Xaçatur Abovyan û rahîbê ermenî Gaspar Ter-Gewandjyan hin kilamên kurdî berhev kiriye, hinek ji wan wergerandiye almanî û di pirtûka xwe ya bi sernavê “Rêwîtiya min a li Îran û Welatê Kurdistan” de weşandiye. Rêwî û nivîskarên rojavayî wek W. F. A. Zimmermann, August Haxthausen, F.Martin Bodensstedt, C.W.Wutzer û çendên din jî di sedsala 19an de di derbarê dengbêj û kilamên kurdî de ramanên gelekî nêzikî yên Montpèreux û Wagner nivîsandine. Ew destnîşan dikin ku dengên hunermendên kurd perwerdekirî ne.”²¹

Zanyarê navdar Mela Mehmûdê Bazîdî beriya salên 1930î tekane lêkolînerê kurd e ku xebatên xwe li ser zargotinên kurdan kiriye. Berhevkariya zargotina kurdî ji nîveka sedsaliya 19emîn dest pê dike. Ew xebata giranbiha bi navê zanyarê kurdî Mela Mehmûdê Bazîdî û konsolosê Rûsyayê li Erzîrûmê Aleksandre Jaba va tê nasîn. Mele Mahmûdê Bazîdî ligel Aleksandre Jaba ji sala 1956an ve şûnde li ser berhevkirina detnîvîsên kurdî xebitîne û ji bo weşandina wan kar kirine. Li ser civandina çanda kurdî ya devkî û nivîskî kar dikin. Di wan karan da zêdetir li ser naskirina rabûn, rûniştin, edetên kurdan disekinin. Mela Mehmûdê Bazîdî tevî A.Jaba ferhenga kurdî-firansî amade dike ku ferhengeke berfireh ya îdêom û dialogên kurdî ye. Bi destê Mela Mehmûdê Bazîdî wisa jî stran û efsûnên kevn hatine nivîsîn lê xebat hîn çap nebûye.

Gelek kurdolog û mîsyonerên ji sedsala 19an diyar dikin ku xirîstîyanên li Kurdistanê û bi taybetî jî yên li wê heremê dijîn stranên xwe yên dînî bi zimanên xwe, lê yên evînî û dilînî jî bi kurdî distirên. Nivîskarê ermenî Arsen Yarman jî di pirtûka xwe ya bi navê «Palu-Harpût»²² de vê yekê piştrast dike. Celîlê Celîl jî wiha bal dikşîne li ser wê mijarê: “Di salên 60-70yî ya sedsala 19emîn de gava baldariya rewşenbîrên ermenîyan bi ser zargotina gelê ermeniya xurt bûye, berhevkar bê agahdarî di ber stran

²¹ Kovara Nûbihar, Mehmet Gültekin. Hejmar 126, zivistan 2014.

²² Arsen Yarman, Palû Harpût, Belge Yayınları.

û dastanên kurdî derbas nebûne. Li ser rûpelên kovarên ermeniyar berhemên zargotinê kurdî bi werger dihatin weşandin. Destana «Leyl û Mecerûm» Sahak Movsîsyan di sala 1896an di kovara «Nor Dar»ê de, «Serê Sîpanê» yan «Siyabend û Xecêzerê» Garêgîn Srvantsyants di sala 1884an di pirtûka «Hamov-hotov»ê de diweşîne. Baldariya Srvantsyants li ser zargotina kurda bê bingeş nebû. Ew merivekî ruhanî, mamostekî naskirî li Ermenistanê bû, ku dem û hereketa xwe diyarî lêkolîna rewş û rûyê ermeniya, ziman û zargotina wan kiribû. Ew bibû evîndarê lewza gelêrî, nikaribû bêagahdarî ji ser çanda kurdan derbas bibûya (...). Di bîranînên xwe da G.Srvantsyants bilind nixandiye pêşketin û pirrengiya ziman û hunera peyva gelêrî ya kurdan.”²³

Ji rewşenbîrên gelên cînaran ku zêde bala xwe dane ser çand û zargotina kurdan ermenî bi xwe bûne. Her wisa divê bê gotin ku ermeniyar ji berê de kilamên kurdî berhev kirine û gelek ji wan bi zimanê xwe stirane. Zanîna zimanê kurdî li ber hinekan rê vekirîye, wekî zargotina kurdan ji nêzik ve nas bikin. Di nivê pêşîn ê sedsala 19an de Xaçatûr Abovyan û nivê duyem de jî Komîtasê, ku wek bavê muzîka klasik a ermenî tên hesibandin, kilamên kurdî berhev kirine. Ronakbîrê ermeniyar bi navûdeng Xaçatûr Abovyan evîndarekî zargotina kurdan bûye.

Zanyarê alman Oskar Man du şaxên destanan «Dimdim»ê nivîsîne û bi wergera ser zimanê almanî weşandine. Di destpêka sedsala 20an de Sarkuni Haykuni ji stranbêjên ku bi kurdî kilam digotin, 28 destanên kurdî berhev kiriye û ew wekî pirtûk li Moskovayê çap kiriye. Notayên 13 destanên di vê pirtûkê de jî ji aliyê Komitas hatine amadekirin. Komîtas li Almanyayê li ser muzika kurdî xebata xwe ya doktorayê amade kiriye. Wî jî wek Abovyan kurdî baş dizanibû û li bal hin kurdan kilamên kurdî jî stiraye. Di rêwitiyekê de Komîtas li deşta Êrîvana Araratê rastî dengbêjekî kurd ê kal tê. Dibîne, ku dengbêj berê xwe daye çiyakî û distirê. “Kalê distira, newal û çiya jî pê ra distiran” dibêje Komîtas.

Piştî sala 1900î û şûnda jî gelek xebat hatine kirin. Mehmet Gültekin wîha bal dikşîne ser karên wan salan: “Bagrat Chalatianz di sala 1905an de 15 destanên epîk ên kurdî bi wergera wan ya almanî çap kiriye û tê de navê sê dengbêjên wê heyamê jî destnîşan dike. Chalatianz diyar dike ku

²³ Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl, Zargotina Kurda 2, rûpel 14-15.

wî destana «Siyabend û Xecê» di sala 1899an de ji zarê Keleşê Ewdal li gundê Kerwansaray a girêdayî Êrîvanê, ji dengbêj Mihoyê Êzdî «Mem û Zîn»ê û ji dengbêjê bi navê Sadiq jî destana «Leyl û Mecnûn»ê wergirtiye. Lê mixabin ew li ser van her sê dengbêjan zêde agahiyên nade. Dr. Oskar Blau di xebata xwe ya ji sala 1959an bi sernavê “Eşîrên li Bakurê Kurdistanê” de dinivîse ku, kurd xwediyê kevneşopiyêke dewlemend a kilam û destanên bi mijarên şer, evîn û yên mayîn in.”²⁴

Di heyamên berê de dibistanên dengbêjiyê hebûn ku ciwanên dengxweş diçûn cem dengbêjên bi navûdeng û ji wan hunera dengbêjiyê hin dibûn. Ew ciwanên ku li cem wan dengbêjan şagirtî dikirin û têdigihiştin, keda hosteyên xwe tu car jî bîr nedikirin, pir caran qala serpêhatî û qedirbilindiya wan dikirin. Di vê herêma de gelek dengbêjên berê yên navdar hebûn, hinek ên ku navê wan gihîştin me ev in; Edo Gevorgyan, Hesoyê Mamo, Tono Catoyan, Fetî Hesên, Xemêya Şemo û Xidoyê Qaso.

Heta salên 1930yî xêncî Mela Mehmûdî Bazîdî berhemên zargotina kurdên Qefqasyaya Başûr tenê ji aliyê ermenî û rojavayîyan hatine berhev kirin. Xebata berhev kirina nimûneyên zargotinê di nav kurdên Sovyetê de bi Emîne Ewdal û Heciyê Cindî dest pê kiriye û bi Ordixanê Celîl, Celîlê Celîl, Nûra Cewerî û Cemîla Celîl va pêşya çûye.

Dibistana kurdolojiyê ya Sovyetê di berhev kirin û lêkolîna kevneşopiyên kurdî de xebatên girîng kirine. Î.A. Orbêlî di navbera kevneşopîya beriya şoreşa Cotmehê û serdema nû de pirek çêkiriye. Bandora rojhilatnasên Î.A. Orbêlî û N.Marr bi taybetî di salên 1940 û 1950an de zêde bûye. Orbêlî wek rêvebirê Enstîtuya Rojhilatnasîyê li Lenîngradê, komeke ku ji kurdologan pêk dihat vekir. Kurdologên mîna Î.Î. Tsukerman, M.B. Rudenko, E.Î. Vasîlyêva, J.S. Mûsaêlyan, Î.A. Smîrnova, Ordixanê Celîl, Kerîm Eyûbî di vê komê de cih girtin. Bi keda wan ji salên 1940î heta 1960î jiyana edebiyat û rewşenbiriya kurdî berdewam kir, zindî ma.

Pişî damezrandina Kursiya Kurdolojiya bi serokatîya prof. Qanatê Kurdo li Lenîngradê, li ser destnivîs û kevneşopiyên kurdî karên mezin hat kirin. Li vir Margarita Borisovna Rudenko (1926-1976) li ser «Mem û Zîn» lêkolîn dest pê kir, destana Ahmedê Xanî wergerand rûsî û di sala 1956an

²⁴ Kovara Nûbihar, Mehmet Gültekin. Hejmar 126, Zivistan 2014

de çap kir. Her wiha pirtûka Mela Mehmûdê Bazîdî, «Şêxê Senan» a Feqiyê Teyran û «Leyl û Mecnûn» a Xaris Bidlîsî wergerand û da weşandin. Lêkolînerên ku Kursiya Kurdolojiyê de cih girtin gelek pirtûk weşandine û ew mîras kirine mal û milkê milete me.

Di vê demê de karên kurdolojiyê him li Rûsyayê, him jî li Ermenistanê, Gurcistanê û Azerbaycanê dihat meşandin. Kedên zanyar û nivîskarên kurd e mezin, yên wek Erebe Şemo, Qanade Kurdo, Heciyê Cindî, Casimê Celîl, Şekroyê Xudo, Wezîrê Eşo, Şamîl Askerov, Ferîkê Îsiv, Ehmedê Hepo, Celîlê Celîl, Ordîxanê Celîl û gelekên berbiçav bûn. Ew tev jî kurdên Serhedê bûn. Xewn û xeyalê teva azadiya gelê kurd û Kurdistanê bû. Wan teva jî temamiya jiyana xwe diyarî çand û zanyariya gelê xwe kirin û navê teva jî bi layîqî di dîroka çand û zanyariya gelê kurd da hatiye nivîsandin.

Lêkolîn û civandina zargotina kurdan pey Şerê Cihanê yê Yekemîn li Yekîtiya Sovyetê bi bernemeya zanistî û piştewaniya dewletê dest pê kiribû. Ev nêzîkbûna dewletê li ber çand û huner, ziman û zanistiya gelêrî heta hilweşîna dewletê berdewam kir.

Piştî Şerê Cihanê yê Duyem lêkolînên çand û zimanê kurdî li Qeqqasyayê zêdetir li Ermenistanê û hinek jî li Gurcistanê hat parastin. Lêkolîn û nixrdayîna ziman û çanda gelêrî bona kurda li Azerbaycanê hin di dawîya salên 1930î hat sekinandin û navê kurd li vê komarê di bingeh de hate rakirin, mafê kurda hate pêpeskirin.

Di sala 1955an li Yekîtiya Sovyetê ji bo kurdan du biryarên girîng hat dayîn. Rojnama “Riya Teze” weşana xwe cardin berdewam kir. Biryara duduyan, vekirina bernameya bi zimanê kurdî li radyoya Êrîvanê bû. Berpirsiyarê rojnameyê Mîroyê Esed û yê bernameya kurdî jî li radyoya Êrîvanê Casimê Celîl hate kifş kirin.

Di zarokatiya me de jiyana dê û bavên me her roj bi xebardana kurdî ji Êrîvanê bi peyvên “Êrîvan Xeber Dide” destpê dikir. Her rewşenbîrek ku bi dirêjiya salan di radyo da xebitîne, ji bo çanda gelê xwe xizmetên bêhempa kirine, erkên xwe bi serfirazî bi cih anîne. Navê wan xebatkarên hêja divê yek bi yek bê bibîranin: Casimê Celîl, Nûra Egît Polatova, Xelîlê Çaçan Mûradov, Ordîxanê Celîl, Mirazê Evdo, Hamoyê Rizgo, Mîkayêlê Rêşîd, Şikoyê Hesên, Emerîkê Serdar, Wezîrê Eşo, Ferîkê Îsiv, Sêvaza Evdo, Egîtê Cimo, Ahmedê Gogê, Sîma Semend, Nûra Cewarî, Tîtalê Efo, Cemîla Celîl, Bariyê Mehmûd, Eznîva Reşîd, Keremê Seyad, Hesênê

Mehmûd, Gulîzera Casim, Lûsika Huseyîn, Îşxanê Aslan, Cemalê Ûsiv, Tîtalê Kerem, Leylayê Kerem û yên mayîn.

Xebatkarên radyoya Êrîvanê para kurdî bi xebateke kolektîf 1800 kilam û melodiyên kurdî qeyd kirine. Deng û awazên gelek dengbêj û stranbêjên navdar bi saya radyoyê ketin dîrokê: Basoyê Memê, Mizeferê Memê, Neçoyê Cemalê Babasî, Îdatê Ecem, Koteyê Heko, Memoyê Pîr, Mizaferê Heso, Yenokê File, Reşîdê Beyo, Efoyê Esed, Şeroyê Biro, Reşîdê Baso, Dawîdê Xilo, Karapêtê Xaço, Orhanyan Îsrahêl, Egîtê Têcir, Memoyê Silo, Mecîdê Silêman, Şibliyê Çaçan, Seyadê Şamê, Fatma Îsa, Ehmedê Mirazî, Aramê Tigran, Mehmedê Mûsa, Gulîzera Etar, Kubara Xudo, Belga Qado, Sûsika Simo, Zadîna Şekir, Aslîka Qadir û yên mayîn. Ji muzîkjenên Şamilê Beko, Egîdê Cimo, Wezîrê Ûsiv, Xelîlê Evdile, Taharê Emer û yên mayîn jî bi dilsozî beşdarî karê radyoyê bûne.

Rojnameya «Riya Teze» ji bo gelek kesan bû zanîngeha ziman, edebiyat, çand û dîrokê. Hejmara ewil ya rojnameya «Riya Teze» di 25ê Adara 1930an de li bajarê Êrîvanê, bi alfabeya Latînî ku Îsahak Marogûlov û Erebe Şemo amade kiribûn, hate weşandin. Roja ewil Erebe Şemo, Heciyê Cindî, Emînê Evdal û yên din li dora rojnamê civiyan, kar û barê wê hildan ser milên xwe. Nivîskarên ermeniyên bi navûdeng, dostê gelê kurd Hiraçya Koçar, edebiyatzan Harûtiyûn Mikirtçyan, Gevork Parîs alîkariyeke mezin dan xebatkarên rojnameyê. Ew tev jî di nav kurdan de mezin bibûn, kurmancî rind zanibûn. Heta sala 1934an wan wek berpirsiyar rojnamê diweşandin. Berpirsiyarê rojnamê yê ewil, yê bi eslê xwe kurd, Cerdoyê Gêncî bû (1934-1937).

Radyo û rojname di sê qonaxan re derbas bûn. Ya yekemîn sala 1930 destpê dike heta sala 1937an. Ya duduyan sala 1955an heta sala 1990a berdewam dike. Vê demê di rojnamê de kesên mîna Mîroyê Esed Mistoyan, Qaçaxa Mirad, Emerikê Serdar, Şekroyê Xûdo, Babayê Keleş bi giştî 12-14 karmend kar kirine. Ya sisiyan jî ji sala 1990î heta roja îroyîn e.

Radyo û rojnameyê ku ji aliyê dewletê ve dihat fînansekirin piştî hilweşîna welatê Sovyetê hate birîn. Piştî Mîroyê Esed, berpirsiyarên rojnameyê ji sala 1989an heta niha ew kesan bûn: Tîtalê Efo, Emerikê Serdar, Grîşayê Memê, Tîtalê Kerem. A niha rojname ji aliyê Tîtalê Kerem û Mirazê Cemal tê birêvebirin. Gor gotina cabdare (berpirsiyarê) rojnamê

Mirazê Cemal, “Rojname bi alîkariya welatparêzên kurd heyîtiya xwe bi teherekê xweyî dike.”

Rojnameya «Riya Teze» û bernameya kurdî ya radyoya Êrîvanê dîroka zindî ya pêşdeçûyîna çand, dîrok û zimanê kurdan bû.

Ev sed sal in êrîş li ser çand û zimanê me tê kirin. Kurd her tim girêdayî ziman û çanda xwe bûne. Lê di van pêncî salên dawî di nav kurdan de ji ziman û çand dûrketin dest pê kiriye. Ji ber vê yekê zimanê me birîndar dibe. Dema em qala zimanê xwe dikin, lê bi rastî em qala birîna xwe dikin. Ev birîn ne tenê li ser axa Kurdistanê ye. Ev birîn li her derê diêşe, her ku diçe birîna me diwartir dibe. Em difikirin ka em çawa vê birînê bipêçin, em ji hev dipirsin û em hewl didin ku bersîvek peyda bikin. Ez bawerim û min xwe wûsa îqna kiriye ku ew mîrateya kurdên Qefqasyayê dermanê herî mezin e. Ji sala 1920an hetanî sala 1970î cem me wekî pênc tiliyên destan kitêb nehatine çap kirin. Di vê demê de nivîskar û rewşenbîrên me yên qefqasî pênc qat zêdetir pirtûk weşandin.

Ez li gundekî biçûk bi navê Girberan hatime dinyayê. Ev der di navbera sinorên Tirkîyê û Îranê de ye. Der dora gundê me, di her du aliyê sinor de tijî eşîrên/qebîleyên kurdan e. Diya min dijî, lê bavê min 18 sal berê xatirê xwe ji dinya ronik xwest û çû ser dîlovaniya xwe. Hejmara wan ne diyar e ku li vir çiqas dê û bavên kurdên ku li Qefqasyayê dijîn çûne rehmetê. Lê tişteki baş dizanin ku dê û bav dimirin, lê mîrateyek dimîne ji bo mîletê me. Ya ku wan li pey xwe hiştin ne tenê zarok in; wan ji me ra hembêzek hezkirina edebiyata mîletê xwe hiştin, dîrok û zargotin, çîrok û stran, destan û roman, helbest û arteşek rewşenbîr, ronakbîr hiştin, helbet zimanek li pey xwe hiştin. Mirasa kurdên Sovyetê berê her tiştî jî deng û tama dîrok, kilam, zargotin û zimanê kurdî dane me. Di mala me da kilamên radyoya Êrîvanê dihate gohdarî kirin û dema bavê min navê kilama Efoyê Esed «Bêrîvan» xwest wek nav li keça xwe bike dewletê qebûl nekir. Ji ber ku ew nav kurdî bû... Bavê min Salihê Erebi 30 sal şûnda encax navê neviyê xwe danî Bêrîvan. Ew çîrok êşekî giran bû û bi mîrasa kurdên Qefqasyayê re gîredayî bû. Em girêdayî vê mîrasa mezin bûn û me zimanê dayîkên xwe mêt, me bi vî awayî xwe ji vê dinyayê re amade kir.

Ev di şeş salên dawî de di kovara Nûbiharê de di her hejmarekê de ez hevpeyvînan li ser rewşenbîr, helbestvan û nivîskarên kurdên Qefqasyaya Başûr çêdikim. Car caran jî di hin kovaran de gotaran dinivîsim. Ew

mîrataya ku ez behs dikim tesîreke wisa mezin dilê min de çêkiribû ku ez derketim rêwitiya nivîsandina pirtûkan. Di derheqe Prof.Dr. Celîlê Celîl²⁵ û Wezîrê Eşo²⁶ me du pirtûk çapkir. Min ji bo çapkirina pirtûkên gelek nivîskarên me yê Qefqasyaya Başûr ked da. Ew jî têrê nekir min xwest ez herim wê erdnigariyê bi çavên xwe bibînim. Ez ber bi Êrîvanê ketim rêwitiyekê²⁷ ku di encamê de 12 gundê aliyê Elegezê, Pampa Kurdan û li gundên din geriyam. Min bi dehan merzelên wê mîratayê dît û li ser wan dua xwendin. Min hêjayên wek Celîlê Celîl, Eskerê Boyik, Ehmedê Hepo, Wezîrê Eşo, Emerîkê Serdar, Tosinê Reşît, Cemîla Celîl, Mirazê Cemal, Firîda Cewarî, Keremê Seyad, Tîtalê Kerem, Aslîka Qadir û Almast Hisoyan rûbirû naskir. Li ser merzelên Erebe Şemo, Heciyê Cindî, Sima Semend, Ferîkê Üsiv, Emerikê Serdar, Çerkezê Reş û bi yê mayin re xeberda.

Di vê konferansê de kurdî axaftina min jî dîsa girêdayî wê mîratayê ye. Em ji zimanê xwe hez dikin, çimkî ew ziman tê bindestkirin û biçûkxistin. Zimanê me ji îngilîzî, almanî, tirkî, erebî û farisî ne kêmtir e. Ji bo vê yekê divê em zêdetir li ser ziman bixebitin.

Mirin heqîqet e. Dayîk û bavên me jî mirine û yê bimirin. Lê em dikarin bi zar-zimanê xwe, bi dengê xwe, bi zimanê dê û bavên xwe bijîn. Zimanê me dîrok, zargotin û hebûna me ye. Em jibîra nekin ku dayika me Kurdistan e. Her çiqas îro ji her alî de derdora zimanê me dorpêç bûye, mehkûmê asimîlasbûnê bûye jî divê em di zimanê xwe de israr bikin, hewl bidin, dîrok û zargotina kurdên Qefqasyayê jibîr nekin.

Ji bo guhdarkirina we silav û rêzên dilîstanî, gelek spasî rêzداران...

²⁵ Nihat Gültekin, Wezîrê Eşo, Kilam û pênuş, kurdên Qefqasya Başûr, Weşanxana Lis, 2018.

²⁶ Nihat Gültekin, Jiyaneke li pey zanyariyên kurdî, kurdolog Prof. Dr. Celîlê Celîl, Weşanxana Lis 2019.

²⁷ Rêvitiya min li Ermenistanê ya 12 rojan. Nûbihar, meha şêşan ya sala 2018an.

ZIMANÊ KURDÎ WEKÎ ÇARESERYEKÊ JI BO PIRSGIRÊKA NETEWEYÎ



Faraidoon Saman / Fereydun Saman

Sernivîserê Kovara Zimannasî (Ziman û Zar)²⁸

Heta niha ji ber çend sedeman, zimanê kurdî di seranserê sînorên îdarî yên Herêma Kurdistanê de bi temamî nehatiye cîbicîkirin. Helbet hebûna zimanê fermî li Herêma Kurdistanê û naskirina wê di destûra Iraqê de destkefteke dîrokî ye.

Lêbelê mixabin îro zimanê kurdî ji her demê zêdetir di bin metirsiya windabûnê de ye. Dewletên serdest ku kurd tê da dijîn, di têkbirin û asîmîlekirina zimanê me de rolekî sereke dilîzin. Ji ber sedemên navxweyî birîna asîmîlasyonê kûrtir dibin. Gelek caran dîbêjin ku zimanê kurdî nebûye zimanê standard ji bo hemû civakên kurd ên parçeyên Kurdistanê. Li gorî min ew rewş diyardeyeke xwezayî ya her zimanekî zindî ye. Miletên bextewar jî hene ku xwedî dezgehên siyasî û dewletên serbixwe ne, lê ziman û standarda xwe ya hevpar nînin.

²⁸ **Fereydun Saman (Faridûn Saman).** (01.06.1971, Hewlêr) Helbestvan, rojnamevan û lêkolînerê ziman. Berpirsiyarê Kovara Zimannasiya Demsalî (Ziman û Ziman) ye. Endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurd (Hewlêr), Yekîtiya Rojnamevanên Kurdistanê û Federasyona Navneteweyî ya Rojnamegeran e. Ew nivîskarê gelek pirtûkan e.

Zimanê kurdî di destûra Iraqê de bi fermî hatiye naskirin, lê di pratîkê de zimanê me hîna jî rûbirûyê qirkirina çandî ye, nemaze li navçeyên kurdên ku li derve Herêma Kurdistanê ne. Wek Deşta Nînowa, Kerkûk û Xaneqînê. Heremên li naverast û başûrê Iraqê ku kurd tê da dijîn, ziman û çanda kurdî bi temamî ji holê rabûye.

Yasaya Îdareya Demkî ya 2004an û Destûra Bingehîn a Iraqê ya 2005an, yekem car hebûna fermî ya zimanê kurdî li seranserê Iraqê nas kiribû. Li gor xala 4a Destûra Iraqê ya sala 2005ê, yasaya zimanên fermî li Iraq û Herêma Kurdistanê hat derxistin, lê naveroka wê bi awayekî baş nehat cîbicîkirin.

Zimanê kurdî di sala 2014an de li Parlamentoya Kurdistanê û herwiha di Destûra Iraqê de ligel erebî wek zimanê fermî yê Herêma Kurdistanê hat ragihandin. Lê di Iraqê ji bo bicihanîna naveroka Qanûna Zimanên Fermî û şopandina pêkanîna qanûnê, mekanîzmayên berfireh û guncaw nehatine damezrandin.

Li vir ez dixwazim behsa çend faktorên giştî bikim ku zimanê kurdî tehdîd dikin:

- Nebûna saziyên fermî û siyasî ku qîmetê bidin ziman û axêverên wî. Xerabkirina avahiya xwezayî û şêklê ziman ji ber sedemên siyasî û çandî yên ku ji gotara serdest a neteweperestî û dînî ya hikûmeta navendî derdikeve.

- Her wiha zarava û devokên kurdên ku li deverên veqetandî dijîn ji sazûmana zimanî û xwezaya kurdiya navendî dûr ketine.

- Bernameyên perwerdehiya bi zimanê dayikê li van deveran tune ye. Zimanên biyanî li ser wan tê ferzkirin û wan neçar dihêlin ku zimanê neteweya serdest qebûl bikin.

- Dijminên gelê me bi awayekî şovenîst û sistematîk zimanê kurdî dikin hedef û hewl didin ku di asta perwerde, çapemenî, rojnamegerî û medyaya civakî de qedexe bikin.

Em dikarin gelek mînakên van pirsgrêkan li Herêma Kurdistanê rêz bikin. Tevî hebûna Hikûmeta Herêma Kurdistanê û Wezareta Perwerde û Xwendina Bilind, di karanîna zimanê kurdî de pirsgrêkên cidî hene, bi kêmanî di astên perwerdehiya seretayî, navîn û bilind de.

Zimanê kurdî yê şîrîn, zimanê pîroz yê Serencam û Pirtûka Reş e, zimanê afirandina Baba Tahirê Hemedanî, Xana Gobadî, Rûmî û Besarânî ye, zimanê felsefe û tesewufê Mela Cizîrî, Ehmedê Xanî û Feqiyê Teyran e. Lêbelê, ji sedsalekê zêdetir e, dijmînên me bi awayên cûrbecûr ziman û nasnameya neteweyekê înkâr dikin. Di serdema globalîzm, medyaya civakî û zekaya sûnî de, hîn jî bi awayekî şovenîst li dijî kurdî şer tê kirin. Ev şer li dijî hebûn û netewbûna gelê kurd e. Ji ber ku ziman, ku di bingeh de pirseke neteweyî ye, rasterast bi pêşeroja hebûna kurdan ve girêdayî ye.

Tevî hemû têkoşîn û qurbanîyên bêdawî, pîrsgirêkên ziman û nasnameyê yên kurdî li her çar aliyên Kurdistanê di bin zexta neteweperestîya dewletên ku Kurdistan parçe kirine de ne. Da ku kurd di paşerojê de tûşî qirkirina çandî nebin, bi rehetî û bi rûmet bijîn, naskirina fermî ya zimanê kurdî li van parçeyên Kurdistanê girîng e û şert e.

Pêwîst e bi lêkolînên zanistî li ser ziman û zaravayan helwesteke neteweyî were nîşandan. Nêzîkatiyên nezanistî yên hin akademîsyen û zimannasên kurd jî astengiyên cidî derdixin holê.

Bêguman, civakên kurd, ku di tevahiya dîrokê de ji aliyê rayedarên neteweya serdest ve bi berdewamî hatine tepeserkirin, di parastina mafên xwe de encamên berbiçav bi dest nexistine. Armanca sereke ya netewên serdest guhertina avahiya demografîk a Kurdistanê, tengkirina erdnîgariya welatê me û dûrxistina kurdan ji nasnameya xwe bûye.

Divê ziman û zaravayên kurdî, etnîsîte û mafên wê di destûrên pêşerojê yên welatên ku Kurdistan parçe kirine de werin naskirin.

Piştî Peymana Lozanê, du beşên neteweya kurd ketin bin kontrola du dewletên kolonyalîst ên ereb; Iraq û Sûriyeyê. Di sedsala dawî de, perwerde û xizmetên giştî li herêmên kurdî yên di nav sînorên van dewletan de bi erebî bûn. Herwiha, hest, raman, nasname, çand û zimanê gelê kurd her tim dihat biçûkxistin. Vê rêbazê rasterast bandor li ser pêşketina asimilasyonê kiriye. Divê artêşa rewşenbîrên kurd ku xizmeta ziman û çanda erebî dike, li ser vê yekê baş bifikire. Ji ber nebûna bingehên pêwîst ên wekî xwendin, axaftin û perwerdehiya bi zimanê dayikê, nebûna eleqeya rewşenbîran bi zimanê xwe re dibe sedema jixwedûrketinê.

Tekiliyeke rasterast di navbera ramana mirovan û ziman de heye. Bi gotineke din, ziman amrazê ramanê ye û raman jî bingeha ziman e.

Ber bi dawiya sedsala 20an ve, zimanê kurdî li Başûrê Kurdistanê statuyek dîrokî û siyasî ya girîng bi dest xist, wek damezrandina Foruma Agahdariya Kurdî û Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Bexdayê di sala 1970an de.

Serhildana Başûrê Kurdistanê (1991) derfetên mezin ji bo zimanê me vekir. Di destûra Iraqê de di sala 2005an de bi fermî naskirina zimanê kurdî li gel erebî rewşa zimanê kurdî li Başûrê Kurdistanê veguherand, kanalên perwerdehî û ragihandinê vekir û pêşketinên girîng pêk anî. Nêzîkatiya nemirovane ya dewletê ya li hember çand û zimanê kurdî êdî hilweşiyaye, û hikûmet neçar mane ku rêça polîtîkayên xwe biguherînin û gavên ber bi wekhevîyê ve bavêjin. Di roja me ya îro de daxwaza rizgarkirina zimanê kurdî ji xetereya windabûnê heye, lê mirov nikare bêje ku di parastina ziman de îstîqrara mayînde pêk hatiye.

Îro, hin destwerdanên siyasî yên nezanistî li ser zimanê kurdî pirsgirêkan diafirînin. Yek ji xetereyên ku dikare girêdana rasterast a di navbera raman û ziman de têk bibe, bê guman îdeolojî ye. Îdeolojî, weke saziyeke rewşenbîrî û siyasî ya ji berê de diyarkirî û pîrozkirî ye, arasteya pêşketina zanistî ya ziman diguherîne û sistemeke qalibên hişk û sînordar diafirîne.

Weke mînak piştî serhildanê bi dehan sazî û rêxistin di warê ziman û wêjeya kurdî de, di bin bandora nakokiyên siyasî, aborî û çandî yên di navbera partiyên sereke yên Başûrê Kurdistanê de derketin holê. Mixabin, li ser van saziyan pergalên çavdêriyê nehatin pêşxistin, û mekanîzmayên zanistî yên pêwîst di navbera wan de nehatin damezrandin.

Zaravayên cuda yên kurdî astengiyeke cidî li pêşiya yekbûna neteweya kurd çêdikin. Gelo zanîngehên me di vî warî de rola xwe bi têra xwe dilîzin?

Divê zanîngehek taybet li ser vê mijarê were vekirin û beşên jêrîn tê de hebin:

Beşa Zimannasiyê: Stratejiya vê dezgehê lihevkerin û standartkirina rêgez û prensîbên hemû zaravayan e. Armanca wê ew e ku kurdî bi pêşketinên zanistî, teknolojîk, civakî û çandî re hevaheng bike. Di pêvajoya standardkirinê de, pêdivî ye ku meriv li ber çavan bigire ku her zarava zindî ne û xwedî rastiya xwe ya avahîsaziyê ne.

Beşa Arkeolojiya Ziman: Di vê beşê de, divê kokên bingeîn û dîrokî yên zimanan, faktorên çandî, civakî, psîkolojîk, erdnîgarî, topografîk, siyasî û hwd. yên li ser zimanan werin lêkolînkirin. Herwiha, girîngiya zaravayan wekî reng û dengekî cuda di nav dewlemendiya ziman de divê were hesibandin û girîngiya wan di dewlemendkirina pêvajoyên çandî de were nirxandin.

Dibe ku ji bilî van beşên din jî hebin.

Xala girîng avakirina zanîngehekê ye ku dê bi kêrahî li ser mijarên bingeîn lêkolîn bike. Ev çalakî dê deriyên ji bo gelek mijarên girîng jî veke. Hişmendiya ku çand û zimanê me di bin xetereyeke mezin de ye, divê van hemû hewldanan ronî bike. Cîbicîkirina projeyek wiha dê bibe rêyek stratejîk ji bo pêkanîna şoreşek çandî û rewşenbîrî û di pêvajoya netewsaziyê de.

NETEWEPPERWERÎ LI KURDISTANÊ: ÇAVDÊRIYEKE DÎROKÎ Û CIVAKÎ-SIYASÎ



Îbrahîm Gurbuz

Nivîskar, Serokê Weqfa Îsmâîl Beşikçi

Hevalên rêzdar, Hûn bi xêr hatin!

Ez dixwazim hinekî li ser nasname û paşê jî li ser teoriya netewperweriyê bisekinim.

Nasname bi kurtasî ew e ku mirov çawa xwe di nav çand û civakê de dibîne û pênase dike. Bi gotinên din mirov xwe çawa pênase dike û civat çawa li ser wî mirovî tesîr dike, bi wî awayî nasname pêk tê.

Di disîplîna civaknasiyê de, nasname û cihê mirov di civakê de ji aliyê faktorên wekî zayend û çîna civakî ve tê diyarkirin.

Di disîplîna felsefeyê de, nasname li ser rastiya bingeîn û hebûna mirovan disekine.

Di disîplîna psîkolojiya civakî de, nasname bi awayê ku mirov xwe çawa dibîne û di civatê de mirovên din wî çawa dibînîn eşkere dibe. Ev têgeh di warên psîkolojî û civaknasiyê de pêş ketiye.

Ez dixwazim niha li ser nasnameya netewî bisekinim. Netew bi piranî li ser erdekî dijîn. Nasnameya neteweyî di nav civakê de ji zimanekî

hevpar, dîroka hevpar, yekîtiya erdnîgarî ya hevpar, çanda hevpar, kevneşopiyên hevpar, têgihîştina hunerî ya hevpar, yekîtiya giyanî (ruhî) û armancên hevpar pêk tên.

Gelo li Kurdistanê netewperwerî û teoriyên netewperweriyê di çi astê da ye? Di dîroka hemû neteweyan de teoriyên netewperweriyê hene. Îro di nav rewşenbîrên cîhanê de, li ser teoriya netewperweriyê hin zanyar derketine pêş. Di nav wan de, yê herî navdar Benedict Anderson û Anthony D. Smith in. Ez dixwazim, niha hinekî qala fikr û ramanê wan bikim.

Di sala 1983an de, Benedict Anderson pirtûkek bi navê "Civakên Xeyalî: Çêbûn û Belavbûna Neteweperestiyê" weşand. Ev pirtûk ji hêla zanyaran ve wekî metnek klasîk di warê neteweperweriyê de tê hesibandin.

Li gorî Anderson, derketin û belavbûna neteweperweriyê dikare wekî pêvajoyek modernîteyê were dîtin. Fikrîyeta netewperweriyê; bi ziman, dibistan, zanîngeh, çapamenî û materyalên çapkirî ve çêdibe û belav dibe. Civak, piştî makîneyên çapê hatiye icad kirin, li dora materyalên çapameniyê (pirtûk, rojname, kovar) dicivin. Di navbera xwe de, civakekê xeyalî çêdike. Ev civak netew e.

Dîsa li gorî Anderson, teoriya netewperweriyê, ji xeynê ziman û ragihandinê; bi sirûda neteweyî û ala neteweyî temam dibe. Netew wisa ava dibin. Em dikarin bi hêsanî û bi kurtî, wisa qala netewperweriyê bikin. Mirovek, heger zimanê xwe, çanda xwe, nasnameya xwe, hebûna xwe, statûya netewa xwe, serxwebûna welatê xwe bixwaze, ew netewperwer e. Tenê xwestina ziman bixwe jî, netewperwerî yê. Ev mirovan, çi dibe bila bibe; komunist, sosyalîst, marksîst, dîndar jî be, heger van tiştan ku min behs kiriye, bixwaze, dibin netewperwer.

Benedict Anderson, li ser netewperweriya diyasporayê jî, gelek tiştên girîng dibêje. Li gorî Anderson, di netewperwerên diyasporayê de, di mêjiyê wan de, welatekî xeyalî heye. Ev netewperweriya diyasporayê de li kîjan welatî bijîn wî welatî wekî welatê xwe dihesibînin. Di vê neteweperweriyê de, çawa hesreta welatê wendakirî heye, di hundirê civaka ku tê de dijîn jî wekî welatê xwe dihesibînin. Wekî mînak, hin rewşenbîrên kurd yên Swêdê wisa difikirin.

Anthony D. Smith, neteweperweriyê, di bin du sernavên sereke de dinirxîne: ya yekemîn “neteweperweriya etnîkî” û ya duyemîn jî “neteweperweriya erdî” ye. Di neteweperweriya etnîkî de, berdeamiya netewan (çand, huner, ziman û hwd.) esas tê girtin. Di neteweperweriya erdî de jî, ax pîroz tê dîtin û dixwaza azadkirina wê axê heye. Di neteweperweriya erdî de, welatekî serbixwe û netew-dewlet, her wiha sirûda netewî û ala netewî heye. Neteweperweriya etnîkî de, li nav civakê din parastina ziman û çanda xwe, ango parastina bixwe heye. Di neteweperweriya diyasporayê de, di mêjiyê wan de, welatekî xeyalî heye, lê di neteweperweriya etnîkî de, welatê xeyalî jî tune ye.

Di vê çarçoveya teoriya neteweperweriyê de, ez dixwazim kurd û Kurdistanê binirxînim. Dîroka kolonîkirina Kurdistanê di 1639an de dest pê dike. Bi peymana Qesra Şîrîn, Kurdistan bû du parçe. Di 1828an de bi peymana Turkmençayê re, Kurdistan Qefqasyayê ket bin desthilatdariya Rûsyayê û ji Kurdistanê hat cuda kirin. Di 1923an de bi peymana Lozanê, kolonîkirina Kurdistanê temam bû. Kurdistan bi wî awayî bû pênc parçe.

Kurd çima îro di vê rewşê de ne? Bersiva wê pirsê di dirokê de veşartî ye. Ji bo wê yekê, ez dixwazim, polîtîkayên navendîbûnê yên ku Împaratoriya Osmaniyan meşandiye hinek li ser bisekinim. Di Fermana Tanzîmatê ya 1839an de, ji holê rakirina statuya îdarî û siyasî ya Mîrtiyên Kurdan pek hat. Ev polîtîka, heya dawîya sedsala 19mîn hate meşandin. 1847an de mîrên Botan hatin tasfiyê kirin. Hemû mîrên kurdan hatin sirgûnkirin. Polîtîkaya dewleta Osmanî, dixwest kurdan bê serok û bê rewşenbîr bihêle. Bi vî awayî hemû mîr û rewşenbîrên kurdan, malbat û xizmên wan hatin sirgûnkirin. Di wê serdemê de, paşayên Osmaniyan, di raporên xwe de wiha digot: “Kurdên bê aqil û çar ling gerek em bê serok û bê rewşenbîr bihêlin”. Li gorî van raporên, rewşenbîr û mîrên kurd sirgûnî Stenbolê, Gîrîtê, Qahîrê û Şamê kirin da ku careke din venegerin Kurdistanê. Piştî van sirgûnan di dibistanên Subyan²⁹, mektebên aşîretan de dixwazin wana asîmîle bikin.

Ev polîtîka, di serdema Îttîhad -Terakkî de jî, berdeyam bû. Di serdema 1911an Cemiyeta Îttîhad -Terakkî, civînek vêşartî li Selanîkê çêkirin. Di vê civînê de, biryarên gelekî girîng te girtin. Ya yekem, divê

²⁹ Dibistanên Subyan navê giştî yê saziyên perwerdehiya seretayî li Împaratoriya Osmanî bûn – *amadekar*.

nifûsa ermenîyan bên pûçkirin. Ya duyem, dive nifûsa rûman bên koçberkirin. Ya sêyem, kurd bên asîmîlekirin. Ya çarem jî kurdên elewî û êzîdî bibin misilman. Ya pêncem, divê milkên xirîstîyanan bên desteserkirin. Bi vî awayî, demografiya herêmê bi polîtîkayên sirgûn, kuştin û zextê hate guhertin. Mînak, di sala 1916an de, 1 milyon û 200 hezar kurd hatin tehcîr kirin.

Serdema kemalîstan, berdewamiya serdema Îttîhad- Terakkiyê bû. Polîtîkayên asîmîlasyonê yên kolonyal, bi awayekî profesyoneltir, wê demê hatin meşandin. Di serdema Osmaniyan û Cemiyeta Îttîhad-Terakkî de, ev pêvajoyê bi gelek pêkanînen wekî YİBO (dibistanên leyîlî) sîstema perwerdeyê û teşwîqên zewaca tirk-kurd jî hate meşandin.

Sirgûnkirina rewşenbîrên kurdan û cudabûna wan ji ax û civaka Kurdistanê, bû sedem ku, netewperweriya erdî, di mejîyan de çênebe. Ji ber vê yekê, di daxwazên wan rewşenbîran de, fikrê dewletbûnê tunebû. Piştî hilweşîna dewleta Osmaniyan, di salên 1920an de hemû neteweyên Balkan û Rojhilata Navîn bûn xwedî dewlet. Lêbelê ji ber ku kurdan daxwaza serxwebûnê nekirin, nikarîbûn bibin xwedî statuyekê jî.

Çendin ronakbîrên kurd ên ku di destpêka salên 1900î de li sirgûnê dijîn, bi taybetî li Stenbol, Parîs û Qahîreyê, ji bo parastina yekîtiya Împeratoriya Osmanî bi Îttîhad û Terakkî re tevdigerin.

Ew kesên ku di wan deman de helwesteke serhildêr nîşandan, biserketin û ji bo civakên xwe serkeftin anîn. Helwesta Mîrê Mekkeyê Şerîf Huseyn di vî warî de balê dikişîne. Ew bi dîplomatên leşkerî yên Brîtanî re wiha diaxive: “Em Osmaniyan naxwazin, padîşah naxwazin, em dixwazin bibin dewletekî serbixwe.” Di encamê de ew bû şahê Erebiyana Siûdî, kurê wî yê mezin Ebdullah bû şahê Urdinê û kurê wî Feysel bû şahê Iraqê. Yanî bavek û du kur bûne xwediyê sê dewletan.

Di vê pêvajoyê de rewşenbîrên tirk xwestin ku Împaratoriya Osmanî were hilweşandin û ji bo avakirina dewleta tirk têkoşîyan. Gelên welatên Balkanan jî dixwestin ku Împaratoriya Osmanî hilweşe da ku serxwebûnê bi dest bixin.

Lê kurdan tenê di nava Yekîtiya Împaratoriya Osmanî de daxwaza mafên zimanî û çandî dikirin. Ji bilî Emîn Alî Bedirxan, Abdurrezak Bedirxan, Nurî Dersîmî, Şêx Abdusselam Barzanî û Hacî Qadîrê Koyî

rewşenbîrên din Yekîtiya Împaratoriya Osmanî parastibûn û heta di Şerê Cîhanê yê Yekem de li kêleka artêşa Osmanî şer kiribûn.

Di serdema Osmanîyan de, rewşenbîrên kurdan piranî Osmanîperêst bûn, yekîtiya Osmanîyan dixwestin. Îro li Bakurê Kurdistanê, piraniya siyasetmedarên kurd jî, mîna wan tirkperest in. Tirkîyeperest in, yekîtiya Tîrkiye û demokratîkbûna Tîrkiye dixwazin. Di vî warî de, ew pir dişibin pêşiyên xwe.

Lêbelê, Şêx Abdusselam Barzanî û kesên pê re netewperwerên erdî bûn. Yên ku, îro rêya wî dişopînin, ango siyasetmedarên Başûrê Kurdistanê, dewletekê serbixwe û azad dixwazin.

Ez dixwaz im tiştêkî din bibêjim. Ji xêncî Rojhilat û Başûrê Kurdistanê, li Kurdistanê Qefqasyaye jî netewperweriya erdî heye û gelekî pêş ketiye.

Gotina min ya dawî ev e, di penç parçeyên Kurdistanê de hizra netewî mixabin gelek kêr e. Ji bo wê yekê gerek em netewperweriya erdî li Kurdistanê zedê bikin, pêş bixin.

Spas ji bo guhdarîkirinê.

GIRÎNGIYA PARASTINA ZIMANÊ KURDÎ Û YEKÎTIYA NETEWEYA KURD



Ayten Kotikyan

Navenda Kurdîstanê bo Çand û Hunerê (Hewlêr)³⁰

Kurd xwedî dîrokeke tijî kêş û alozî ne û tim û tim ji bo parastina nasnameya xwe ya çandî û zimanê xwe têkoşiyane. Di nav wan kêşan de, parastina zimanê kurdî yê ku tenê amûra axaftinê nîne, lê belkî bingehe nasnameya neteweyî û yekbûnê kurdan e. Ji bo gelê kurd, parastina zimanê wan ne tenê pirsê zimannasîyê ye, pirsê hebûna neteweyî ye. Nivîskar û fîlozofê kurd, Îbrahim Ehmed diyar dike ku kurdî "ne tenê amûra axaftinê ye, lê bîranînek gelêrî ye ku dîroka wê ji çiya, çem û çîrokên kevîr tê hînkirin." Ehmed bawer dike ku zimanê gel bi dîrokê û bingehe nasnameya kurdî ve girêdayî ye.

Têkoşînên ji bo nasname û yekîtiya neteweyî di nav gelê kurd de bi têra xwe nehatine şopandin. Hin êzidiyên ku di van salên dawî de xwe weke neteweyek cuda pênasî dikin, di wê baweriyê de ne ku wan nasnameya kurdî derbas kirine.

Dîn nikare diyarkerê sereke yê nasnameya neteweyî be ji ber ku nasnameya netewî li ser bingeha ziman, çand û dîroka giştî tê avakirin.

³⁰ Ayten Kotikyan (25.07.1994, Ermenistan). Xwendekara Lîsansa Bilind a di beşa Peywendiyên Navdewletî de (Zanîngeha Hewlêrê)

Di vê gotarê de dê behsa çawaniya parastina nasnameya dînî û neteweyî ya kurdî were kirin, gelê kurd çawa dikare bi ziman, çand û dîroka kurdî re tevbigere û çawa dikare ji perçebûna dînî û zextên din were parastin.

Girîngiya Zimanê Kurdî, Mîrasa Çandî û Nasname

Ziman amrazek girîng e ji bo nasname û mîrateya çandî û her wiha wekî parêzgerê zanîna çandî tê hesibandin. Zimanê kurdî, bi zaravayên wê yên wekî kurmançî, soranî, zazakî û goranî diyar dike ku çand û hunera kurdî çiqas berfireh û giran e û rastûrast bi dîrok û nasnameyê ve girêdayî ye.

Zimanê kurdî di tevahiya dîroka xwe de wekî sembola têkoşîn û evînê hebûna xwe domandiyê. Edebiyat, folklor û stranên kurdî tijî mînakên azadî, têkoşîna ji bo welatê kurdan, êş û bextewariya neteweyî ne. Ji ber vê yekê, parastina zimanê kurdî bi parastina dîrok û nasnameya kurdî re hevwater ye.

Perspektîfa Dîrokî

Ziman û çanda kurdî di dîrokê de, hem di serdema Împeratoriya Osmanî de û hem jî di serdema neteweyên nûjen de, rastî asîmîlasyon û cudakariyê hatiye. (Gunter, 2004). Bo nimûne, di dema rejîma Baasê ya Iraqê de, zimanê kurdî ji perwerdehiya giştî hate derxistin û ezmûnên kurdî hatin paşguhkirin. (Hassanpour, 1992).

Lê belê, kurdan bi sekinîna li hember zextê û bi têgihîştin û hewldanên çandî karîn ziman û çanda xwe biparêzin. Îro jî kurd li dijî asîmîlasyon û windakirinê li ber xwe didin.

Ziman ne tenê amûrek ragihandinê ye, lê di heman demê de bingeha nasname û yekbûna gelekî ye. Ji bo parastina dîrok û nasnameyê, divê pêşxistina ziman di her alî de were piştgirîkirin.

Nêzîkatîyên hin komên ku hewl didin zimanê kurdî wekî zimanê "êzîdîkî" bidin nasîn balkêş in. Mishefa Reş, pirtûka pîroz a kurdên êzîdî, belgeyeke çandî ya girîng e ku nasnameya êzîdî di nav ziman û çanda kurdî de destnîşan dike. Di vê pirtûkê de tê gotin: «Xwedê bi zimanê kurmançî axiftiye.» (Resid, 2011). Ev şan û nîşan a zimanê kurmançî di çanda kurdên êzîdî de, di seranserê dîrokê de her gav girîng bûye. Ev nêrîna pîroz, cihê zimanê kurdî di çanda kurdên êzîdî de baş rave dike.

Di çarçoveya giştî ya çanda êzidî de, zimanê kurdî bi gelemperî wekî hêmanek girîng a nasname û naskirina çandî û dînî hatiye parastin. Nasnameya kurdî her tim faktorek parastinê li dijî zilm û zordariya li ser êzidiyan bûye. «Êzdîkî» pênase û diyardeyek e ku ji perspektîfeke dînî hatiye afirandin, lê zimanê kurdî her tim zimanê dayikê yê civaka kurdên êzidî bûye û hîn jî wisa ye. Têgihîştin û qebûlkirina ku êzdîyatî dînek e, xwedî girîngiyeke dîrokî û rojane ye. Parastina dîn bi qasî parastina nasnameya netewî girîng e, lê divê parastina dîn nebe sedema parçebûna neteweyî. Divê civaka êzidî nekeve nav hewldanên cudakar ji bo parçekirina nasnameya xwe ya neteweyî.

Ziman Amûra Yekîtiyê ye

Ji bo kurdan, ku li welatên cuda yên cîhanê wek Tirkiye, Iraq, Îran, Sûriye, Qefqasya û Ewropayê xwedî wargehên taybet in, girîng e ku zimanê xwe biparêzin û pêş bixin da ku yekîti di navbera gelê me de çêbibe. Zimanê kurdî weke girêka ku gelê kurd dike yek. Bi pêşxistin û standardkirina zimanê kurdî, kurd dikarin bi hêsanî nasname û yekîtiya xwe ya kolektîf xurt bikin.

Ziman di avakirina neteweyê û xurtkirina hesta aîdiyetê de roleke girîng dilîze. Pêşxistina saziyên perwerdehî, medyayê û çandî yên kurdî pir girîng e û berdwamiya nasnameya kurdî misoger dike. Bo nimûne, dibistan û zanîngehên zimanê kurdî li Herêma Kurdistana Iraqê navendên girîng in ji bo parastin û pêşxistina çanda kurdî. Ev sazî, ku perwerdehiya zimanê kurdî, wêje û lêkolînê pêşkêş dikin, hesta aîdiyetê pêş dixin.

Girîngiya Yekîtiya Neteweyî

Gelê kurd, di bin serweriya dewletên mîna Tirkiye, Îran, Iraq, Sûriye û Qafqasyayê de, her tim neçar e ku li hember zextên ku nasnameya wan a neteweyî hedef digirin, li ber xwe bide. Her çiqas xwedî nasnameyeke ku ji ziman, dîrok û çanda hevpar pêk hatiye jî, li ser cudahiyên dînî hewl tê dayîn ku ev nasname serdest nebe.

Hin nûnerên ji civaka êzidî ku beşek ji neteweyek mezin e, di van salên dawî de xwe weke neteweyek cuda dide nasîn. Hinek kurdên ku derbasî dînen din, bi taybetî jî xirîstiyantiyê bûne, nasnameya xwe ya netewî diparêzin, hinek jî li dijî neteweya xwe helwest digirin. Dîn ne tenê

diyarkerê nasnameya neteweyî ye. Her netewe, bi rêya ziman, çand û dîrokê yekgirtî hene.

Pirsgirêka Nasnameya Kurdî

Di civaka kurd a îroyîn de, bi taybetî di demekê de ku beşek ji civaka êzidî ji nasnameya kurd dûr dikeve, pirsgirêka parçebûna nasnameya milletê me derdixe holê. Di nav gelê kurd de, êzidiyên kurd bi kurdî diaxivin û gelek ezmûnên çandî û dîrokî bi kurdên misilman re parve dikin. Lê dema ku êzidî dixwazin nasnameyeke xwe ya taybet bi pêş bixin, pirsgirêkên cidî di têkiliyên bi civaka kurd a berfireh re derdikevin holê. Carinan şideta dînî ya kurdên misilman li dijî êzidiyan di vê perçebûnê de roleke neyînî dilîze. (Gürbüz, 2016).

Kengê êzidî dînê xwe diguherînin û derbasî dîneke nû dibin jî parçebûn û ji nasnameya xwe ya kurdewarî dûrketin zêdetir dibe.

Çawa ku David McDowall di pirtûka xwe ya bi navê "Dîroka Kurdî ya Nû" (1996) de destnîşan dike, nasnameya kurdî di dîrokê de ne ji ber dijberiya dînî, lê bi şer û xweparastinê pêk hatiye.

Dîn Baweriyeke Şexsî Ye, Ne Pênaseyeke Neteweyî Ye

Her çiqas dîn bi nasnameya kesane ve girêdayî be jî, divê ew ne hêmana herî girîng a nasnameya neteweyî be. Neteweya kurd ji kesên ku baweriya xwe bi dînên wekî îslam, êzidîtî, xirîstiyani, cihûtî û zerdeştî tînin pêk tên. Lêbelê, ev pirrengiya dînî divê nebe asteng ji bo yekîtiya kurdan. Neteweya kurd ne ji hêla ol, lê ji hêla ziman û çandê ve hatiye şekildan.

Baweriya ku divê dîn şekil bide nasnameya neteweyî tişteki xeternak e; ew dikare bibe sedema parçebûnê. Di pirtûka xwe ya "*Pevçûna Şaristaniyan*" de, Samuel Huntington (1996) ji xetereyên nasnameya neteweyî ya ku tenê li ser dînê ava dibe hişyarî dide. Huntington diyar dike ku sivilizasyonên ne tenê civakên dînî ne; ew bi çand, dîrok û nîrxên xwe yên hevseng têne naskirin. Bi heman awayî, neteweya kurd ne tenê civatek dînî ye; ew mileteke ku bi ziman, çand û dîrokê ve girêdayî hev e.

Ji bo gelê kurd, qebûlkirina cihêrengiya dînî ji bo yekîtiya neteweyî girîng e. Di vî warî de divê dîn weke çavkaniya hêzê bê dîtin, ne weke tiştê çewtîyê. Mînak, her çend Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê xwedî nîfûseke

cihêreng a olan be jî, nasnameyeke neteweyî ya hevpar wan dike yek. Bi heman awayî, divê neteweya kurd dewlemendiya xwe ya olî hambêz bike û yekîtiya ziman, çand û dîroka xwe biparêze.

Encam

Parastina zimanê kurdî ji bo parastina nasnameya neteweyî û xurtkirina yekîtiya di navbera gelê kurd de pir girîng e. Ziman ku bingeha mîras û nasnameyê ye, di çarçoveya têkoşînên dîrokî û nûjen ên kurdan de hesta berdewamî û serxwebûnê dide. Bi baştirkirina perwerde û standardkirina zimanê kurdî, kurd dikarin çand û nasnameya xwe ya neteweyî pêş bixin.

Di demên dawî de, têkilî û girêdana di navbera zaravayên kurdî de zêde bûye, ku ev yek hêviyê dide pêşerojê. Bi saya hewildanên tevgera perwerdehiyê, piştgiriya siyasî û torên çandî, zimanê kurdî dikare di serdema nû de zindî bimîne û roleke girîng di nasnameya neteweyî de bilîze. Xebat û şarezaiya têkoşer, akademîsyen û endamên civatê yên kurd dikare di vê armancê de bibe alîkar û ziman û çanda kurdî zindî bihêle.

Divê miletê kurd berî her tiştî qîmetê bide yekîtiya xwe. Her çend dîn ji bo nasnameya kesane girîng be jî, divê ew ne hêmana herî girîng a nasnameya neteweyî be. Neteweya kurd bi ziman, çand û dîroka xwe ve girêdayî ye, ev diyardeyên ku dîn nikarin ji hev cuda bikin. Hin komên di nava netewa kurd de ji mezhebên cuda cuda, bi taybetî jî hin komên ji mezheba êzidî, di lêgerîna cudaxwaziyê de xwe ji dîrok û çanda xwe qut dikin. Ev ne tenê van koman marjînalîze dike, lê di heman demê de nasnameya neteweyî ya kurd jî têk dibe.

Ji bo parastina xwe, divê kurd ziman, çand û dîroka xwe wekî bingehên rastîn ên nasnameya xwe ya neteweyî qebûl bikin. Dîn dikarin ji hev cuda bin, lê dîtina xaleke hevpar her gav sûdmend e. Qebûlkirina cudahiyan wek dewlemendî yekitiya di navbera dînan de xurt dike. Pêşeroja gelê kurd ne di egoîzma dînî de ye, lê di yekîtiya dîrok, ziman û çandê de ye.

REFERANS

Ahmad, I. (1994). *Jani Gal*.

Gunter, M. M. (2004). *Pirsgiriya Kurdî li Perspektîve*. Willey.

Gürbüz, F. (2016). *Religion and Identity in Kurdistan: Yazidi Perceptions of Kurdish Identity*. Palgrave Macmillan.

Hassanpour, A. (1992). *Zimanê Kurdî: Rolê Wê di Nasnameya Neteweyî û Şerî Polîtîkî de*. *Jurnalê Navendî ya Navîn*, 24(3), 409-423.

Hassanpour, A. (2012) *Introduction Kurdish: Linguicide, resistance and hope*.

Huntington, S. P. (1996). *The Clash of Civilizations and the Remaking of World Order*. Simon & Schuster.

McDowall, D. (1996). *Tarîxa Modern ya Kurdî*. I.B. Tauris.

Resid, T. (2011). *Em Bi Zimanê Xwe Kurd in*.

XIRISTIYANÎ Û TOLERANSA DÎNÎ DI CIVAKA KURDAN DE



Rêzo Faroyan

Rêberê civata kurdên xirîstiyani-protestan li Gurcistanê

Silav û rêzên xwe ji beşdarên hêja yê wê konferansê re pêşkêş dikim! Navê min Rêzo Faroyan e, ez rêberê civata kurdên xirîstiyani-protestan li Gurcistanê me. Ez dixwazim spasiya organîzatorên konferansê bikim ji bo ku derfet dan min ku ez li vir nerînên xwe bînim ziman. Her wiha ez dixwazim bi taybetî balê bikişînim ser rêgeziya xurt a konferansê û vîzyona organîzatorên wê.

Ez kurd im, kurê kurda me, wek her yekî ji we. Ez ji gelê xwe hez dikim, di xizmetê gelê xwe de me. Û her yek ji me dixwaze tiştekî baş û bikêr ji bo pêşeroja gelê kurd bike.

Ez dixwazim behsa rewşekê bikim ku em pirî caran pê re rû bi rû dimînin. Bi biyaniyan re ev têgihiştin heye: kurd ji aliyê dinî ve misilman û êzidî ne. Lê, kurdên xirîstiyani û kurdên cihû jî hene û xirîstiyani di nava kurdan de ne tiştekî nû ye. Pir kes wisa difikirin ku di van 20-30 salên dawî de kurd bûne mesîhî û bawerî an dînê xwe guhertine. Lê ne wisa ye. Kurd jî di nav wan kesan de ne ku Mizgînê³¹ bi xwe ji şagirtên Îsa Mesîh bihîstine. Di nav gelê kurd de agirê baweriya xirîstiyani jî wan demên kevnar heta roja îro hatiye parastin. Di serdemên cuda yê dîrokê de, ev agir carinan geştir, carinan kêmtir bûye.

³¹ Incîl, Peymana Nû, Mizgîn - amadekar

Li ser kurdên xirîstîyan zêde çavkaniyên dîrokê ne ghiştiye destê me. Lê ev bes e ku kurd wek xirîstîyan neyên înkarkirin.

Di navbera zanyar û dîrokzanan de lihevkirinek xurt heye ku Medî bav û kalên kurdan in. Li gorî gelek lêkolîneran, ew kesên ku ji bo peristina Îsa hatibûn, medi bûn³². Medî, Partî û Êlamî û rûniştvanên Mezopotamyayê hatin Orşelîmê ji bo ku ji Xwedê re biperizin³³. Beriya her tiştî ev dane nîşan dide ku xirîstîyanî di nava gelê kurd de ne tişteki nû ye.

Xirîstîyanî ji Asya û Rojhilata Navîn belavî Ewropa û cîhanê bûye. Heta sala 600an, dinê Mesîhî li beşek girîng a Rojhilata Navîn, Asyaya Navîn û Afrîkaya Bakur belav bibû. Bêguman bi awayekî xwezayî, xirîstîyaniyê bandor li kurdan kir, ji ber ku gelek kurd li wê herêmê dijiyan û toven baweriya xirîstîyanî beriya hezar salan di nav gelê kurd de hatiye çandin.

Jixwe di dawiya sedsala 1emîn de, Mizgînî li herêmên kurdan ên li bakurê Mezopotamyayê (Cizîr û Adiabene³⁴) tê bihîstin. Dîroknasê Kurd Letif Memmed Burkî, li ser rastiyeke dîrokî diyar dike ku xirîstîyaniyê ji sedsala 1emîn û pê de dest bi derbasbûna nav hawîrdora kurdan kiriye û hin eşîrên kurdan ji zerdeştîyê derbasî xirîstîyaniyê bûne.

Kevneşopiyek kevnar, ku ji hêla Eusebius Qeyserî³⁵ ve hatî tomar kirin, şahidî dike ku Thomayê Şandî³⁶ di nav partan û medan de mizgînî daye û li gorî çavkaniyên Kiptî³⁷, Endrawisê Resûl³⁸ jî ji bav û kalên kurdên nûjen re mizgînî daye. Li Albanyaya Qeqqasyayê³⁹, xirîstîyanî ji aliyê Şandiyê Thaddeus ve hatiye dayîn.

³² Mizgîniya Metta (hejmarên berî du xalan beşan û ayetan destnîşan dikin), 2:1-2,10-11.

³³ Karên Şandîyan (Hem Încîla Metta û hem jî Karên Şandîyan pirtûkên Peymana Nû ne), 2:7-9.

³⁴ Adiabene – mîrtîyeke biçûk û kevnar e ku li bakurê Mezopotamyayê (Başûrê Kurdistanê), di navbera çemên Zapa Mezin û Zapa Biçûk de ye, û navenda wê li Erbelayê (niha Hewlêr) ye.

³⁵ Eusebiusê Qeyseriyê (îng.: Eusebius of Caesarea) (nêzîkî 260/265 PZ – 30ê Gulana 339 PZ), ku wekî Eusebius Pamphilus jî tê nasîn, dîroknas, şîrovekar û polemîstekî xiristîyan ji parêzgeha Romayî ya Sûrîye Palaestina bû. Ew di dora 314 PZ de bû keşîşê Qeyseriya Deryayî – *amadekar*

³⁶ Thomayê Sandî – Thomasê Resul. Yek ji 12 şagirtên Îsa Mesîh.

³⁷ Kiptî an Qiptî, gelê kevnar ê Misrê ne. Piştî fethîkirina Misrê ji aliyê Îskender ve û damezrandina bajarê Îskenderiyê, ew bi çanda Helenîstîk re têkilî danîn. Di serdemê Romayîyan de, di sala 46 PZ de, gelê Qiptî bûn xiristîyan – *amadekar*

³⁸ Endrawis Resul - Thomayê Sandî / Thomasê Resul. Yek ji 12 şagirtên Îsa Mesîh.

³⁹ Albanya, Albanyaya Qeqqasyayê, dewleteke dîrokî ku li Qeqqasyayê hatiye avakirin. Piştî hilweşîna Împeratoriya Îskenderê Mezin di dora sedsalên 4-3an berî zayînê de hate

Jixwe di sed sala 2yemîn a pişti zayînê de, li Edessa (bajarê Rihayê yê îro) civatek xirîstîyan hebû. Di dawîya sed sala 2yemîn de, Mîrekiya Edessa bû dewleta yekem di cîhanê de ku xirîstîyanî wekî dînê fermî hate ragihandin, lêbelê, Edessa di demek kurt de bû beşek ji Împeratoriya Romayê ya pagan.

Agahdarî hene ku xiristîyanî di sed sala sêyemîn de li axa Başûrê Kurdistanê ya îroyîn bi bandor belav bûye. Di wê demê de, waîzê Ortodoks Mar Mari ji Edessa, di nav mîr û rûniştevanên bajarê Şehrgart (Şarikert), ku dikeve navbera Dihok û Hewlêrê de, mizgîniya xirîstîyanîyê da. Li ser xaka Kurdistanê navendên xirîstîyanîyê Edessa, Nisêbîn, Diyarbekir, Arbela, Karka de Bet Seloh (niha bajarê Kerkûkê) bûn.

Di nav bav û kalên kurdên îroyîn de ku li van deran dijiyan, di sed sala 6an de, zerdeştî bi baweriya xirîstîyanî hat guhertin, bi vî awayî ku êdî di sed sala 7an de nifûsa navendî ya Kurdistanê bi giranî xirîstîyan bûn, lê zêdetir belavbûn û bihêzbûna xirîstîyanîyê di nav kurdan da bi êrîşa îslamê hat astengkirin.

Beşek girîng ji kurdên xirîstîyan di sed salên navîn de hîn nestûrî bûn, ku vê rastiye di sed sala 10an de dîrok nas û erdnîgarê ereb el-Mesûdî, û di sed sala 13an de jî ji hêla gerokê Venedîkî yê navdar Marco Polo ve hatiye îsbatkirin: «... Li van çiyayan Kard dijîn, ew Nestorî û Yaqûbî ne, lê di nava wan de ereb jî hene, ku ji Muhammed re dua dikin.»

Heta dawîya sed sala 19an xirîstîyanî di nav kurdan de hêdî hêdî dîtêmire, lê di sed sala 20an de pêvajoya vegera kurdan bo xirîstîyanîyê dest pê dike.

Di van salên dawî de gelek kurdên bi eslê xwe misilman bûne xirîstîyan. Daniyel Elî, kurdekî xirîstîyan ê navdar ku di sala 1995an de bû katolîk, du pirtûk li ser terikandina îslamê weşandiye. Mecîd Mihemed Reşîd ji bo kurdên berê yên misilman toreke ava kir. Niha zêdetirî 2000 kes di vê torê de ne.

Di salên 1990î de, belavbûna xiristîyanîyê di nav gelê kurd de bêtir pêş ket û li gelek welatên Yekîtiya Sovyetê ya berê, wek Rûsya, Ermenistan û Gurcistanê, şiyarbûn dest pê kir. Di bingeha xwe de ew şiyarbûneke

damezrandin, û di sed sala 8an a piştî zayînê de ji hêla Xîlafeta Erebe ve hate dagirkirin. –
amadekar

Mizgînî-Protestanî bû. Li Ermenistan û Gurcistanê ji salên 90î heta îro bi hezaran kurdên êzidî bûne mesîhî. Ev yek ne bi zorê, li gor daxwaza her kesî pêk hat.

Zêdetirî 20 sal in li Gurcistanê Dêra Mizgîniyê ya kurdan heye. Erê, em xiristiyanên kurd gelek caran bi zext û heqaretê re rû bi rû dimînin. Bi salan e, û heta îro jî, kurdên xiristiyan wekî dînfiroş hatine dîtin. Lê gelo, kî amade ye di berdêla dînê xwe pereyan werbigire? Ez difikirim ku tu kes! Lê ev gotin gelek caran ji aliyê kesên ku di vê mijarê de xwedî perwerdehiya têr nînin tê gotin. Me baweriyek zindî qebûl kir, û ev baweriya xirîstiyaniyê îro ji bo gelê min xizmetê dike. Em vegeriyan ser baweriyê bav û kalên xwe, û ev pejiwandin ne tenê li Gurcistanê, lê îro li seranserê cîhanê diqewime.

Lê şikir ji Xwedê re, niha rewş ber bi başiyê ve diçe. Çavên kurdan vedibin û dîtina wan a cîhanê diguhere. Bi saya Komeleya Kurdên Gurcistanê "Ronahî", çalakiyên hevbeş tene lidarxistin ku kurd (xiristiyan, misilman, êzidî) cejnên xwe yên neteweyî bi hev re pêroz dikin.

Îro ji me xirîstiyanan re Xwedanas tê gotin. Wek Dêra Mesîhî ya Kurd, em hewl didin ku zimanê kurdî bi qasî ku ji destê me tê biparêzin. Em bi kurdî Mizgîniyê didin, li dêrê bi kurdî distrên, dîlanên kurdî digirin, bi kêfxweşî beşdarî cejnên netewî yên wek Newrozê dibin.

Di dêra kurdên Gurcistanê de gurcî hene ku bi kurdî distirên, fêrî zimanê kurdî dibin û direqisin. Ji ber ku em qîmetê didin gelê xwe, zimanê xwe, çanda xwe.

Kurdên xirîstiyaniyê beşdarî projeyên alîkariya mirovî dibin: Di navbera salên 2014 û 2019an de, em bi rêkûpêk wekî tîm çûn kampên penaberên êzidî li Tirkîyeyê da ku alîkariyan bigihînin. Di sala 2023an de li Tirkîyeyê erdhejek çêbû. Weke dêra kurdan me çar caran serdana wan deverên ku kurdên me lê dijîn kir û alîkarî da wan.

Çima me ev kir? Ji ber ku ew gelê me ne. Dibe ku hûn êzidî, misilman, cihû an her kesekî din bin; eger hûn xwe kurd dihesibînin, hûn kurd in.

Ez difikirim, eger em di nava aşî û yekîtiyê de tevbigerin em dikarin hîn zêdetir xizmetê ji bo gelê xwe û çanda xwe bikin. Ez bi vê peyvê bawer dikim: Serê sera Xwedê ye!

Spas ji bo vê derfetê. Ez bi kurdbûna xwe, bi xirîstiyaniya xwe serbilind im!

ROL Û REWŞA JINA KURDAN LI QEFQASYAYÊ



Xaylaza Reşîd
Helbestvan⁴⁰

Beşdarên hêja û qedirbilind, îro ji bo me rojeke dîrokî ye, û em pir kêfxweş in ku hûn beşdarî vê konferansê dibin.

Emirjiyana jina kurd ya Qefqasyayê mijareke balkêş û berfireh e lê ez ê bi kurtasî li ser çend xalan bisekinim.

Jinên kurd her tim li Rojhilata Navîn û Qefqasyayê bi jêhatîbûna xwe hatine naskirin. Di seranserê dîrokê de, wan rolên girîng lîstine, li kêleka mêran li ser hespan şer kirine û erd û herêmên xwe parastine.

Ez dixwazim bi taybetî li ser rewşa jinên kurd li Qefqasyayê ji salên 1920an vir ve bisekinim.

Di serdema Sovyetê de, hikûmetê derfet da me ku em mîna mêran hîn bibin û pêş bikevin. Belê, ev gavên girîng bûn ji bo jinan. Pîrî caran keç nedîçûn dibistanê an jî nehatin şandin, lê mamoste dihatin ber derî û zarokan ji malên wan hildigirtin. Carinan ev yek bi zorê dikirin, zarok dibirin dibistanê û li ber textê zanîne didane sekinandinê.

⁴⁰ Xaylaza Reşîd Mirzoyeva (14.06.1964, gundê Pampa Kurd (niha Sîpan) Ermenistan) Çend pirtûkên wê yên helbestan hatine weşandin. Li Gurcistanê diji.

Lê di nav civaka me da, dîsa hîn derfet li ber jinan kurd dadayî bû, jin bi karên civakî re mijûl nedibûn, bi karên malê va girêdayî bûn, xebata herî giran diket ser milê jinan. Di Ermenistanê da karê kolxozê dikirin, pez û çêlek didotin, debar tov dikirin, gurz girêdidan û didane ser pişt a xwe, lod dadanîn, qelax çêdikirin.

Em vê jî bêjin ku her jineke me ji pênc zaran kêmtir ne dianîn, dayîkê pirowled bûn, şevên wan bê xew bûn, xwedîkirina wan zarokan, li ber tendûra çî zehmet bû...

Îzna jinê tune bû li ber mêran nan bixwarana, bi dengê bilind xebardana an li rex mêvanan rûniştana. Jin tevî tu pirs û meseleyan nedibûn. Bi kurtasî jin nebûn xwedî maf.

Jinên Tîblîsê bajarvanî bûn, lê qeder û mafên wan wek jinên kurd ên li Ermenistanê bûn. Ew tev mêran diçûn xebatê, li vir kolan paqij dikirin, demê wan zêde nedima ku zarokên xwe baş perwerde bikin û bidin xwendinê.

Ji ber bêkarî û ne xwendinî bi hejmareke ne kêm mîr diketin rîyên krîmînal û dihatin zindanîkirin. Zehf dayikên me bi tûrikê xwarinê va sal donzdeh meha ber deriyê kela (girtîgehê) bûn. Ev jî beşek ji dîroka me ye.

Doktor Qasimlo gotiye, ji min ra çayeke qaçax bînin, bira wek bextê jina kurd reş be û wek jina kurd şîrin be. Gelo çima, ji bo çî barê jina kurd wisa giran bû? Her pirseke girîng dihate ser namûsa jinê. Keçik çardeh, ponzdeh salî didane mîr, emrê wan a ku ji hîvdeh salan derbas dibû, heta ku bibe bîst salî, civakê digot, ew qîz pîr bûne, di mala bavê xwe da mane û ji tîrsa gilî û gazin û xeybê der cînan, keçik zû didane mîr. Bi kurtî û kurmancî çî pîrsgirêk hebûn, di serê jinê reben da dişkêst.

Her pîrsgirêk, her şuxulê giran ser pişt a jinê bû, her tişt, şîn, şayî, hal zewac, tev ji jinan dihate xwestinê.

Îro, jinên me hinekê serbest in; dixwînin. Bijîşk, mamoste, endezyar, wênesaz û nivîskarên me hene. Jinên me bûne helbestvan û hunermend. Lê îro, pîrsek din derketiye holê. Jinên me yên li Gurcistanê êdî li malê bi zimanê xwe yê dayikê naaxivin, ew zarokên xwe bi zimanê biyanî perwerde dikin.

Dayik û malbatên îroyîn, bawer dikin ku pêşeroja zarokên wan bi perwerdehiya bi zimanê biyanî ve girêdayî ye, ji ber vê yekê giringiya

zimanê xwe yê dayikê paşguh dikin. Nifşên nû gav bi gav ji zimanê dayikê dûr dibin. Sedema vê jî nebûna hişmendiya netewî û bêdewletbûnê ye.

Ji bo ku xwe ji van dîtinên şaş rizgar bikin, têkoşîn pêwîst e. Zarokên me pir jêhatî, jîr, zîrek in û ew dikarin bi serbestî gelek zimanan fêr bibin.

Zarokek heta heft saliya xwe, di paşla diya xwe de zimanê xwe fêr bibe, ew êdî dibe hîmeke xurt, û tu carî hilnaweşe, zimanê wan êdî naşikê.

Dibistan ji malbatê dest pê dike.

SAZIYÊN SIYASÎ, CIVAKÎ Û ÇANDÎ YÊN KURDAN DIVÊ BERAMBERÎ KURDÊN QEFQASYAYÊ ÇAWA TEVBIGERIN?



Salih Kevirbirî
Nivîskar, rojnamevan

Çend sal beriya niha min di quncika xwe ya rojnameya Rûdawê de, çapa ewropayê de nivîseke bi sernavê «Li Kurdistanê kolana Nadir Nadirov»⁴¹ nivîsek nivîsandibû û li gorî daxwaza dilê xwe ji rêveber û rayedarên Hikûmeta Kurdistanê Federal xwestibû ku navê akademîsyen û profesorê navdar, rehmetiyê Nadir Nadirov li kûçe, kolan yan jî meydanekê deynin.

Bi rastî jî gava ji min re bibêjin yek ji xewn û xeyalên te çi ye, ez ê bibêjim gava li kûçe û kolanên Hewlêr, Silêmanî, Dihok, Mehabad, Diyarbekir û Batmanê navên kesayetiyên wekî Qanatê Kurdo, Heciyê Cindî, Zeyneba Îbo, Eznîva Reşîd, Xelîl Mûradov, Casimê Celîl, Erebe Şemo, Wezîrê Nadirî, Eliyê Evdirehman, Samend Siyamendov, Nado Mehmûdov, Şamil Askerov, Nadir Nadirov, Keremê Anqosî, Kinyazê Îbrahîm, Şekroyê Xudo, Karlanê Çaçan, Çerkezê Reş, Karapetê Xaço, Egîdê Cimo hebin.

⁴¹ <https://www.rudaw.net/kurmanci/opinion/16012014>

Herwiha li kûçe û kolanên Moskovayê, Êrîvanê, Tiflîsê, Almatayê, Bîşkekê, Bakûyê û Krasnodarê navên Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Feqiyê Teyran, Mem û Zînê, Goran, Hejar Mûkriyanî, Şakiro, Zembîlfiros, Derwêşê Evdî, Meyan Xatûnê werin nivîsandin.

Kurdên Qefqasyayê herdem xwe beşeke ji neteweya kurd dîtine.

Gava ez dibêjim kurdên Qefqasyayê, armanc û merema min tevahiya kurdên Sovyeta berê ye. Çimkî hemû ji Qefqasyayê belav bûne.

Hemû xizmeta çand, huner, edebiyat û zimên ku bi salan e hatine kirin, ne tenê ji bo xwe ango ji bo herêma ku lê dijîn kirin, ji bo tevahiya neteweya kurd hatine kirin.

Piştî hilweşîna Sovyeta Sosyalîst, ji ber ku li welatê cuda cuda dijîn, li her derê taybetmendiyan wan ên cuda çêbûne. Rewşa wan cuda cuda ye. Li Ermenistanê cuda ye, li Gurcistanê cuda ye, li Qazaxistan û Qirgizistanê cuda ye, li Rûsya û Ûkraynayê cuda ye, li Ewropayê cuda ye. Berê zêdetir wekî komên mezin li ba hev bûn, nêzîkî hev bûn. Lê hilweşîna Sovyetê kir ku ji hev belav bibin, perçe bibin, ji hev dûr bikevin. Loma jî divê li her derê ku lê dijîn, li gorî taybetmendiya wî cihê em bala xwe bidin ser wan. Kurdên Qefqasyayê di van 30 salên dawî de terkeserê dinyayê bûne. Ji ber vê yekê hewcedariya wan bi alîkariyê heye.

Di dema Sovyetê de kurd li Ermenistan û Gurcistanê li ba hev bûn. Li Qazaxistan û Qirgizistanê jî li ba hev bûn û di nav hev de bûn. Mesela li bajarên Celalabad û Oşa Qirgizistanê wekî komeke mezin li ba hev bûn, hema bêje hemûyan hev nas dikir. Wekî malbat û eşîrekê bûn. Hilweşîna Sovyetê û şerê navxweyî yê ozbek û qirgizan bû sedem ku piraniya wan terka Celalabad û Oşe bikin û berê xwe bidin bajarên Bîşkek, Çîmkent, Taraz û Almatayê.

Bo nimûne kurdên Ermenistan û Gurcistanê di van 30 salên dawî de ji sedî 75-80 cih û warên xwe terikandine. Di dema Sovyetê de li seranserê Rûsyayê behsa 5 hezar kurdan tê kirin. Lê piştî hilweşîna Sovyetê niha bi awayeke ne fermî behsa 200-250 hezar kurdan tê kirin. Hejmara herî kêmtir ku tê gotin ne kêmtir 150 hezarî ye. Ev tenê hejmara kurdên Rûsyayê ye. Ev kurd ji ku hatine? Helbet ji asîmanan nehatine! Ji bakur, başûr, rojava û rojhilat jî nehatine. Hemû kurdên Ermenistan, Gurcistan û Asyaya Navîn in.

Helbet hinek kurd ji bo bazirganî û xwendinê ji Kurdistanê jî hatine, lê hejmara wan ne zêde ye û em behsa wan nakin.

Gava ev kurd terka cih û warên xwe dikin, gelekî zêde belav dibin. Li gund, bajar û bajarokan dijîn ku hejmara van gund, bajar û bajarokan bi sedan in. Kurdên ku 40 sal berê li seranserê Sovyeta berê angî li Qefqasya û Sovyeta berê bi dehan gund, bajar û bajarokan dijiyan, îro bi sedan jîngehan belav bûne ku hejmara van gund, bajar û bajarokan nayê zanîn jî.

Ji ber vê yekê kurdên Sovyeta berê hewceyî alîkariyê ne. Bi taybetî jî hewcedariyê alîkariya manewî ne. Ji aliyê madî angî aborî ve, rewşa wan ji rewşa gelek beşên welêt baştir e. Em behsa vê yekê nakin. Lê di vî warî de jî hemû kurdên dinyayê dikarin bi kurdên Sovyetê re têkilî, şîrîkatî û hevkarîya bazirganî û aborî jî bikin.

Di vê navberê de asîmîlasyon jî bi lezgînî berdewam e. Em bibêjin kurdên Sovyeta berê asîmîle nabin, nebûne em ê xwe bixapînin. Li gorî 15-20 salan gava em rewşa wan didin ber çavên xwe, em dibînin ku asîmîlasyoneke gelekî mezin heye û wisa berdewam bike heta 15-20 salan wê nîfşê nû bihele û here. Wê tenê bi mezinên xwe re bi rûsî, ermenkî, azerkî û gurckî biaxivin.

Saziyên kurdan divê pêwendiyên xwe li ser van xalan û li ser vê rewşê xurt bikin. Divê pêwendiyên wan li ser esasê netewebûnê be, ne li ser esasê hizbayetî û siyasîyê be.

Nav ne girîng e; hizbayetî angî partî û siyasîyên kurdan, partî û rêxistinên wan pêwendiyên xwe ne tenê bi kurdên Sovyetê re, bi hemû kurdan re li ser alîgîrbûnê, li ser tereftarbûnê çêdikin. Mixabin netewebûn ji bo wan zêde ne girîng e. Hemû li pey alîgîrbûnê û xurtbûna berjewendî û siyaseta xwe ne. Mesela di şahîyan de, di semîneran de, di konferansan de, hewla hemûyan li ser xurtkirina rêxistina wan bixwe ye. Çiqas girîng jî be; hizir, feraset û bala wan ne li ser wan şahî, konferans, semîner û mijarên wan e. Heyf û mixabin gava tu behsa hizir û hizbayetiya wan nekî, di çapemenî û medyaya xwe de zêde behsa te nakin.

Di vî warî de çend saziyên çapemenî û medyayê ne tê de, mixabin rewş karesat û kambax e.

Mesela li Başûrê Kurdistanê bi salan e ku çend zanîngeh hene ku rola wan gelekî girîng in. Li Rojavayê Kurdistanê vedibin. Li Bakurê Kurdistanê

çend zanko hene di hinek beşan de – sînordar jî be – kesên tê de kar dikin dikarin hinek tiştan bikin. Li gelek deveran di warê kurdolojiyê de hewldan hene, sazî û dezgehên akademîk hene, li seranserê dinyayê bi têra xwe enstîtuyên kurdî hene. Ew dikarin ji bo kurdên Sovyetê gelek karan bikin.

Divê sazî û dezgehên kurdan bi meyleke pozîtîf dêhn û bala xwe bidin kurdên Qefqasyayê. Dikarin her sal 40-50 şagirtên kurdên Qefqasyayê bînin û perwerde bikin. Beramberî vê jî dikarin 40-50 şagirtên xwe bişînin Qefqasyayê, Rûsyayê û Asyaya Navîn. Bi vî awayî wê ev têkilî û danûstandin xurt bibin û pira di navbera welêt û Qefqasyayê de jî qewîntir bibe.

Mesela di serdema Sovyetê de kurdoloji hebû û xurt bû. Gelek karên hêja hatin kirin. Lê mixabin îro li welatên Sovyeta berê kurdoloji ber bi mirinê ve diçe. Sazî û dezgehên kurdan dikarin dest bavêjin vê yekê û dîsa xurt bikin û van karan bikin ronahiya çavên me. Berê statuya kurdan tunebû, aboriya wan tunebû lê niha hem statuya kurdan – bi taybetî behsa Başûr dikim – heye, hem jî aboriya wan heye. Lê mesele ev e: Ev sazî û dezgehên hikmî û taybet çiqas dixwazin bikevin bin vî barî?

Li Sovyeta berê potansiyeleke mezin heye, lê hewcedariya wan bi piştgiriya ye. Bi rastî jî divê em vê pirsê hem ji xwe bikin, hem jî ji rayedarên siyasî yên Başûr bikin: “Gelo çima heta niha 40-50 keç û xortên kurdan ji bo xwendinê neşandine Sovyeta berê û çima 40-50 keç û xortên kurdan li cem xwe nedane xwendin?” Gelo ev gelekî zehmet e? Na! Helbet ji vê yekê hêsanîr tiştek tune ye!

Ev derfet gava mirov bixwaze li Bakur jî hene. Mesela şaredarî ango belediye bixwe jî dikarin gelek tiştan bikin. Dikarin di gelek festîvalan de kotayeke pozîtîf ji kurdên Qefqasyayê re veqetînin. Mesela berê, car çêbûye ku gazî 2-3 nivîskar, lêkolîner û hunermendên wan kirine ku ez bixwe di nav wan karan de bûme û şahidê van karan im. Baş tê bîra min gava cara yekem, me Mîrê Bilûrê Egîdê Cimo, dengbêjê navdar Feyzoyê Rîza û pandomîmkarê navneteweyî Arsên Polatov anî Stenbolê û ji wir jî bir Festîvala Diyarbekirê ya Çand Hunerê. Paşê çend carên din hatin. Apê Keremê Seyadê bilbilê Radyoya Êrîvanê, Dîlovanê Reşîdê Baso û gelekên din bi hewldanên wiha hatin bûn mêvanê miletê xwe û welatê bav û kalên xwe. Niha rewş baştir e, derfet û mecal zêdetir in, mirov dikare salê sed kesên wiha hêja bîne û beşdarî van çalakîyan bike.

Mesela dikarin rojên çand û hunerê çêkin, lê bi hev re, hevbeş çêkin. Hunermendên xwe bişînin Qefqasyayê, hunermendên Qefqasyayê bînin ba xwe. Bi dehan wênesaz ango resamên gelekî serkeftî hene, dikarin ji bo wan li Hewlêrê, li Mêrdînê, li Diyarbekirê, li Batmanê, li Qamîşloyê û li Mehebad û Urmiyeyê pêşengehan çêkin. Dikarin li herdu aliyên ji bo nivîskaran rojên xwendin û înzeyê li dar bixin, ji wan re semîner û gotûbêjan çêbikin.

Têkiliyên çand, huner û edebiyatê di vî warî de gelekî girîng in.

Meseleya alfabeyeke hevbeş gelekî girîng e. Îro li seranserê dinyayê ji bilî kurdan, miletekî din heye ku 4-5 alfabeyên cuda bi kar tîne? Na, tune ye. Latîniya me heye, aramiya me heye, kîrîliya me heye, îbrankiya me heye, gurckiya me heye û ermenkiya me heye. Kurd bi tevahiya van alfabeyan dinivîsin. Ev ne kambaxî û sosreteke giran be, çi ye?

Mirov dikare di vî warî de sudeke baş ji zanyarên Sovyeta berê wergire û dermanekê ji vê birînê re bibîne...

Têkiliyên bi kurdên Sovyetê re perçe perçe ye, divê ev têkilî yekpare be, xurt be û stratejîk be. Bi awayeke giştî kurdên Sovyetê bi neteweya xwe ve girêdayî ne, lê 15-20 sal paşê gava nîfşê nû wînda bû, ev girêdan jî wê qels û lawaz bibe û wînda bibe û here...

KURDÊN HERÎ ROJHILATÎ YÊN CÎHANÊ. ANTROPOLOJÎ, DÎROK Û ÇANDA KURDÊN XORASANÊ



Javad Rezaei

Mamoste li zanîngeha Meşhedê⁴²

Hossein Naseri (Hîwa Massih)

Pisporê siyasetê⁴³

Cewher

Dema ku behsa diyasporaya kurd tê kirin, hin kes nifûsa mezin a kurdan ji welatê wan Kurdistanê cuda dihesibînin. Zêdetirî 1.5 milyon kurd li bakurê rojhilatê Îranê, li du parêzgehên Xorasana Bakûrî û Xorasana Rezewî dijîn. Her çiqas hin lêkolîn destnîşan dikin ku dîroka bicihbûna kurdên Xorasanê ji koçberiya mezin a ji sînorên rojhilatê Tîrkiyeyê di sedsala 16an de dest pê kiriye jî, vegotina dîrokî ya niha li ser bicihbûna zêdetirî 40 000 malbatên koçer ên Kurd li çiyayên Xorasanê di dehsalên pêşîn ên sedsala 17an de disekine. Îro neviyên wan koçeran bi ziman, çand û nasnameya xwe li zêdetirî 30 bajarok û 2000 gundên seranserê

⁴² Javad Rezaei, Ph.D li TEFL, Mamosteyê Zanîngehê, Meshed, Îran. rezaei.jvd@gmail.com

⁴³ Hossein Naseri (Hiwa Massih), Mastir li Siyaset u Çalakvanê Çanda Kurdî, Bijnort, Îran. hosseinnaseri74@yahoo.com

parêzgehan dijîn. Armanca vê gotarê ronîkirina demografi, dîrok, çand û erdnîgariya kurdên herî rojhilatî yê cîhanê li vê beşa erdnîgariyê ye.

Destpêk

Xorasan parêzgehê herî kevn û mezin li bakûra rojhilata Îranê ye ku bi sedan sal şûnwarê etnîkên cûr bi cûr bûye, û yê ji wan etnîkan ku rola herî mezin li dîrok û erdnîgariya vê deverê lîstîye, kurd in. Kurdên Xorasanê ku bi giranî wek “Kurmanç” tên naskirin, karine ziman, çand û kevneşopiyên xwe yê dê û bavan biparêzin. Di van dehsalên dawî de, bi sîdwergirtina ji firsetên ku di rewşa cîhanî û pêşkeftinên teknolojîk de derketine, hewl dane ku bi hogir û nijadên xwe yê li seranserê cîhanê re têkilî daynin û ezmûn û rezervên xwe yê zanistî û çandî ji bo parastina ziman, nasname û çanda xwe ya kurdî bikar bînin û zimanê xwe biparêzin.

Tevî ku amarên rast û fermî di derbarê hejmara kurdên Xorasanê de li ber dest nînin, lê tê texmînkirin ku zêdetirî 1.5 milyon ji wan, li zêdetirî ji 30 bajar û bajarok û nêzikî 2000 gundên seranserê Xorasanê Rezewî û Xorasanê Bakûrî dijîn. Bajarên girîng ên Meşhed, Çênaran, Qûçan, Dergez, Esfarayên, NeYşabûr, Şîrwan, Bojnurd, Aşxane, Sebzêwar, Kelat-ê-Nadêrî û nêzî 20 bajar û bajarokên din, îro li Xorasanê wargehên girîng ên kurdan in.

Hevbeşiyên nijadî, olî û çandî yê kurdan bi niştecihên din ên van deveran re bûye sedem ku di hemû sedsalên borî de hema bêje tu pevçûn di navbera wan de çênebe; berevajî vê, têkiliyên malbatî û sosyal di navbera wan de pêş ketiye.

Kurdên Xorasanê bi sedema rola xwe ya girîng di danîna sînoran û parastina sînorên rojhilatê Îranê û performansa serkeftî di vî warî de, ji mêj ve bi mêrxasî û niştimanperweriya xwe dihatin naskirin. Îro zarokên wan ne tenê karîbûn xwe bi jiyana nûjen û pêdiviyên wê re biguncînin û bibin çavkaniya bereket û bandorên girîng ên zanistî, hunerî, çandî û aborî, pê re di warê debarê de jî, bi giştî di rewşeke baş de ne.

Dîrok û Erdnîgarî

Li ser hebûna kurdên li Xorasanê du vegotinên dîrokî yê girîng hene. Çîroka yekem hebûna kurdan di sedsalên destpêkê yê îslamî de vedibêje, ku hema hema kêmbi belgeyan tê piştgirî kirin. Çîroka duyemîn, ku çîroka dîrokî ya serdest û belgekîrîtir e û xwedî delîlên xurt û nayên înkarkirin e, qala tevgera dîrokî ya kurdan ji herêmên rojavayê Îranê û rojhilatê

Tirkîyeya îroyîn û herêmen Şamat û Şamê dike. Muhacireta kurdan ber ve bakurê Xorasanê di nîvê yekem a sedsala 16an û di sedsala 17an de ye, ango di serdema Sefewîyan de. Ev her du rîwayet li jêr hatine vegotin.

Çîroka yekem ku li ser hebûna kurdan li rojhilatê Îranê ye, ji bilî çend bûyeran, di pirtûkên dîrokî de bi berfirehî nehatiye gotin. Her çend di sedsalên destpêkê yên îslamê de di pirtûkên erdnîgariyê de bi kurdî gelek nav hene, wek Kurdmahlah (taxa kurdan), Kurdxane (mala kurdan), Kurdkûy (taxa kurdan), Ekrad (Ekrad pirjimariya kurda ye), Gund (gundê kurdan), Ekrad Dervaze (dergehê kurdan)...

Yek ji belgenamên dîrokî ku navên wiha di nav xwe de dihevin, pirtûka "Erdnîgariya Dîrokî ya Hafîz Ebroyê Xewafî" ye ku di sedsala 9an a Hicrî de, bi qasî sedsalekê beriya tevgera sereke ya dîrokî ya kurdan ber bi Xorasanê ve hatiye nivîsandin.

Dîroknasê binavûdeng ê sedsala çaran, Elî İbnî Huseyîn Mesûdî jî Xorasanê weke yek ji wargehên kurdan dide nasîn.⁴⁴ Her wiha İstexrî erdnasê mezin ê hevdem ê Mesûdî jî di danasîna xwe ya li ser herêma Qehistan û Tebes a Xorasanê de behsa hebûna kurdan li van deveran dike.⁴⁵ İbnî Hewqel gerok û erdnîgarê navdar ê ereb ê sedsala 4an a Hicrî, di danasîna demografiya gelên Îranê de, behsa dever û bajarên Xorasanê, bi taybetî deverên derdora Neyşabûrê, ku havîngeha zozanên kurd bûn, dike: "Xwediyên deve û pez li wir dijîn".⁴⁶ Her wiha behsa gelek cihên Xorasanê yên ku paşgira/pêşgira kurd/ekrad lê heye û niştecihbûna ekrad di nav de ye. Wan deveran wek: "Ji Neyşabûrê heta dawîya Xorasanê li aliyê Qomesê, gundê ekrad li nêzîkî Esedabad Heft Manzil û ji gundê ekrad heta Damqanê pênc mal (qereqol)..."⁴⁷ tên tarîfkirin.

Emîr Têmûrê Gorkanî 736-807 hicrî / 1336-1405 mîladî) jî dema ku li Xorasanê digihêje Qûcanê, di seyahet û danasîna şerên xwe de behsa hebûna mîrên mîrxas û rîd û eşîrên kurdan dike, ku li ber fermanê serî neditewandin. Ew wisa dibêje: "Dema ku ez gihîştim Quçanê, min zîlamên dirêj û bi hêz dîtin... Bi çavên rovî û porê şêrîn... ku bi zîmanekî ne farisî û

⁴⁴ Mesûdî, Elî bîn Huseyn, El-Tenbiyyah û el-Eşref, ji aliyê Ebdullah İsmâil El-Elewî, Dar el-Sawî, Beyta, Qahîre ve hatiye rastkirin. Qahire(Misir-Egypt), rûp. 7.

⁴⁵ İstexrî, Ebû İshaq İbrahîm, El-Meselek û Memalek, ji aliyê Îrac Efşar, Weqfa Ewqafê ya Efşar, 1347, Tehran, rûp. 216.

⁴⁶ Kitêba gera İbnî Hewqel, cild 2, tefsîra Neyşabûr, 180.

⁴⁷ Kitêba gera İbnî Hewqel, cild 2, tefsîra Neyşabûr, rûp.186.

ne jî erebî diaxivîn û derket holê ku ew kurd in û ew ji Kurdistanê koç kirine û li Xorasanê bi cih bûne”.⁴⁸

Her wiha di hin nivîsên dîrokî de behsa helbesteke helbestvanekî navdar ê ereb tê kirin û tê de Ebû Muslim Xorasanî ku di sedsala 8an de di dîroka îslamê de leşkerekî mêrxas ê navdar bû û di helbesta xwe de kurdûna Ebû Muslim sûcdar dike. Vegotinek li ser helbesteke helbestvanê dîwanî Mensûr Ebû Dalame heye ku tê de Ebû Muslim bi kurdan re hatiye girêdan.⁴⁹ Ev yek nîşan dide ku kurd bi qasî hezar sal beriya koçkirina wan a sereke ji sînorên rojavayê Îranê û sînorên rojhilatê Anatoliyê li Xorasanê bûne.

Di çîrokeke din a dîrokî de, ku helbestvanê ereb De'bil Xezayî, ku bi mebesta hevdiîna Elî İbnî Mûsa El-Reza çibû Xorasanê, hatiye gotin ku wî li nêzîkî Neyşabûrê (Renceber) bi komek ji ekradiyan (kurdan) re hevdiîna pêk aniye⁵⁰.

Di encamê de, xuya ye ku her çend belgeyên ku hebûna kurdan li Xorasanê beriya koça dîrokî ya serdema Sefewiyan îsbat dikin, hindik in, lê hema bêje nayên înkarkirin. Lêbelê ji bo îsbatkirina vê îdiayê lêkolînên zêdetir hewce dikin.

Çîroka dîrokî ya duyemîn wekî vegotina serdest a dîroknasan tê zanîn, ku ji hêla gelek belge û gelek raporên din ve tê piştgirî kirin. Li gorî vê vegotinê, kurdên Xorasanê di serdema Sefewî û Efsariyê de ji herêmên rojavayê Îranê û rojhilatê Tirkîyê di çend qonaxan de koçberî sînorên Xorasanê bûne. Li vir hinek ji van belgeyan hene.

“Pêla sereke ya koçkirina kurdan ber bi Xorasanê ve di dema Şah Abbas Sefewî Yekem de dest pê kir. Ew ê ku di sala 996 hicrî/1588 mîladî de bû şah, di serî de li rojava û rojhilatê Îranê bi du dijminên mezin, Osmanî û Ozbek re rû bi rû ma. Salên desthilatdariya xwe ji ber ku nikarîbû di heman demê de bi du dijminan re şer bike, pêşî bi Osmaniyan re aşitî kir û piştî ku êrişên ozbek şikand, destdirêjiya Osmaniyan jî rawestand... Ev yek tê zanîn plana aramkirina sînoran û dirustkirina ewlehiyê ji ber pirsgirêka sereke ya vê komê, ango nebûna mêrg û çayiran, Îran û

⁴⁸ Bryon, Marcel, Manem Taimur Jahangasha, wergerandin û veguheztina Zabîh Elah Mensûrî, Weşanên Maravî, çapa 14, 1372, Tehran, rûp. 72.

⁴⁹ Belazarî, Ehmed, Ensab el-Eşref, hej. 4, rûp. 120.

⁵⁰ Rencber, Sakîne, Sedemên tevgera dîrokî ya kurdan ji rojava ber bi Xorasanê ve, Kovara Dengî Kermanj, sala yekem, hejmara yekem] Zanîngeha Ferdowsî ya Meşhedê, 2011, Meşhed, rûp. 80.

Osmaniyan di sala 1005ê hicrî angî 1596ê mîladî de wan derbasî deştên Tehran, Xawer û Veramînê kirin.»⁵¹

Di bin serokatiya Şah Qolî Sultan Çemeşgezê de ji bo şikandina êrîşa ozbekekan li ser herêmanên wek Bestam, Damqan, Sêmnan û Kaşan di sala 1006 hicrî/1597 mîladî de endamên eşîrên Çemeşgezê, Zeferanlu, Keywanlu / Kawanlu, Duvanlu / Şadlu û Sa'adanlu û 114 eşîrên din derbasî wan deran kirin...⁵² Lord Curzon jî digihêje wê encamê ku Şah Abbas bi vê kiryarê sînorên xwe yên rojhilat xurt kirin û ji vê eniyê ve êrîşên ozbekekan yên li ser herêmanên hundir pûç kirin û sînorên rojava jî aram kirin.⁵³

Her wiha li gorî hin belgeyan beriya koça mezin a Şah Abbas, di sedsala 16an, serdema Şah Îsmail û kurê wî Şah Tehmasib de bi hezaran malbatên kurd koçî Xorasanê kirine.

Her wusa, piştî niştecihbûna kurdan li Xorasanê û bicihkirina koçeran di sînorên wê de, bi demê re nûçeyên êrîşên ozbekekan li ser sînor û deverên sînorî yên Xorasanê belav bûn, ku bi berxwedana kurdan hatin paşve xistin. Gelek şer û pevçûn li seranserê sînorê bakûrê Xorasanê bi Tirkistanê re, ku cihê niştecihbûna eşîrên kurdên nûhatî bû, qewimîn. Piştî têkoşîneke demdirêj, ev yek bû sedema vekişîna dagirkeran û avakirina aştiyeke nisbî li ser sînoran. Di berdêla wan xizmetên kurdan de, Şah Abbas di sala 1018 hicrî/1609 mîladî de cara yekem Mîrektiya Xorasan û Axalê bi sernavê Emîr El-Amraî (Manşî, 1018) radestî Şah Elî Xan Mîrçemşaxazak Zafaranlû kir. Bi vî awayî hema hema hemû herêmanên bakûrê Xorasanê bi sedsalan ketibûn bin desthilatdariya mîrên kurdan.

Piştî Sefewiyan, di serdema Efqariyan de kurd ji rojavayê Îranê derbasî Xorasanê bûn. Ji van bûyeran ya herî girîng di serdema Nadir Şah Efqar de qewimî. Piştî têkçûna Ehmed Paşa Osmanî li herêma Kirmaşanê di sala 1147 hicrî/1734 mîladî de, wî hinek ji eşîrên Lor û kurdên Hemedan û Kirmaşanê ku di nav leşkerên wî de bûn, veguhestin Xorasanê.⁵⁴

⁵¹ Motevellî Heqîq, Yûsif. Nêrînek li ser sedem û rêbazên koçkirina kurdan bo Xorasanê. Kovara çarmehî ya pisporî ya fiqh û dîroka şaristaniyê, sal 6, hejmar 23, bihar 2019.

⁵² Mostofi, Mîrza Mihemed. Serjimêriya darayî û leşkerî ya Îranê di sala 1128 an de agahiyên serbazên Fîrûzî, 1353, Tehran, rûp. 396.

⁵³ Gurzon, George, N., Îran û doza Îranê, wergerandina Gulamreza Wehîd Mazenderanî, zanistî û çandî, 1373, Tehran, rûp. 151.

⁵⁴ Mîrniya, Seyîd Elî, Eşîr û eşîrên koçerên Xorasanê, Nesl Delaneş, 1369, Tehran.

Bi kurtî, çîroka serdest a dîrokî ya koçberiya kurdan pêşî di sed sala 16an, serdema Şah Îsmâîl Sefewî û kurê wî Şah Tehmasib de, piştî de dema Şah Abbas û herî dawî jî di dema Nadir Şah de derbas dibe. Ev bûyerên dîrokî di navbera salên 1559 û 1734an mîladî de, di çend qonaxan de pêk tê. Xuyaye sedema sereke ya vê koçberiyê ew e ku kurd pêşî li ber êrîşên biyanî yên li ser sînorên rojhilatê Îranê û Xorasanê bigirin.

Berferahiya erdnîgarî ya vê koçê ji herêmên Tehran û Veramîn û piştî hemû Xorasanê Bakur û bi gotineke din ji Çênarana Jorîn heta Çênarana Jêrîn (Tewhîdî neql kiriye), yanî hemû navçe û bajarên Xorasanê Bakur heta Meşhedê bû, ku îro nêzî sî bajar û du hezar gund dihevin.

Aborî û debara jiyane

Kurd ji mêj ve bi sewalkariyê re mijûl bûne ku ev yek di gelek raporên dîroknas û erdnîgaran de wek Îbn Hawqal, Mesûdî, Îstexarî, Lord George Curzon û gelekên din de hatiye teqez kirin. Îro ev pîşeya bav û kalan, hema hema li hemû bajarên kurdan belav bûye, gihîştîye ajaldariyên mezin û pêşketî.

Bi berfirehbûna jiyana niştecihbûyî re, kurdên ku li rex çemê Etrêkê û li seranserê Xorasanê Bakur heta beravên Deryaya Xezere dirêj dibe, koçber bûn û her wiha kurdên ku li herêmên bi kanî û çavkaniyên avê dijîyan, gelek gund ava kirin.

Bi kurtî, aborî û debara kurdên Xorasanê bi giştî li ser xwedîkirina heywanan, çandinî û baxçevaniyê, û her weha pîşesazî, bazirganî, karê di kargehan de û xebatên di warên îdarî û giştî de ye.

Ziman û Wêje

Zimanê kurdî yek ji zimanên Hind û Ewropî û şaxek ji zimanên rojavayî yên îranî ye. Ji aliyê hejmara axêver û belavbûna erdnîgarî ve girîngtirîn zaravayê kurdî, kurmancî ye. Kurmancî li Rojava û Bakurê Kurdistanê, hin beşên Başûr û Rojhilatê Kurdistanê, komarên Azerbaycan, Ermenistan, Gurcistan, Qazaxistan, Qirgizistan û Federasyona Rûsyayê, û li herêma Xorasanê li bakurê rojhilatê Îranê tê axaftin. Her wiha li Ewropa û Amerîkayê nifûseke mezin a kurdên li derveyî welêt hene ku kurmancî diaxivin.

Kurmancî li Xorasanê bûye zimanê zêdetirî 1.5 milyon kurdên ku li vê herêmê dijîn. Her wiha di dema serweriya Nadir Şah Efşar de hejmareke hindik ji kurdên soranîxêv, lor û lek anîne gundên herêma Kelat Nadêrî.

Li gorî maddeya 15an qanûna bingeîn a Îranê, divê hînkirina zimanê kurdî li gel zimanê farisî berbelav be, lê di pratîkê de mijareke wiha nehatiye cîbicîkirin. Lêbelê ji bo vejîn û parastina zimanê dayikê, ji sala 1995an ve, ji bo xwendekarên kurd ên zanîngeha Fêrdowsî ya Meşhedê di dersên derva û nefermî de ji aliyê mamostayên wek Hoşiyar Remezanî, Elî Ekber Çupanî, Cewad Rezayî û Hîwa Massih (Hossein Naseri) ve, zimanê kurdî yê kurmançî têne fêrkirin. Ev tevgera perwerdeyî di deh salên dawî de bi awayekî ne fermî li zanîngeh û navendên akademîk ên bajarên din ên Xorasan Bakur berdewam dike. Di nav pêşengên vê tevgerê de çend mamostayên wek Diyar Elîniya, Mihemed Texawî, Ehmed Caferî Tîtkanlo, Kekocan Ellahyarî û Çiyamêr Hatemî zêdetir tînin naskirin.

Edebiyata kurdî ya Xorasanê bi giranî ji wêjeya devkî; çîrok û efsane, helbest û meselok û hwd. pêk tînin.

Bi kêmanî heta sedsala 12an, li vir, berhemên me yê nivîskî yê girîng nînin. Îbn Xerîb Çermeqanî di sedsala 12an de helbestvanekî kurd yê mezin bû. Di dawiya serdema Sefewî û Efqariyê de jiyaye. Du pirtûkên wî yê sereke Elvan-al-Helah û Şewq-Nameh hene ku ji helbestên kurmançî pêk tînin.

Helbestvan û mîstîkê din ê mezin Ceferqolî Zengelî ye. Di berhevoka wî ya helbestan de ku di sedsala 13an a hicrî de jiyaye, helbestên bi zimanên kurdî, tirkî, farisî û erebî hene. Tesîra helbest û ramanên Ceferqolî di nav gelê kurdên Xorasanê de pir xuya ye.

Ji bilî wan helbestvanên mezin ên ku li jor hatine behskirin, alim û kesayetiyên din yê wek Aqanecef ê Qûçanî û Ellame Azîzollah Etarodî jî gelek bi nav û deng in, lê bi taybetî di xizmeta zimanên farisî û erebî de bûne.

Edebiyata kurdî li Xorasanê bi giranî li ser helbestên klasîk hatiye avakirin û pexşan pir kême. Di helbestê de du formên sereke û girîng "Şê-Xîştî" û "Lo" tenê di kurmançî de tînin. Piraniya helbestên gelêrî yê kurmançiya Xorasanê bi van her du celeb helbestan hatine nivîsandin.

Hewldanên elîta Kurdên Xorasanê ji bo vejandina ziman û wêjeyek di bin xetereyê de, di pêncî salên dawî de bû sedema geşbûnekê di helbest û wêjeyê de. Helbestvanên wekî Elîreza Sêpahî Layîn, Sadiq Ferhadî, Mehbûbe Se'adetmend, Îsmâîl Huseynpûr, Mihemed Qurbanî, Mihemed Husênûr, Şîrko Pehlewani û bi dehan helbestvanên navdar ên din bi kurdî

çendin pirtûk çap kirine. Her wiha festîvala helbesta kurdî ya bi navê “Mêlwarî” ev çend sal in geşek taybet daye lêkolin û pêşbaziya helbestvanên kurd ên Xorasanî.

Di sala 2002an de bi derketina yekemîn kovara bi navê «Kurmanc» bi rêveberiya Ebulqasem Rezapûr û sernivîskar Cevad Rezayî, li Xorasanê bi awayekî fermî rojnamegeriya kurdî dest pê kir. Kovarên «Hawar», «Kurmanc», «Denge-Kurmanc», «Hezar Meçît» û «Arman» di nav van kovaran de bûn ku bi zimanên farisî û kurmancî derketin.

Çand û rêûresm

Çanda kurdên Xorasanê bûye çanda serdest a hemû neteweyên Xorasanî. Gelê Xorasanê, li vir tê wateya komên din ên etnîkî yên ku li vê herêmê dijîn, ango faris, tirk, xawerî⁵⁵ û tirkmen. Hema bêje di hemû dawetên wan de jî muzîk û dîlana kurmancî serdest e. Kevneşopiyên kurmancî di nav gelên din ê Xorasanê de belav bûne.

Çanda kurdên Xorasanê bi giranî ji çend faktoran bandor dibe, ku hêmanên jiyana eşîrî û debara xwe (cotanî û şivantî), hêmana salnameyê û faktorên olî dihevine.

Ji bilî merasîma zewacê û kevneşopiyên pêwendîdar, hema bêje tu rîtuelên ku ji hêmana debarê bandor bûne ne sax mane.

Lê, Newroz û Yeldayê hê jî geş e. Cejna Newrozê ku di nav kurmancan de wek «Eyda Gir» tê naskirin, ji bo kurdan xwedî girîngiyeke mezin e û bi giranî di bin bandora adetên Newrozê yên eşîrên din ên Îranê de ye.

Cejna “Şeva Çêlle” (Yelda) yek ji ayîn û adetên din e ku bi taybetî di nav kurdên vê herêmê de timî tê pîrozkirin û bi taybetî di van salên dawîn de jî ji nû ve zindî bûye.

Cejnên ku di dîroka gelê Xorasanê de hebûne, wek Eyda Xidir/Xizr, Eyda Hevdeh, Mal, Bindarok, Axir Carşemmî (Çarşembe), Cejna Malbar Kirinê, Cejna Berx Berdanê, Cejna Beranan, û bi dehan curên din ku hatine ji bîr kirin.

Kevneşopiya zewacê û merasîma xwarina şîraniyê (Qend şikêrandin) û Dawet hîn jî li gorî adetên berê, lê di hin rewşan de bi şêwazên nû tene

⁵⁵ Xawerî an jî hezareh, bi zimanê darî (farsî) diaxivin û yek ji kevintirîn komên etnîkî yên Xorasanê ne. Ew li Îranê, bi taybetî li Meşhed, lê her weha li Pakistan û Afganistanê jî dijîn.

lidarxistin. Di van salên dawî de ciwanên kurd gelek eleqedar dibin ku merasîmên zewacê kevneşopî bi şêwazê berê vejînin û derbas bikin. Zewac bi giştî çend qonax û rîtuêlan dihevine: Nişan kirin, Êlçîtî an Dîwanxane, Qend Şikênandin an Şîrîn Xoran, Hena-wendî an jî Henabendan, Destgirtî/Dergistî, û hwd.

Rêûresmeke din a kurdî ya ku heta niha jî zindî ye, pehlewaniya kurdî ye. Ev cure Goleş/Guleşt (gulaş), Koşnî/Koştî ku bi cil û bergeke taybet a Çoxayê tê kirin, ji mêj ve li kêleka piraniya merasim û şahiyên kurdî tê lidarxistin, lê di deh salên dawî de, bûye werzişeke fermî. Ev yek her sal di newrozan de, li gundên kurdên Sultan Zirabah û gundê Rehward û Êsfrayin li zengila navdar a Zeynel Xanê bi amadebûna bi deh hezaran kes tê lidarxistin. Festîvala Gulaşa kurdî ya Çoxê li gel muzîk û dîlana kurdî heyecaneke taybet dide merasîmê. Gulaşgerên navdar tê de hevrikiyê dikin û di dawiyê de jî xelat kesên serkeftî tînin xelat kirin. Di van salên dawî de pêkanîna van şahiyên ji aliyê Wezareta Werzişê ve tê birêvebirin.

Hêjayî gotinê ye ku ev festîval di demên berê de ji aliyê mîrên kurdên Xorasanê ve, piştî jî ji aliyê komên gelê kurd ve hatiye organîzekirin.

Ji bilî merasim û rêûresmên ku hatin behskirin, di bin bandora gotara dînî ya serdest de, di salvegera jidayîkbûn û wefata îmamên şîe de, merasim û ayînên dînî tînin lidarxistin, ku di van deh salên dawî de di nav kêmeteweyên kurdan de populer bûne. Ji wan ya herî girîng pîrozkirina Cejna Eydaxorban⁵⁶ û Eyda Fitr û şîna Aşûrayê ye.

Muzîk, lîstik, û ciluberg

Muzîka kurmancî ya li Xorasanê ji muzîka farisî û heta ji kurdî ya li herêmen din ên cîhanê bi tevahî cuda ye. Amûrên sereke yê ku têne lêxistin ev in: Dayereh, sorna/zirneh/zirne, dohl⁵⁷, dotara kurmancî, kemaçe an fîq, quşme û bilîr (qamîş).

Muzîka kurdî ya Xorasanê di nav muzîka fermî de ye û muzîkjenên kurmancî karîne gelek bûyerên tal û şîrîn ên jiyana rojane û hin bûyerên dîrokî bi muzîk û helbestan vebêjin. Gelek awaz û stranên kurdî li Xorasanê hatine binavkirin. Navên evîndar, mêrxas û şervanan, wek stranên Lê Yarê,

⁵⁶ Eyda/Îda Qurbanê – *amadekar*.

⁵⁷ Dahol – *amadekar*.

Allah Mezar, Behmen û Golnar, Cefer Qolî û Mêlwarî, Serdar Êwez Xan, Serdar Cecoxan, Zarêh, Şasiyar, Behram, Laleh û Lancan, Xancan, Xecê Lore û bi dehan berhemên din.

Dans wekî diyardeya azwerî û heyecana jiyanê xwedan balkêşiyên taybet e. Dîlana kurdî an jî Halperke di mejiyê xelkê asayî de ji dîlana kurdî ya kurdên Xorasanê ku jê re «Listek» an jî «Govend» tê gotin pir cuda ye.

Reqsên kurdî yê Xorasanê gav bi gav rîtmîk dibin û leza livînên govendê zêde dibe. Dans bi giranî bi dengê enstrûmanên zirne, dohl û qoşmeyê têne hevrêz kirin. Ji xeynî reqsên rîtmîk ên jorîn, reqseke din jî, ku berê ayîneke nimêjê bû, bi navê dansa Sumakî hîn jî populer e. Her wiha di nav dîlanên kurmancî de bi navê «Hengê xanan» an jî «Elegez» cureyek danseke ku bi hevrêziya dest û lingan tê kirin û tevgera lezûbeza şervanên kevna nîşan dide.

Muzîk û dîlana kurmancî di van salên dawî de navûdengê cîhanê bi dest xistiye û di festîvalên navxwe û yê derve de xwedî cihekî taybet e.

Di nav muzîkjenên kurdên Xorasanê de, ji berê heta niha, em dikarin navên wekî Cefer Qolî Zengêlî, Muhemmed Cewzanî, Qolamhosên Zîraweh, Elî Ekber Bexşî, Berat Pehlevan Niqabî, Rehîm Xan Baxşî Honameyî, Elî Qolam Rezayî, Roşan Golefroz, Sultan Reza Welînejad, Golnewat Etayî, Bexşî Sohrab Mihemedî, Elî Ekber Beharî, Xan Mihemed Bexşî Qîtaqî, Mihemed Elî Husênpûr, Roya Esmâîliyan, Mohsen Mîrzazade, Mozefer Hemîdî û bi dehan dengbêj û muzîkjenên din bi bîr bin.

Cil û bergên jin û mêrên kurmancên Xorasanê jî ji cil û bergên kurdên din ên cîhanê cuda ye. Cil û bergên jin û keçên kurmancên Xorasanê bi gelemperî ji 5 beşan “yaşar” an jî çarqad, “kras” (blûz), “şilwar” (şîlwar), “êlek” û “şelîte” pêk tê. Yaşar an jî çarqad ku îro jê re şal tê gotin, şalekî hevrişimî yê taybet e ku wek seriyekî tê bikaranîn û ji xeynî çavan, serî û heta rûyê jinê digir e. Rengê cil û bergên jinan li gorî temen ji rengê ronak diguhere û dibe tarî. Piraniya rengan, ku di rengê êlek û kincê (kêl) de diyar dibin, sê reng in: sor, zer û kesk. Her ku temen zêde dibe, rêzek tarîtir ji van sê rengan di keviyên cil û berg û xemilandinê de tê bikar anîn.

Cil û bergên mêran jî sê perçe ne: şelem (serbend), kras (kiras) û derpeh (pêl). Berê, kras an kiras bi gelemperî rengê spî bû û şal li dora bejnê dihat girêdan. Kras li aliyê rastê an jî di nivê sîngê de ku bi gelemperî

bi bişkokek darîn ve dihat girtin. Kras yan davêtin ser pantoran (şelwar) yan jî bi şalekî dihatin girêdan.

Îro cil û bergên kurmançî bi piranî di merasîmên kevneşopî û şahiyên rêûresmê de li xwe dikin û bi gelemperî nayên bikaranîn.

Encam

Kurdên Xorasanê ku bi nifûsa xwe ji milyonek û nivê zêdetir in û bi çand, ziman, urf û adet, rêûresm, muzîk û dîlanên xwe yên taybet berbiçav in, mixabin gelek caran di kurdolojiyê de hatine paşguhkirin. Kurdên li Xorasanê niha li zêdetirî sîh bajar û du hezar gundên Xorasanê Bakurî û deverên Xorasanê Rezewî dijîn. Kurdên Xorasanê ji ber erdnîgariya lê dijîn dikarin wekî kurdên herî rojhilatê cîhanê werin hesabandin. Zimanê wan kurmançî ye û li gorî du vegotinên dîrokî ji destpêka serdema îslamê ve li Xorasanê dijîn û di serdema Sefewî û Efqariyê de hejmareke mezin ji wan koçberî Xorasanê bûne. Bi sedsalan wan sînorên rojhilatê Îranê li dijî dagirkerên ozbek parastin. Aboriya wan li ser sewalkariya kevneşopî û pîşesazî, çandinî, û xebata li kargeh û dezgehên hikûmetê û her weha li ser bazirganiyê ye.

Muzîk, dîlan û cil û bergên kurmançên li Xorasanê dijîn ji kurdên din ê cîhanê cudatir e.

Edebiyata klasîk a kurdên Xorasanê bi navên wekî Îbn-Xerîb Ceremganî û Cefer Qolî Zengelî ve girêdayî ye û edebiyata wan a hemdemî ji aliyê helbest û qafiyeyê ve dewlemendtir e.

ÇEND KÊŞEYÊN LI PÊŞIYA NETEWA KURD LI KURDISTANÊ Û DERVEYÎ WELÊT Û RÊYÊN ÇARESERİYÊ



Hewkar Îzzet Mika

Serokê Federasyona Rojnameger û Nivîskarên Serbixwe (Ronus)

Tevahiya miletan avahiyek civakî, çandî û ferhengî ye û gelên ku di nava neteweyekê de kom bûne xwedî xalên hevpar ên mezin û girîng in. Her kes ji bo parastina van xalên hevpar li hember nîrxên pîroz ên neteweya xwe xwedî berpirsiyariya ne.

Hemû neteweyên li ser rûyê erdê di dîroka mirovahiyê de xwediyê nasnameya xwe ne, û her netewe bi çend taybetmendîyan tê naskirin. Gelê kurd weke neteweyekî xwedî dîrokeke dirêj li cîhanê, di dirêjahiya dîroka xwe de, tevî hemû astengî, karesat, qirkirin û hewlên tunekirinê, kariye li ser piyan bisekine.

Li ser xaka xwe paşve vekîşiyane û di hinek prensîbên xwe yê netewî de yan ew nîrx wînda kirine yan jî gelekî lawaz mane. Çend prensîb hene ku hebûn û hêza neteweyan diyar dikin: ziman, ax, çand, nivîs, rabirdûya dîrokî û şaristaniya kevnar.

Ya herî girîng û yekem prensîb ziman û çanda hevpar e. Ji bo neteweyek yekgirtî, ziman û çanda hevpar du stûn in ku dikarin bibin bingeha avakirina neteweyekê. Em naxwazin bi berfirehî behsa hemû

prensîbên neteweyê bikin û bi neteweya kurd re bidin ber hev û kurdan weke netewe binirxînin, lê bi kurtî em ê kurdan weke hevparê neteweyê binirxînin.

Ziman: Di dirêjahiya dîroka neteweya kurd li deverê de, me nikarîbû bibin xwediyê zimanekî standard û yekgirtî ku hemû bikarin û têbigihin û bikin zimanê fermî yê nivîsandin, axaftin û têgihiştinê. Kurd jî wek hemû neteweyên cîhanê xwediyê hejmareke mezin ji zarava û jêzaravayên din in, lê pirsgirêk û metirsiyeke mezin li ser sîberoja neteweya kurd ew e ku kurd nekariye zimanê xwe bike standard. Kurdên ku bi zaravayên cuda yên kurdî diaxivin, pir caran îngilîzî, erebî û zimanên din ên biyanî bikar tînin da ku ji hev fêr bikin. Ev jî yek ji mezintirîn û metirsîdartirîn gefên li ser gelê kurd e.

Kurdan heta niha nekariye zimanekî yekgirtî di programa xwendinê de li seranserê Kurdistanê damezrîne, ji bo ku dilê xwediyên zaravayan têr bike, bi şêweyekî bêhemdî û nezaniyê çend zarava tevlihev kirine û ji seretayî heta zanîngehê xistine nav bernameya xwendinê.

Di nav kurdên ku zaravayên cuda bi kar tînin de bêhêvîbûnek mezin çêbûye. Ziman di medyaya kurdî de yek ji mezintirîn pirsgirêk û kêşeyên li pêşîya netewebûnê ye, ji ber ku rewşa medyayê ji bo bikaranîn û bicihkirina ziman gelek lawaz û xirab e. Niha beşek ji civakê heman zimanê ku van medyayê kirine bingeha xebata xwe bi kar tînin.

Hin peyv û herfên kurdî di bin metirsiya windabûnê de ne û niha hin ji wan di axaftina rojane de pir kêr in û dê di demek nêzîk de ji holê rabin.

Çand û ferheng: Çand û ferhengên hevpar yek ji stûnên herî girîng ên her neteweyekê ye û ji bo vejandina çanda wan a hevpar têkoşîn pêwîst e.

Di dîroka xwe de çend çandên me kurdan hebûn, ku mixabin hê nehatine parvekirin, her erdnîgarî û herêmek çand, adet û kevneşopiyên xwe hene ku di dawiyê de bûne sedema parçebûna me. Yek ji metirsiyên herî mezin li ser miletê kurd ji bo paşerojeke nêzîk, tevî perçebûn û nebûna yekîtiyê, têkdana çanda me ye.

Çanda kurdî di nav çanda miletên cîran û serdest de, ku beşek ji plana dijminên gelê kurd û hinekî jî bi nezaniyê û xemsarîtiya me ava bûye, dihele û winda dibe. Niha gelek tiştên ji çanda kurdî di nav çanda gelên derdorê de heliyaye û em nikarin eslê xwe bibînin. Ew qas tevlihev bûye ku mirov nikare bigihîje çanda resen.

Bandora neteweyên li dora me li ser me gihîştiye wê astê ku em niha bi serbilindî li gorî çandên neteweyên din dijîn û tevdigerin. Ji gelek aliyên ve bikaranîna çanda kurdî bûye cihê şerm e.

Bêtehamulî û dijberiya hev: Gelê kurd bi xwezaya xwe civakeke pirreng, eşîrî, erdnîgarî û çînayetî ye. Vê cudahiye di dirêjahiya dîrokê de gelek hilketin û daketin dîtine û têkiliyên gelê kurd li herêmên cuda di gelek germ û sermayê re derbas bûne.

Gelek caran êl, eşîr, malbat, mîrnişîn û piştîre jî partî û komên gelê kurd nekarîne hevdû qebûl bikin û li dora çarçoveyek ku xizmeta armancên netewebûnê dike kom bibin.

Ji bo pêkhatin û mayîndebûna neteweyekê divê çend prensîbên hevpar hebin. Ji ber wê jî hevpejirandin û jiyana hevbeş yek ji prensîbên sereke yên pêkhatina neteweyan e. Lê di gelek qonaxên jiyana de partî û grûbek din bûne xizmetkar û bindestê dijminan, û di dawiyê de ev hemû dê bibe xisareke mezin ji bo qutkirina rîya ku me ber bi netewebûnê ve dibe.

Netewavakirin proses û hewldaneke mezin a her netewe û komekê ye û ji bo bidestxistina xewna netewî bi tenê gotin û nivîsandin têrî nake. Ji bo vê rewşê, em di wê baweriyê de ne ku ji bo pêngavên avakirina neteweyê ku em dikin armanc û beşdarên vê salonê hemû hev fikir in ku di warê bidestxistina neteweyî de pirsgrêkên me yên mezin hene. Divê em çend gavan bavêjin û bi eşkereyî îşaret bi birînan bikin û nîqaş bikin.

Çareseriyên:

-Partiyên her çar aliyên Kurdistanê û derveyî welêt li dora xewna bidestxistina neteweyekê nekarî kom bibin û dibe ku hinek ji wan dibin sedema parçebûna nav mala kurd li cîhanê.

- Rêxistinên civaka sivîl ên herêmê nikarin vî karî hilgirin ser milê xwe û arasteyî civaka kurd bikin ku ber bi avakirina netewebûnê ve bibin.

- Medya, beşek bi qestî û hinekî jî ji ber nebûna dîtin û nêrîna cîhanê, nekariye piştgiriya tevgera ku li vir û wir hewl daye neteweyekê ava bike.

- Hemû kongre, civîn, platform û tifaqên ku di bin navê lihevkerin û pêngavên netewbûna gelê kurd de hatine avakirin, beşek ji ber bêtehamuliya hev û hinekî jî ji ber nebûna dîtinê, di destpêkê de ji armancên xwe dûr ketine.

Niha çi divê bê kirin:

Ji bo çareserkirina rewşa heyî stratejiyeke demdirêj pêwist e.

- Bi baldarî xweza û hejmara pirsgirêk û kêşeyan binirxînin û metirsî û derfetên li pêşiya me nas bikin.

- Komkirina hîn jêderên mirovî û zanistî yên ku li hundir û derveyê Kurdistanê hene û dixwazin di vî warî de xizmetê bikin, birêxistinkirina wan di çarçoveya tîmeke zanistî ya pratîkî de û danîna peywendiyên bi zanîngehên hundir û derveyê Kurdistanê re ji bo bidestxistina zimanekî standard hewce ye.

- Naskirina kurdan wek netewe bi neteweyên derdorê û dîtina nasnameya xwe ya netewî bi rêya vejandina çanda kurdî û parastina Yekîtiya ku ji bo netewebûnê pêwist e, ne tenê bi gotinê, belkî bi çêkirina peywendiyên pratîkî di navbera beşên Kurdistanê mezin û kurdên derveyê welat de. Weke kurdên Qefqasya û welatên din, bi armanca ku hevdû nas bikin û bi hev re kar bikin.

- Xebata ji bo gihandina navendan û avakirina komîteyeke taybet ji pîsporên ziman û zimannasiyê ji bo ku zimanekî yekgirtî û standard di bernameyên xwe de cih bigire û birêxistin bike, yan jî çapkirina pirtûkên taybet ên zimannasiyê û karkirina li ser perwerdekirina nîfşekî nû ji civaka kurdî. Hewildaneke mezin, lê bidestxistina encamên stratejîk bêguman sebrê dixwaze û dê encam jî mezin bin.

- Xebat ji bo damezrandina medyayeke neteweyî ya mezin ku li ser milê neteweyî û dûr ji destwerdana partî û koman di nav cîhana siyasî ya kurdî ya îroyîn de, bi xema neteweyî û danasîna çanda kurdî li herêmên cuda di çarçoveya peymanê rûmetê de.

- Damezrandina toreke berfireh di navbera medyayên Kurdistanê û derve de, ji bo ku nûçe û zanyariyên derbarê kurdên derve de bîn pêşkêşkirin, ji bo naskirina gelê kurd bi parçeyên din ên Kurdistanê, wek mînak, kurdên Qefqasyayê; Ermenistan, Azerbaycan, Gurcistan, Qazaxistan, Rûsyayê û hwd.

- Li Kurdistanê jî lidarxistina konferansên bi vî rengî û vexwendina kurdên derve bo Kurdistanê ji bo xebatên hevbeş û hevdû nasîn, wek nimûne, em dikarin biryarê bidin ku konferansa sala bê li Hewlêrê yan li Silêmaniyê yan jî li Mehabadê were lidarxistin.

KURDÊN QEFQASYAYÊ BAŞÛR WEK BEŞEK NETEWEYA KURD. NASNAME Û DANASÎN



Hejarê Şamil
Nivîskar, lêkolîner

Em kurdên Qefqasyayê li kuderê bijîn û welatîyên kîjan welatî bibin jî, em pêkhateyek ji neteweya mezin a kurd in, beşek ji çanda kurdî ya kevnar û bîrewerîya kurdî ne. Me ev rûmet qet winda nekiriye. Kurdbûn, kurdistanî bûn, rûmeta me ya herî mezin e.

Pênaseyên «Kurdên Qefqasyayê»

Di destpêka axaftina xwe de dixwazim li ser pênaseyên «Kurdên Qefqasyayê» bisekînim. Rewşa wan a siyasî, sosyolojîk û çandî îro çawa ye? Têkiliya wan bi gelên ku pê re dijîn di çi astê de ye? Welatê wan ê dîrokî Kurdistan ji bo wan tê çi wateyê? Kurdên Qefqasyayê ji aliyê kurdistanîyan ve çawa tên pênasekirin? Bi kurtasî, kurdên Qefqasyayê kî ne? Ev pênase bi rastî jî hewceye zelalkirinê ye.

Ji xeynî kurdên Tirkmenistanê hemû kurdên ku li welatên Yekîtiya Sovyeta berê dijîn, wek kurdên Qefqasyayê tên hesibandin. Kurdên Tirkmenistanê bêtir bi kurdên Xorasanê ve girêdayî ne û em dizanin ku kurdên Xorasanê jî beriya sedsala 16an bi Qefqasyayê ve têkildar bûne.

Kengî em pênasêya «Kurdên Qefqasyayê» bikar tînin, em qesta hemû kurdên Yekîtiya Sovyeta berê dikin. Ango kurdên Qazaxistan, Qirgizistan, Ozbekistan, Rûsya, Ukrayna, Belarûs, Moldova, Azerbaycan, Ermenistan û Gurcistanê kurdên Qefqasyayê ne. Kurdên ku îro li Asyaya Navîn dijîn, di 90 salên dawî de ji Qefqasyayê hatine sirgûnkirin an jî ji ber sedemên jiyanî koçberî van welatan bûne. Ew bi eslê xwe ji Qefqasyayê Başûr in û ji ber vê yekê divê wek kurdên Qefqasyayê werin nas kirin.

Îro, kurdên Qefqasyayê bêhtir wek "Kurdên Sovyetê" an "Kurdên Sovyeta berê" tên binavkirin. Ev navekî xelet e û ev yek dike rastiya Kurdistanê Qefqasyayê ku beşek ji welatê Kurdistanê ye vedişêre. Her wiha dîroka 3000 salî ya gelê kurd ku li Qefqasyayê tarî dike.

Yekîtiya Sovyetê 33 sal berê hilweşiya. Di dema Yekîtiya Sovyetê de pênasêyek wiha dibe bihata qebûl kirin. Îro pênasêya "Kurdên Sovyetê" rastiya xwe winda kiriye. Li Yekîtiya Sovyetê ya berê 193 gel dijiyan. Îro li ber navên van gelan yekî jî peyva "Sovyetê" nayê bikaranîn. Piştî hilweşîna Yekîtiya Sovyetê, gotinên «Ermeniyên Sovyetê», «Gurciyên Sovyetê» an jî «Rûsên Sovyetê» qet nayên bikaranîn. Lêbelê, hîn jî peyva «Kurdên Sovyetê» tê bikar anîn, an jî em kurd peyva «Sovyetê» li pêşiya navên xwe datînin. Di rastiyê de ne dewletek bi navê «Yekîtiya Sovyetê», û ne jî civatek bi navê «Kurdên Sovyetê» heye. Ev ecêbî û kambaxî jî ji perçebûn û bêdewletbûna gelê kurd tê. Bi bawerîya me ji bo danasîna gelê kurd ku li komarên Yekîtiya Sovyeta berê dijîn, divê li şûna «Kurdên Sovyetê» peyva «Kurdên Qefqasyayê» were bikaranîn.

Kurdên Qefqasyayê kurdên diasporayê ne?

Di pêvajoya netewesaziyê de, pênasêkirina rast a nasnameyên civakî, sosyolojîk û dînî dibe alîkar ku rêya rast were dîtin. Nasnameyên ku bi rêkûpêk nehatine pênasêkirin, bandorên neyînî li ser pêvajoya avakirina neteweyan dikin.

Ji kurdên Qefqasyayê re gelek caran «Kurdên Diasporayê» tê gotin. Ma em dikarin wekî kurdên diasporayê werin pênasêkirin? Naxêr, kurdên Qefqasyayê beşek ji diasporaya kurdan nîne.

Gelê kurd zêdetirî 3 hezar salan e ku li Başûrê Qefqasyayê, bi taybetî li ser erdê Komarên Azerbaycan û Ermenistanê yên îroyîn dijîn. Em wek kurdên Qefqasyayê nehatine van axan, em li vir niştecih in! Di sala 1813an

de, 221 sal berê, bi Peymana Gulistanê ya ku di navbera Împeratoriya Rûsyayê û Îrana Qacar de hat îmzekirin, beşa Kurdistanê ya li Qefqasyayê ji destê kolonyalîstekî derbasî destê yekî din bû. Bi vî awayî serpêhatiya kurdên Qefqasyayê, pêşî wekî kurdên Rûsyayê û dû re jî wekî kurdên Sovyetê dest pê kiriye.

Her çendî kurd bi giranî di destpêka sedsala 20an de li Gurcistanê dest bi bicihbûnê bibin jî, ew bi tevahî di nav civaka Gurcistanê de entegre bûne. Ew xwe wekî kesên li diyasporayê ne pênase nakin. Gurcistanê wekî welatê xwe yê lê dijîn û Kurdistanê jî wekî welatê xwe yê dîrokî dibînin.

Dibe ku hin mirov rexnê li min bikin ku ji ber min pirtûka xwe ya li ser kurdên Qefqasyayê, ku di sala 2006an de hatiye weşandin, wekî «Kurdên Diyasporayê» bi nav kiriye. Mixabin, ez jî wê demê di bin bandora termînolojiya berbelav de bûm.

Bandorên parçebûna herêmî li ser pênase û hilweşîna nasnameyê

Kurdên Qefqasyayê tevî sirgûn û parçebûna berdeham, heta niha bi awayekî serketî nasnameya xwe ya netewî parastine. Lêbelê, parçebûn, bi demê re di hişmendiya neteweyî de deformasyonan diafirîne û dibe sedema çêbûna nasnameyên herêmî yên nû. Ji ber ku kurdên li welatên Yekîtiya Sovyetê ya berê dijîn ne xwediyê navendeke siyasî û erdnîgarî ya taybet in, di vî warî de pirsgrîkên cidî çêdibe û asîmîlasyonê leztir pêş dixê.

Dema ku em dîmen û panoramaya parçebûna erdnîgarî ya kurdan li welatên Yekîtiya Sovyeta berê eşkere bikin, mesele dê zelaltir bibe. Werin em li belavbûna erdnîgarî ya kurdan binêrin:

Komara Qazaxistanê. Li vir 100 hezar kurd li nêzikî 90 jîngehan (eyalet, navçe, bajar, bajarok, gund û mezra) dijîn.

Komara Qirgizistanê. Li vir ji 20 hezarî zêdetir kurd li 41 jîngehan (navçe, bajar, bajarok, gund û mezra) dijîn.

Komara Ermenistanê. Hejmara kurdan li vir nêzikî 30 hezarî ye. 22 gund hene ku bi tenê ji kurdan pêk tên. Kurd bi giştî li 64 jîngehan dijîn.

Gurcistan. Hejmara kurdan li vir nêzikî 20 hezarî ye. Heta sirgûnkirina di sala 1944an de kurd li 49 jîngehan dijiyan. Niha, kurd bi piranî li Tîblîsî ne û her wiha li 13 jîngehên cuda cuda de dijîn.

Ukrayna. Niha ne pêkan e ku hejmara kurdan were diyarkirin. Heta şerê Rûsya-Ukraynayê ku di Sibata 2022an de hate dest pê kirin, kurd li 36 wargehan de dijiyan. Bi destpêkirina şer re, piraniya wan koçî welatên din, bi taybetî jî welatên Ewropayê kirin.

Komara Ozbekistanê. Heta pevçûnên ku di sala 1989an de qewimî (bûyerên Ferqaneyê), bi hezaran kurd li vir dijiyan. Piştî van bûyeran, ew koçî Qazaxistan û Rûsyayê kirin. Niha li vir nêzikî 100 malên kurdan heye û di herêma Taşkentê, derdora bajarê Almalikê li 5 jîngehan dijîn.

Turkmenistan. Li gorî daneyên fermî, di sala 2010an de 6900 kurd, gori daneyên ne fermî di sala 2020an de 9500 kurd li vir dijiyan. Di rastiye de, li vî welatî nêzikî 100 000 kurd hene, ku piraniya wan asîmîle bûne. Ew niha kêma zêde li 20 jîngehan (gund, navçe, bajar) dijîn.

Komara Tacîkistanê. Tê îdîakirin ku kurd li çend gundên ku bi tevahî asîmîle bûne dijîn. Li paytext Duşenbeyê çend malên kurdan hene.

Komara Azerbaycanê. Kurd li vî welatî bi tevahî asîmîle bûne, hejmara wan nayê zanîn. Tê îdîakirin ku nîv milyon kurd li wir hene. Kurdan li ser xaka Komara Azerbaycana îroyîn 416 gund ava kirine. (Ev hejmar ji statîstîkên fermî yê piştî 1813an û lêkolînên herêmî hatiye wergirtin). Îhtimal heye ku li vî welatî gundên ku ji aliyê kurdan ve hatine çêkirin zêdetir bin.

Federasyona Rûsyayê. Li gorî serjimêriya sala 2010an, 64 000 kurd li Rûsyayê dijîn. Di rastiye de, hejmara kurdên ku di nav sînorên federasyonê de bi cih bûne ji 200 000î zêdetir e. Kurd li Federasyona Rûsyayê di 743 jîngehan de dijîn. Ev hejmareke teqez nîne, lêkolîn li ser vê mijarê berdewam dike.

Komara Belarûsê. Li vir bi piranî li paytext Minsk û çend jîngehan nêzikî 500 kurd dijîn.

Komara Moldovayê. Li vî welatî bi taybetî jî li paytext Kişnev ji 100î zêdetir kurd dijîn.

Komarên Baltîk. Li her sê komarên Baltîkê li nêzikî 10 jîngehan ji 100î zêdetir kurd dijîn.

Bi tevahî, kurd li welatên Sovyeta berê li **1450** jîngehan dijîn.

Amarên (îstatîstîkên) jorîn bi zelalî nîşan didin, ku kurdên Qefqasyayê di çî erdnîgariyeke fireh de dijîn û pirsgerêkên hevrêziyê (koordînasyonê)

çiqas giran in. Nasnameya neteweyî û etnîkî di erdnîgariyeke konkret û di bin şert û mercên jiyaneke kompakt û lihevhatî de çêdibe û diyar dibe. Dûrbûna ji erdnîgariyê û perçebûn dibe sedema dûrketina ji nasnameya neteweyî û pêkhatina nasnameyên nû.

Di vî warî de, kurdên Qefqasyayê bi xetera windakirina nasnameyê û asîmîlasyona diwar re rûbirû ne. Bi taybetî di 30 salên dawî de, asîmîlasyon bi awayekî berbiçav zêde dibe û rojbiroj pêş dikeve. Têkoşîna li dijî asîmîlasyonê û di dawiyê de windakirina nasnameyê bi nirxandineke rast û realîst a rewşê dest pê dike. Em îro hewl didin vê yekê bikin.

Di dawiyê de, ez dixwazim ji bo vê konferansê diyariyekê bikim. Ew çend meh bûn ku me ji bo vê konferansê malperek bi navê **Ansîklopediya Kurdên Qefqasyayê** (www.ensiklopediyakurdi.com) amade dikir. Malpera me îro dest bi xebata xwe kir. Wekî ku ji navê malperê jî diyar dibe, malperek bi naveroka xwe ansîklopedîk e. Ew wekî malperek mîna Wikipedia hate çêkirin. Di malperê de wê agahiyên ji berê heta îro, hemû aliyên jiyane yên li ser kurdên Qefqasyayê wê cih bigirin.

Vê konferansê kir ku baweriya min bi pêşeroja gelê me hîn zêdetir bibe. Me bi hev re gaveke girîng avêt. Welatek tê ava kirin; gav bi gav, tax bi tax, gund bi gund, civîn bi civîn...

Em miletekî mezin in; dîroka me kevnar e, ruhê me pak e, dilê me fireh e, xizmet û beşdariya me ji bo dîroka cîhanê û mirovahiyê mezin e. Divê xwestek, gav û kiryarên me bi qasî dîroka me, bi qasî giyan û dilê me mezin bin. Em wek mirovên dîlnizm û rastîxwaz tenê mafên xwe, refaha cîranên xwe û aştiya cîhanê dixwazin. Ez gelek kêfxweş im ku di nav we de me û endamekî gelê xwe me...

SALAR SERHED XELÎFE YUNIS

Endamê Serkirdayetî û Berpirsê Peywendiyên Kurdistanî yê YNK`ê



Birêzên hêja, endamên Yekemîn Konferansa Kurdên Qefqasyayê, organîzatorên ev boneya dîrokî, ev demê we baş!

Tevî ew hemû astengiyên ku îro rastî doza kurd hatine çî li Kurdistanê û çî li derveyî welat, cihê kêfxweşî û şanaziyê ye, ku îro em hemû pêkve beşdariyê di vê pêngava dîrokî ya komkirina kurdên Qefqasyayê û rewşenbîrên pêşeng ên kurd dikin. Hêvîdar im ku hemû gotûbêj ji perspektîfên cuda de xizmeta pîrsa kurd bê kirin û her gotar bibe çavkaniya xebat û têkoşînê ji bo çareserîya pîrsgirêkan.

Rûdanên sed salên derbasbûyî ew yek piştrast kiriye ku, hemû metirsî û zehmetiyên ku gelê kurd ê bindest pê re rû bi rû maye, tenê bi yekîtiyê û hevîrtina gelê kurd li çaraliyê cîhanê dikarin werin derbaskirin.

Bêguman hilgirtina karekî wisa mezin û hêja ser milê xwe, erkekî dîrokî ye ji bo organîzatorên vê konferansê. Em hêvîdar in ku ev konferansê berdewam be û hewl bînin dayîn ku di salên pêş de zêdetir û rijdtir (bibiryartir) gotûbêj li ser hemû metirsîyên bînin kirin, ku rûbirûyê kurdên Qefqasyayê dibin, da ku çareserîya wan bînin dîtînê.

Birêzên hêja, tevî ev helkefta dîrokî ya ku em hemû gihandine hev, îro li bajarê Tîblîsê, divê em behsa yek ji ew trajediyên mezin bikin ku îro rastî

gelê kurd hatiye. Di vê rojê de wek em hemû agahdar in ku çawa dijmînên gelê me, di her firsendekê de êrişî destkeftên me kirine û ji bo jinavbirin, koçberkirin û tunekirina dîroka netewa me xebitîne.

Mixabin, bi salan e ku dijmînên gelê kurd hewl didin ku demografiya gelê kurd berovajî bikin, ji wê zêdetir jî dest davêjin nîrxên pîroz ên gelê me.

Di ev roja pir birûmet de, ji bo yekbûn û yekrêziya mala kurdan, divê rola Serok Mam Celal bilind were nîrxandin. Wekî yek ji rêberên rizgariya gelê kurd, wî roleke girîng û karîzmatîk di pêşxistina têkilî û dîplomasiyê de ji bo doza gelê kurd û li bakur, rojhilat, başûr, rojava û Kurdistanê Sor lîst. Hîna jî pêwîstiya me bi rol û siyaseta zanayane ya Serok Mam Celal heye, ji bo hevgirtina navmala kurdî li hemû parçeyên Kurdistanê û gîhandina dengê wan bi hemû cîhanê.

Niha Yekîtiya Nîştîmanî ya Kurdistanê (YNK) bi serokatiya heval Bafil Celal Talabanî erka giran a neteweyî û nîştîmanî daye ser mile xwe, ji bo pirsên netewî û demokrasîyê, ji bo piştevaniyê û hevkarîya xwîşk û birayên xwe yên li çar aliyên Kurdistanê.

49 sal in di hemû rewşên hestiyar de, Yekîtiya Nîştîmanî ya Kurdistanê ji bo pêşvebirina doza kurd û gihîştina bi ew xewna ku YNKê li ser hatiye damezrandinê xebat kiriye, bi diruşma mafê çarenivîsê û hebûna welatekî azad û serbixwe, bi sedan kîlometran li hember grupên terorîstî rawestiyaye. Ev jî bi xwîna wan fermanî û pêşmergeyên qehreman ku canê xwe feda kirin ji bo welat pêk hatiye.

Ez dixwazim vê bînim bîra we ku 10 sal berê di rojek weha de, destê çepel û qirêj ê terorîstan gihîşte yek ji sînorên Kurdistanê û kurdên bawermendên êzîdî rastî trajedîya herî mezin hatin, ku heta niha hemû civaka mirovahiyê li hemberî wê şermazar in. Ew karesata dilşewat, ku bi tu peyvan mirov nikare bîne ziman û tu pênuşek nikare wêneyê wê karesatê bikişîne û xêz bike.

Silav li gîyanê pakê hemû qurbaniyên bêguneh ên ku di vê karesata dilşikestî de şehîd bûne û li ber xwedayê xwe digerin ku hemû qurbaniyên bi destê terorîstên dilreş şehîd bûne di beheştê xwe de şad bike û sebrê bide kesûkarên şehîdan, û koçber jî bi zûtirîn dem vegezin warên xwe û jiyana xwe ya asayî bidomînin û bi derbasbûna demê re birîna wan jî derman bibe.

Pêwist e em hemû vê yekê bizanin ku kurd tenê bi yekbûn û hevgirtinê dikarin li dijî karesatên bi vî rengî bisekinin.

Li vir bi min xweş e ku, ez ji bo derfetdana vê konferansê spasiya hikûmeta Gurcistanê bikim. Ev belgeya wê yekê ye ku gelê Gurcistanê bi awayekî têgihiştî li pirsê kurd dinêre û em hemû vê pêngava hikûmeta Gurcistanê bilind dinirxînin.

Bihêzbûna kurdan û yekrêziya kurdan li diyasporaya dê bibe yek ji wan xalên bihêz ku dê piştevan û piştgirê ezmûna Herêma Kurdistanê be, ku bi hezaran kes xwe kirine qurbanî.

Dubare ez spasiya hemû ew kes û aliyên ku rola xwe hebûye di organîzekirina vê konferansê de dikim, ku bi encamdana vê erka niştîmanî rabûne û dûrî ji hemû îdeolojiyên siyasî xizmeta doza kurdî dikin. Bi germî we silav dikim û em ê hemû hewla xwe bidin da ku alîkariya we bikin...

Her serkeftî bin!

MAHAMA KHALIL QASIM

Parlamentê berê ya Iraqê



Em ji bo derfeta organîzekirina vê konferansê spasiya hikûmeta Gurcistanê dikin, ji konferansa Kurdên Qefqasyayê pir dilxweş in.

Çend roj berê 10 saliya karesata Şengalê bû. Mijara me li ser Şengala birîndar û jenosîdkirî ye. Dema ku em qirkirina Şengalê tînin ber çavan, divê em bizanin ku em hemû yek netewe ne; eger welatê kurdan xurt be, civaka êzidî jî wê xurt bibin û em ê ji qirkirinê xilas bibin.

Ev komkujiya 74an e ku civaka êzidî, ola me, zimanê me, axa me, jiyana me û endamên malbatên me hedef digire.

Şengal di sala 1922an de bûye navçe. Ji wê demê ve êrîşên dijminan li ser Şengalê, li ser axa pîroz, erdnîgarî, dewlemendî û cihê stratejîk yê gelê qehreman pêk tên.

DAIŞ'ê beriya 10 salan Şengal dagir kir, 14 rojan zarok, dayik û xwişk revandin, gundê Koço dorpêç kirin, bi hezaran kes qetil kirin, bi sedan malbatên êzidî ji holê rakirin. Bi tevahî 6417 êzidî li Şengalê hatine revandin. Di deh salên dawî de 3579 kes ji destê terorîstan hatine rizgarkirin, lê bi hezaran sivîl hîn jî di destê wan de ne. Çarenûsa 2592 kesan hîn jî nayê zanîn.

Piştî komkujiya 3ê Tebaxa 2014an, 92 gorên komî li Şengalê ji bo kuştîyan hate çêkirin. Ev jî delîlek eşkere ya qirkirinê ye. Ji sala 2021an vir ve, hin rêxistinên navneteweyî û çend dewlet bi fermî piştrast kirin ku li dijî êzidiyan jenosîd hatiye kirin.

Mixabin, îro jî civaka êzidî di bin gefeke xeternak de ye. Bi hezaran Şengalî hîn jî di kamp û çadîran de dijîn û ji ber vê gefê nikarin vegerin malên xwe. Li hemberî êzidiyan jenosîd berdewam dike û Şengal hîn jî wêran e.

Niha, xelkê Şengalê li Başûrê Kurdistanê di 16 kampan de û li derveyî wan dijîn. 25 000 malbat di kampan de jiyana xwe didomînin, 37 762 malbat li derveyî kampan bicih bûne. Em bi berdewamî bi Hikûmeta Herêma Kurdistanê re di têkiliyê de ne. Em di vê mijarê de spasiya xwe ya kûr ji rêveberiya hikûmetê re diyar dikin.

DEKLERASYONA KONFERANSÊ

Di 15-16ê Tebaxa 2024an de, li paytexta Gurcistanê, li bajarê Tiblîsê, bi pêşengiya komele û zanyarên kurd, Konferansa Navneteweyî ya “Kurdên Qefqasyayê û Perspêktîfên Neteweyî” hat lidarxistin.

Konferansa navneteweyî ya “Kurdên Qefqasyayê û Perspêktîfên Neteweyî” teqez dike ku ji bo parastin û pêşxistina nasnameya Kurdî pêwîstî bi baştirkirina hevahengî û hevqirtina komeleyên kurdan heye. Konferans li ser bingeha mijarên herî girîng ên ku hatine nîqaşkirin, tezên xwe yên sereke di daxuyanike hevbeş de rave dike.

- Nasnameya netewî ya kurdên li derveyî Kurdistanê ji ber gelek sedemên subjektîf û objektîf di bin xetera windabûnê de ye. Em bang li hemû rêxistinên kurdistanî yên li cîhanê dikin ku ji bo rizgarkirin û pêşxistina nasnameya kurdî li welatên xwe bernamêyên taybet saz bikin.
- Em bang li rêxistinên kurdî dikin ku bibin alîkar ji bo avakirina komîsyoneke zanistî ku dê bernamêyeke yekgirtî amade bike ji bo hînkirina Zimanê Kurdî ji bo kurdên li derveyî welêt; herweha bibin alîkar ji bo damezrandina komeke navneteweyî ya zanyaran, ku erkê wan dê bibe amadekirina pirtûkeke yekgirtî ya dersa zimanê kurdî û di paşerojê de jî alfabeyeke yekgirtî.
- Hemû beşdarên ku ev deklarasyon îmze kirine, erka parastina mafên Kurdan, bêyî cudatiya dînî, civakî û medenî digirin ser xwe. Em pabendbûna xwe bi mafên mirovan û bi taybetî mafên jinan di civakê de û di nav malbatê de radigihînin û bang li rêxistinên kurdistanî yên cîhanê dikin ku mafên jinan ji tundiyê biparêzin.
- Em bang li kurdên Başûrê Qefqasya, Ewropa, Asyaya Navîn û hemû cîhanê dikin ku Yekîtiya Neteweya Kurdî li ser bingehe zimanê kurdî pêş bixin, ku xîmê parastina nasnameya kurdî ya bi hezar salan e. Dapîr û bapîrên me wek jêdera netewe û reha çanda kurdî, ne tenê rabirdûya me ne, ew bingeha dahatûya me ne jî. Loma em bang li her kurdekî li Qefqasya, Asyaya Navîn û Ewropayê dikin, ji bo parastina nasnameya xwe, paşnavên dîrokî vegehnin, eger ku ew di

dema koçberî, zordestî an rewşên din ên neçariyê de winda bûne, an bi zorê hatine guhertin.

- Parastina ziman û çand her wiha dijberiya asîmîlasyonê; bingeheke sereke ye ji bo parastin û pêşxistina nasnameya neteweya kurd li derveyî Kurdistanê.

Deklerasyon bingehek e ji bo dariştina proje û damezrandina rêxistinên civakî, ku armancên wan dê pêkanîna tez û pêşniyarên li jor be.

Deklerasyon ji aliyê beşdarên Konferansa Navneteweyî ya Tîblîsê ya "Kurdên Qefqasyayê: Perspektîfên Neteweyî" ve hat qebûl kirin.

16 Tebax 2024

Tîblîsî, Georgia

КУРДЫ — ДРЕВНИЕ НАСЕЛЬНИКИ ЮЖНОГО ЗАКАВКАЗЬЯ



Ляtif Маммад Бруки

историк, редактор интернет-портала kurdist.ru

К истории вопроса

Отсутствие собственной государственности, разделение Курдистана на шесть частей между Турцией, Ираном, Ираком, Сирией, Азербайджаном и Арменией также способствовали антинаучному и откровенно враждебно-недружественному подходу к истории многомиллионного народа. Как пишет известный востоковед М. С. Лазарев, «последовательно шовинистический курс правящих кругов ближневосточных государств в национальном вопросе препятствует развитию там курдоведения» [1]. Все эти государства любыми путями стремятся стереть из этнической памяти курдов их прошлое, а там, где это невозможно, сильно искажают их историю.

Несмотря на весомый успех советской исторической науки, зачастую она также страдала этой же «болезнью». Курды бывшего СССР не считались «титულიной» нацией, и поэтому история курдского народа не была освещена достаточно широко, а зачастую просто известные факты, события и этническая принадлежность выдающихся личностей курдской истории замалчивались или же приписывались соседним народам. Касаясь общей тенденции по освещению истории курдского вопроса, М. С. Лазарев писал: «Что касается литературы, то она большей частью тенденциозна и полна искажений. Отчасти это

объясняется низким уровнем знаний о курдах и курдской проблеме, характерным для изучаемой эпохи и в значительной мере сохранившимся и в наши дни, отчасти – политическими мотивами самого разнообразного свойства, от националистических страстей и предрассудков до прямого социального заказа различных классов и групп» [2]. По признанию азербайджанского ученого Валеха Рзаева: «Ираноязычные топонимы Армении принадлежат обитавшим здесь ираноязычным курдским племенам, часть которых с наступлением советизации уничтожили и заставили переселиться на территорию современной Азербайджанской Республики, а другую вытеснили в Турцию. За десятилетия советизации Закавказья история курдов была подвергнута столь фундаментальной пропагандистской обработке, что из памяти этого народа постарались стереть самые важные этапы трагедии, нашедшие косвенное отражение даже у великого русского поэта и любознательного путешественника А.С. Пушкина» [3].

Не лучше стоять обстоятельства и в современном курдоведении в России, где «Курдские исследования в России представлены точно, дозировано, часто спонтанно и часто эпизодически...» [4].

И сегодня мы все пожинаем плоды такого «подлинно исторического подхода».

А ведь не случайно известный советский ученый, лингвист и востоковед, академик Николай Яковлевич Марр (1864/65–1934) назвал курдов *«пасынки истории»*, и это несмотря на то, что «курды сохраняют элементы древней культуры Переднего Востока потому, что они являются потомками автохтонного населения...» [5].

Чтобы правильно понять и оценить сегодняшнее положение курдов и определить место курдского народа в современном мире, необходимо объективное освещение истории этого народа и выявление общей тенденции его исторического развития. Как это ни парадоксально, практическая ее сторона заключается в том, что она может служить установлению межнационального согласия как в Закавказье, так и на Ближнем Востоке.

К сожалению мы – сами курды – о своей истории знаем ничтожно мало. Если о фольклоре, нравах и обычаях, религиозных верованиях курдов уже имеется определенная система знаний, то этого нельзя

сказать об истории, в особенности о древней истории нашего народа. Зачастую в имеющейся литературе о курдах имеются косвенные сообщения, и история курдов в прямой постановке не рассматривалось, а упоминалась лишь в контексте изучения истории сопредельных народов при освещении истории Передней Азии. И, несмотря на это, о нас, курдах, пытаются вообще не говорить. Примечательно и то, что за весь советский период в бывшем СССР не был написан ни один академический исторический труд по древней истории курдского народа, дабы не поднимать вопросы по азербайджанской, армянской, грузинской и туркменской истории.

Несмотря на очевидные факты, многое из курдской действительности все еще не признается за нашим народом. Курды подобны какой-нибудь колониальной стране, народ который отчужден и не имеет никаких прав не только на полезные ископаемые недр своей Родины, но и на свою историю, культуру. Некоторые т. н. «курдологи» как раз и заняты тем, чтобы и в дальнейшем служить этой цели: ложными посулами, искаженной интерпретацией фактического материала направить исследовательскую работу в неверном направлении, ввести в заблуждение курдскую историческую науку. Но времена уже изменяются. За последнюю пару десятка лет начата серьезная аналитическая работа над курдской историей, что и вызывает шквал критики и истерии.

На фоне пересмотра и ревизионизма современной истории на основе подлинного подхода к истории постепенно научный мир начал воспринимать тот факт и историческую действительность, что курды были важным военно-политическим фактором в Истории Ближнего Востока, Передней Азии и Южного Закавказья.

Таким образом, одной из малоизученных страниц курдской истории является ранняя история Кавказского (Красного) Курдистана, и в связи с этим впервые поднимается вопрос об автохтонности курдов и на прилегающих к ней территориях, а в целом, и на территории Южного Закавказья.

В связи с вышесказанным возникает вопрос: а в какой степени, с точки зрения историчности, будет научной проецирование современной этногеографической реалии с прошлым региона?

А ведь факты говорят о другом...

Нахичевань. Армения. Еще в 595 г. до н. э. Мидия, разгромившая Ассирийскую державу в 612 г. до н. э., распространила свое влияние на территории Южного Закавказья, в том числе Нахичевани и Армении. Мидийское влияние сменялось Ахеменидским и Сасанидским.

Известный американский историк Ричард Фрай для обозначения доисламского периода Ирана предлагает понятие «Большой Иран» только в его историко-культурном значении. Большой Иран включает все территории, на которых в историческое время говорили на иранских языках и культуру которого можно считать иранской. Территориально к нему он относит и Закавказье [6]. Это означает, что Р. Фрай в древних насельниках Закавказья видит исключительно «иранцев». Процесс сложения курдского этноса растянулся на тысячелетия, и по этой причине курды в истории были известны под разными этническими названиями.

Одной из таких групп, известных в истории под названием «мары/марды», были древние жители Нахичевани и близлежащих территорий, включая территории современной Армении.

Российский исследователь первой половины XIX в. И. Шопен пишет, что «жители Армянской области, искони в ней обитающие, разделяются на два корня: армян и курдийцев» [7]. Но при этом он пальму первенства в вопросе автохтонности передает, естественно, курдам: «Курды (древние курдуки) составляют первобытное племя, найденное Гайком во вновь занятых им странах при Аракских; они, вероятно, **одноплеменные древним парфянам**, с которыми даже сами римляне не в состоянии управиться!» Далее он пишет, что «...нельзя не признать курдов старейшими автохтонами страны; это те самые курдуки (кардухи – Л. М.), о которых повествует Ксенофонт в Анабазисе («Поход 10 тысяч греков»), и нет сомнения, что они принадлежат к общему санскритскому корню» [8]. И, наконец, касаясь этой темы, он пишет: *«Из коренных, туземных наречий древнейшее, первобытное должно быть курдинское, употребляемое племенами, населявшими страну, порученную от царей Ассирийских управлению отца Гайка-Торгому в*

